



**K.T.
ZANÎNGEHA BÎNGOLÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
ZIMAN Û WÊJEYA KURDÎ**

Teza Lîsansa Bilind

**DI HIN DÎWANÊN KURDÎ DE
BANDORA TESEWÛFÊ**

Hüseyin KOYUNCU

121302117

Şewirmend

Doç. Dr. Nusrettin BOLELLÎ

Bîngol, 2014



**T.C.
BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE EDEBİYATI ANABİLİM DALI**

Yüksek Lisans Tezi

**BAZI KÜRTÇE DİVANLARDA
TASAVVUFUN ETKİLERİ**

Hüseyin KOYUNCU

**Danışman
Doç. Dr. Nusrettin BOLELLİ**

Bingöl, 2014

JI BO RÊVEBIRIYA ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ

Ev xebat ji aliyê jûriya me ve di Ziman û Wêjeya Kurdî de weki teza lîsansa bilind hatiye pejirandin.

(îmza)

Serok :

(Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav)

(imza)

Endam :

(Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav)

(îmza)

Endam :

(Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav)

(îmza)

Endam :

(Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav)

(îmza)

Endam :

(Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav)

Pesendkirin

Ez pesend dikim ku înzayên jorîn ên endamên hîdekariyê yên navborî ne.

Îmza

.....

Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav

Birêvebirê Enstîtûyê

(Mor)

NAVEROK

	Rûpel
Naverok	IV
Kurte	VI
Özet	VIII
Abstract	X
Pêşgotin	XII
Kurtebêje	XIV
Destpêk	15
Tesewûf.....	17
Wateya Tesewûfê.....	17
Bi Kurtasî Li Ser Dîroka Tesewûfê.....	20
Biwêjên Tesewûfê	23
1. Biwêjên Mecazî.....	23
2. Biwêjên Dînî.....	25

1. BEŞA YEKEMÎN

1. WÊJEYA KLASÎK YA KURDÎ

1. Wêjeya Klasîk ya Kurdî	26
1.1. Li Ser Wêjeya Klasîk ya Kurdî	26
1.2. Nûnerên Wêjeya Klasîk a Kurdî.....	29
1.3. Hin Helbestvanên Wêjeya Klasîk a Kurdî	34
1.3.a. Melayê Cizîrî	34
1.3.b. Mela Huseynê Bateyî.....	35
1.3.c. Feqiyê Teyran	36
1.3.ç. Ehmedê Xanî	37
1.3.d. Pertew Begê Hekarî	38
1.3.e. Mela Xelîlê Sêrtî	39
1.3.f. Mela Mihemedê Liceyî	40

1.3.g. Şêx Muhammed Hadiyê Qewmanî	41
1.3.h. Seyîd Elîyê Findikî.....	42
1.3.i. Mela Nezîrê Bedewî.....	42

2. BEŞA DUYEMÎN

2. DI HELBESTAN DE SEMBOLÊN TESEWÛFÊ

2. Di Helbestan de Sembolên Tesewûfê.....	43
2.1. Biwêjên Tesewûfê yên di Dîwanên Kurdî de	43
2.1.a. Bekabîllah/ Beka.....	43
2.1.b. Bezma Elest.....	45
2.1.c. Bihuşt.....	47
2.1.ç. Cefa / Cewr / Derd.....	49
2.1.d. Eşq / Aşiq / Me'sûq.....	53
2.1.e. Fenafillah/ Fena.....	63
2.1.f. Insanê Kamîl.....	68
2.1.g. Mecnûn.....	72
2.1.h. Mey / Meyxane / Saqî.....	76
2.1.i. Munacat / Di'a.....	82
2.1.î. Murîd / Murşîd.....	88
2.1.j. Terîqet / Şêx.....	93
2.1.k. Xaliq / Xwedê / Mehbûb.....	98
2.1.l. Wehdet / Wehdetîl Wicûd.....	101
Encam	110
Çavkanî	112

KURTE

DI HIN DÎWANÊN KURDÎ DE BANDORA TESEWÛFÊ

Helbestvan, di demê xwe de, di nav gel de her çi mijar û rewş pêşve ye ew jî di tesîra wan de dimînin. Jiyan û bawerîyê gel, helbestan jî dirûv didin. Helbestên helbestvanan jî bi jiyan û bawerîyê gel pêk tên.

Wêjeya klasîk ya kurdî di pêşveçûnê dîrokî de di bin bandora felsefa tesewûfê de maye. Mijarên tesewûfê û biwêjên tesewûfê di helbestan de xuya dikin.

Ev xebatê me ya bi navê *Di Hin Dîwanên Kurdî De Bandora Tesewûfê*, bi destpêk û du beşan pêk hatiye. Di destpêkê de em li ser wateya tesewûfê û bi kurtî jî li ser dîroka tesewûfê û li ser biwêjên tesewûfê sekinîne. Biwêjên tesewûfê li vir me du binbeşa vekolandinê. Ew biwêjan jî, binbeşa yekemîn de bi nava biwêjên mecazî, binbeşa duyemîn de jî bi nava biwêjên dînî, bi çend nimûneyan, me bi kurtî eşkere kirine.

Di beşa yekemîn de jî em li ser wêjeya klasîk a kurdî û nûnerên wêjeya klasîk a kurdî rawestiyane. Li vir binbeşa sisêyan jî bi hin helbestvanên wêjeya klasîk a kurdî pêk tê. Di vê binbeşê de me bi kurtî hin agahî li ser jiyan û helbestvanîyê van helbestvanên wêjeya klasîk a kurdî daye. Helbestvanên ku em di vê binbeşê de li ser sekinînin û dîwanên wan vekolandinê ew in:

Melayê Cizîrî

Mela Huseynê Bateyî

Feqiyê Teyran

Ehmedê Xanî

Pertew Begê Hekarî,

Mela Xelîlê Sêrtî,

Mela Mihemedê Liceyî,

Şêx Muhammed Hadiyê Qewmanî

Seyîd Elîyê Findikî

Mela Nezîrê Bedewî

Di beşa duyemîn de jî me hin biwêjên tesewûfê û hin helbestên helbestvanên klasîk a kurdî hîlbijartine. Me di ew nimûneyan de, bi biwêj û sembolên tesewûfê, bandora tesewûfê derxistîye holê. Di vê beşê de sembol û biwêjên tesewûfê ku me vekolandî ew in:

Beka û bekaîllah
Bezma Elest
Bihuşt
Cefa, cewr û derd
Eşq, aşiq û me'şûq
Fena û fenaîllah
Insanê kamil
Mecnûn
Mey, meyxane û saqî
Munacat û dia
Murîd û murşîd
Terîqet û şêx
Xaliq, Xwedê û Mehbûb
Wehdet û wehdetîl wicûd

Li seranserê dîwanên kurdî de temaya ku derketî pêş eşqa îlahî ye. Hin helbestvanan rasterast ew tema di helbestên xwe de bi cih kirine. Wekî Mem û Zîn a Ehmedê Xanî hin helbestvanan jî bi eşqa mecazî, ew eşqa Xwedê diyar kirine. Hema hema di hemû helbestan de ew tema bi peyvên mecazî û sembolên tesewûfê wekî "mey, meyxane, saqî, cefa, cewr, derd hwd." pêk hatiye.

Helbestvanên klasîk a kurdî bi piranî li ser biwêjên dînî wehdetîl wicûd, insanê kamil, fena, beka, murşîd, şêx û terîqetan rawestiyane. Ew sembolê tesewûfê, bandora tesewûfê li ser dîwanên kurdî eşkere dikin.

ÖZET

BAZI KÜRTÇE DİVANLARDA TASAVVUFUN ETKİLERİ

Şairler kendi dönemlerinde halk arasında hangi konu veya inanç daha yaygın ise onlar da tesirinde kalmaktadırlar. Halkın inanç ve yaşamı şiirlere de şekil vermektedir. O dönemin şiirleri de halkın inanç ve yaşamından oluşmaktadır.

Tarihi gelişimi içinde klasik Kürt edebiyatı tasavvuf felsefesinin etkisinde kalmıştır. Tasavvufun konuları ile tasavvuf terimleri şiirlerde görülmektedir.

Bazı Kürtçe Divanlarda Tasavvufun Etkileri (Di Hin Dîwanên Kurdî De Bandora Tesewûfê) adlı çalışmamız giriş ve iki bölümden oluşmaktadır. Giriş kısmında tasavvufun manası, kısaca tasavvufun tarihi ve tasavvuf terimleri üzerinde durduk. Burada tasavvuf terimlerini ise iki alt bölümde inceledik. Tasavvuf terimlerini mecazi terimler ve dini terimler adıyla iki alt bölümde birkaç örnekle kısaca açıkladık.

Birinci bölümde klasik Kürt edebiyatı ve klasik Kürt edebiyatı temsilcileri üzerinde durduk. Burada üçüncü alt bölüm bazı klasik Kürt edebiyatı şairlerinden oluşmaktadır. Bu bölümde ele aldığımız şairlerin hayatları ve edebi şahsiyetleri hakkında kısaca bilgiler verdik. Bu bölümde ele aldığımız ve divanlarını incelediğimiz şairler şunlardır:

Melayê Cizîrî
Mela Huseynê Bateyî
Feqiyê Teyran
Ehmedê Xanî
Pertew Begê Hekarî,
Mela Xelîlê Sêrtî,
Mela Mihemedê Liceyî,
Şêx Muhammed Hadiyê Qewmanî
Seyîd Elîyê Findikî
Mela Nezîrê Bedewî

İkinci bölümde de bazı tasavvuf terimlerini ve klasik kürt şairlerinin şiirlerinden bazılarını seçtik. Bu örneklerde tasavvuf terim ve sembolleriyle tasavvufun etkilerini ortaya çıkarmaya çalıştık. Bu bölümde tasavvufun şu sembol ve terimlerini inceledik:

Aşk, aşık ve maşûk

Beka ve bekaillah

Cefa, cevr ve derd

Cennet

Elest Bezmi

Fena ve fenafillah

Halık, Allah ve Mahbub

İnsan-ı Kamil

Mecnûn

Mey, meyhane ve saki

Munacaat ve dua

Murid ve murşid

Tarikat ve şeyh

Vahdet ve Vahdet-ul Vucûd

Kürtçe divanlarda öne çıkan ilahi aşktır. Bazı şairler bu temayı doğrudan şiirlerinde işlemişlerdir. Ahmedî Xanî'nin Mem û Zîn eserinde olduğu gibi bazı şairler mecazi aşkla, ilahi aşkı ortaya koymuşlardır. Hemen hemen tüm şairlerde ilahi aşk teması "mey, meyxane, saqî, cefa, cevr, derd vb." mecazi kelimeler ve tasavvuf sembollerinden oluşmuştur.

Klasik Kürt şairleri çoğunlukla vahdet-ul vucûd, insan-ı kamil, fena, beka, murşid, şeyh ve tarikat gibi dini terimler üzerinde durmuşlardır. Bu tasavvuf sembolleri tasavvufun Kürtçe divanlar üzerindeki etkilerini ortaya koymaktadır.

ABSTRACT

THE INFLUENCE OF ISLAMIC MYSTICISM ON SOME KURDISH DIVANS

The poets are also affected by the common issue and belief among the people in the time they live. The beliefs and life of people shape the poetry. Therefore, the poems of that time consist of beliefs and life of the people.

The classical Kurdish literature has been affected by Islamic mysticism philosophy during its own historical development. The subjects and terms of Islamic mysticism are seen in the poems.

The present study, namely, *The Influence of Islamic Mysticism on Some Kurdish Divans (Di Hin Dîwanên Kurdî De Bandora Tesewûfê)*, consists of introduction and two chapters. In the consists of introduction, we put emphasis on the meaning, the history and the terms of Islamic mysticism. The terms of the mysticism are analyzed under two subcategories. We shortly explain these terms by giving a few examples under the subheadings; metaphoric terms and religious terms.

In the first chapter, we put emphasis on classical Kurdish literature and the representatives of this literature. The third subheading of this chapter consists of some poets of classical Kurdish literature. We give brief information about the life and literal personality of these poets. We deal with and examine the divans of following poets in this chapter:

Melayê Cizîrî
Mela Huseynê Bateyî
Feqiyê Teyran
Ehmedê Xanî
Pertew Begê Hekarî,
Mela Xelîlê Sêrtî,
Mela Mihemedê Liceyî,
Şêx Muhammed Hadiyê Qewmanî
Seyîd Elîyê Findikî
Mela Nezîrê Bedewî

In the second chapter, we analyze some terms of mysticism and choose some poems of classical Kurdish poets. We attempt to reveal the effects of Islamic mysticism with the terms and symbols of mysticism in these examples. We examine the following terms and symbols of Islamic mysticism in this chapter:

Beka, bekabîllah (Perpetuity, perseverance)

Bezma elest(Acceptance and approval of oneness of Allah)

Bihuşt (Heaven)

Cefa, cewr, derd (Suffering, torture, trouble)

Eşq, aşiq, me'şûq (Divine love, lover, beloved)

Fena, fenafillah (Rank of ignoring anything but the One True Allah)

Insanê kamîl (The person who has reached perfection)

Mecnûn (Madly in love, lunatic)

Mey, meyxane, saqî (Wine, pub, cupbearer)

Munacat, dia (Fervent prayer addressed to Allah)

Murîd, murşîd (Follower, guide)

Terîqet, şêx (Order of dervishes, sheik)

Xaliq, Xwedê, Mehbûb (Creator, Allah, Beloved)

Wehdet, wehdetîl wicûd (Uniqueness, pantheism)

The divine love completely comes into prominence in Kurdish divans. Some poets handle this theme directly in their poems. They put forward divine love and metaphoric love. The work Mem û Zîn of Ahmedî Xanî is an example in this field. Almost all poets' divine love theme consists of metaphoric words and the symbols of mysticism such as "mey(wine), meyxane(pub), saqî(cupbearer), cefa(suffering), cewr(torture), derd(trouble), etc."

Classical Kurdish poets put mostly emphasis on religious words such as "wehdetîl wicûd(pantheism), insanê kamîl(the person who has reached perfection), 'fena(disregarding oneself earthly/bodily), beka(continuation, perpetuity), murşîd(guide, pathfinder, mentor), şêx(sheik, Muslim leader) and terîqet(order of dervishes)." These symbols of mysticism show the effect of Islamic mysticism on Kurdish divans.

PÊŞGOTIN

Wêjeya klasîk ya kurdî, wêjeyeka dewlemend e. Gelek helbestvanan cih girtine û gelek berhem li pey xwe hîştine. Di nav van berheman de diwanên kurdî bala meriv dikişînin. Hema hema hemû helbestvanên wêjeya klasîk ya kurdî berhemên xwe yên bi nava 'dîwan' hene. Ji wan hin helbestvanan jî dîwana xwe bi nav kirine. Wekî Tahirê Hemedanî ku dîwana xwe bi 'Dubeytî' nav e.

Di wêjeya klasîk ya kurdî de berhemên diwan pêk anîn bûye kevneşopîyeke girîng e. Gor vê kevneşopîya dîwan nivîsandinê, helbestvan di helbestan de şekl, tema û têgihan nêzikî hev in û li eynî rê ne. Di navbera dîwanên helbestvanên kurd de têkiliyeke tevlihev heye.

Dîwanên wêjeya klasîk ya kurdî ku em behs dikin giştî wan negihîştine roja me ye. Hin ji wan di şer û talanan de hatine îmhakirin. Hin ji wan di nav gel de ne, lê tu kesî ew çap nekirine. Hin ji wan dema ewil de bi xebatên lêkolînera tesbît bûne û çap bûne. Ji ew dîwanên kurdî yên ku çap bûyî me hin di vê xebatê de hîlbijartin. Di van dîwanan de yên ku bandora tesewûfê li ser tunebûyî jî hebûn. Wekî, dîwana Seberî Botanî. Seberî Botanî di dîwana xwe de li ser ewînê û rewşa kurdan sekinîye. Lê em li ser dîwanên ku di bin bandora tesewûfê de rawestiyane.

Di xebatê de ewil em li ser wateya tesewûfê sekinîne. Dû re jî me hin agahî li ser wêjeya klasîk ya kurdî û helbestvanan amade kiriye û bi hin biwêjên tesewûfê, bandora tesewûfê lêkolîn kiriye û derxistîye holê.

Xebata me ji destpêk û du beşan pêk hatiye. Destpêk li ser sê binbeşan hatiye avakirin. Binbeşa ewil, li ser wateya tesewûfê ye. Dû re em li ser dîroka tesewûfê rawestiyane. Li vir em bersiva, pirsîyarê "Tesewûf çî ye, kengê derketiye?" geriyane. Paşe jî ew beşa, dawî de bi kurtasî biwêjên tesewûfê pêk hatiye.

Beşa yekemîn jî, agahiyên li ser wêjeya klasîk ya kurdî û dû re jî behsa nûnerên wêjeya klasîk a kurdî pêk hatiye. Li vir em bi kurtasî li ser hin helbestvanên klasîk ya kurdî sekinîne. Ew helbestvanên ku me li vir hîlbijartî, ew kesên ku di bin bandora tesewûfê de mane.

Beşa duyemîn jî bi armanca me ya esil pêk te. Ew jî biwêjên tesewûfê û nimûneyên helbestan in. Me li vir, di hin helbestan de bi biwêjên tesewûfê bandora tesewûfê vekolandiye.

Ji ber ku xebatên, bi zimanê kurdî, li ser tesewûfê û li ser wêjeya klasîk ya kurdî kêr bûn, amadekirina vê xebatê de jî, ji me re hin tengayî çebûn. Di vê rewşa tengayî de alîkariya gelek kesan nebûya, ew xebat temam nedibû.

Berê, ji bo peydakirina çavkanîyan û alîkariya mezin mamoste û şewirmendê min ê heja Doç. Dr. Nusrettin BOLELLÎ re sipasiyan dikim.

Dû re di nav ewqas karûbarên giran de amadekirin û nivîsandina tezê min de alîkariya ku bi min re kirî û agahiyên akademîk yê li ser tezê kurdî bi min re kirî Alk. Doç Dr. Cihat YAŞAROĞLU re minetkariyê xwe pêşkêş dikim. Di nav ewqas karên xwe de, amadekirina xebata min de alîkariyê ku bi min re kirinî re, mamosteyê hêja Ömer DELİKAYA û kekê Abdurrahim PESEN re jî sipasiyan dikim.

Herweha bi agahdariyên xwe yê qîmetdar rêya me ronahî kirî, seydayê mezin, nivîskar û lêkolîner Zeynelabidin ZINAR re jî gelek sipas dikim.

KURTEBÊJE

amd.	: amadekar
b.n.	: berhema navborî
b.z.	: berî zayînê
bnr.	: binêr
c.	: cild
ç.	: çap
h.b.	: heman berhem
hwd.	: her wekî din
j.	: jimare
bnr.jêr	: li jêr binêrin
bnr.jor	: li jor binêrin
m.	: mirin
r.	: rûpel
s.x.l.	: silavê Xwedê li ser
t.ç.	: teza çapnebûyî
vgz.	: veguhêzêr
wer.	: wergêr
weş.	: weşanên

DESTPÊK

Civakên ku ji dînê tewhîdê dûr dikevin, fikrên îlahtiyê jî, bi awayekî din di nav wan de belav dibe. Hinekan ji bo îlahê xwe put û perestîngê çêkirine û ji wan putan re îbadet kirine. Hinekan jî Fîrewn û Nemrûd wek îlahên xwe hesabandine.

Misilmanî ew dîn e ku ji tewhîdê pêk hatiye. Gor misilmaniyê Xweda yek e, wehîd e. Hezretî Mihemed jî pêxemberê misilmanan e. Yekitîya Xwedê û eşqa Hezretî Pêxember binyada tesewûfê ne.

Xwedê, Hezretî Mihemed (s.x.l.) re, bi Qur'ana Hekîm misilmanî û selametî şandiyê. Bi vê şandinê Xwedê dibêje ku “Min dîn û xweşiyên xwe li ser we tamam kirine û ji we re dînê Îslam rewa dîtiye.”¹

Xwedayê Teala ayet û fermanên xwe bi rêya Cibraîl ji Hezretî Mihemed re dişandin. Hezretî Pêxember û misilmanan, van fermanan bi eşq û bi kêf hîn dibûn û di jîyana xwe de ew tetbîq dikirin.

Xwedê hemû qaîdeyên Misilmantîye di Qur'ana Hekîm de eşkere kiriye. Ew qaîde jî tev de dîsa wekî eşqa Xwedê û Resûl, binyada tesewûfê ne. Li gorî Qur'anê, erd û asîman û hemû tiştên di nabeyna wan da, yên Xwedê ne. Xwedê ew hemû, ji tunebûnê afirandine. Xwedê zatekî pak e, tenê ye. Hemû xweşî û kar û bar di destên Wî de ne. Hemû hêz û kirin yên Wî ne. Hemû kar, yanî qedera her tiştî bi fermana wî çêdibe. Hemû tiştên li erd û asîman, bi dil, yan jî bê dil, ji Wî re sitûxwar bûne. Her tişt ji Wî re tesbîh dike. Ew di maneya mutleq de yek îlahekî bi tenê ye.

Misilmaniyê di sedsala heftan de bi Koçberiya(Hîcreta) Pêxember ve, dest bi belavbûnê kir. Piştî Pêxember, xelîfeyên Wî jî, dînê Îslamê gelek baş temsîl kirine. Di zemanên wan de jî misilmanî heta Anatolyayê jî hatiye. Li Asya û Efrîkayê belav bûye.

Di dema Hezretî Pêxember de û di dema xelîfan de tesewûf tune bû. Ehlê Suffa hinekî ji tesewûfê re bûye bîngêh.

Di Hîcrî sedsala düyem de Ebû Haşim El-Kûfî, mitesewifê ewil e. Li Kûfe, Horasan û Bexdadê dema ewil, mitesewifên bi navûdeng hene. Şêx Xelîl Kurdî jî, di nav kurdan de mitesewifê ewil e.

¹Maîde, 3.

Tesewûf wekî rêbezeke felsefeyê paşê derket holê. Bi mitesewifên mezin yên wekî Hallacê Mensûr, Bayezidê Bestamî, Cuneydî Bexdadî hwd., ve bû rêbezeke felsefî. Ew rêbazîya felsefî di nav alimên kurdan de jî bi bandora misilmaniyê belav bû. Li medrese û dergahan Elî Herîrî, Mewlana Xalid, Melayê Cizîrî, Mela Huseynê Bateyî, Îsmâil Bazîdî, Şerefhanê Hekarî hwd. mitesewifên kurdan yên mezin gihîştine û bandora wan jî, li ser gelek helbestvanan çêbûye.

Di vê çarçoveyê de tesewûfê îlham daye gelek helbestvanan û di wêjeya klasîk ya kurdî de bandora tesewûfê peyda bûye. Di sedsala yazdeh de, bi Elî Herîrî û Tahirê Hemedanî ve ew bandor li ser helbestvanên klasîk dest pê dike û di helbestvanên din de jî ew bandor berdewam dike.

TESEWÛF

WATEYA TESEWÛFÊ

Dîn her çiqas ku li ser civakê xwedî bandor e, civak jî bi wî awayî li ser dîn xwedî bandor e. Her civak li gorî çanda xwe ya dînî, xwe şirove dike û dîsa berê xwe dide dîn. Ji ber vê yekê, di her dîn û baweriyê de, şiroveyên cuda hene. Tesewûf di nav misilmantiyê de, şiroveyeke pir cuda ye.

Li gor hin lêkolîneran tesewûf, di demên misilmantiyê ewil de derketiye. Hin dibêjin di dema Hezretî Pêxember de tesewûf dest pê dike. Hin dibêjin wekî Cuneydî Bexdadî bi mitesewifên mezin, dû dema Hezretî Pêxember de tesewûfê dest pê kiriye. Li gor van dîtinan li serwateya tesewûfê te'rifên cuda hene.

Di dema Hezretî Pêxember (s.x.l.) de "Ehlê Suffe" hebûne. Ew sihabeyên Hezretî Pêxember di çavîyên Mescîda Nebewî de dijiyan, nedîşixulîn, çandinî û bazirganî nedikirin. Ew bi tenê di rêya Xwedê de diçûn, sibe û evarê li destûra Xwedê digeriyan. Ji ber vê sedemê ji wan re "suffî" hatiye gotin. Tesewûf, bi wan sihabeyan ve derketiye hole. Ehlê Suffe wekî mitesewifên paşê, bi felsefeyê re hemdem nebûne.²

Peyva tesewûfê, ji koka 'suf'ê hatiye wergirtin. Suf, netbûn û saffibûn e. Mitesewif ji gel dûr ketine û bi tenê li rêya Xwedê de bûne. Ji ber vê dûrketinê, ji wan re "Suffî" û ji felsefeya wan re jî "tesewûf" hatiye gotin. Lê belê di nav gel de, bi wan re "soffî" tê gotin.

Sûf, di erebî de navê heriyê ye. Di zemanê berê de, ji bo ku tê de rihet bikin, kincê bi herî li xwe dikirin. Merivên ku ew kincên bi rîs li xwe dikirin û di rêya Xwedê Teala de diçûn, bi peyva mitesewif, bi nav bûne.³

Tesewûf, xwe bi Qur'an û hedîsan ve girtin e. Wesla Xwedê ye, jiyana ruhan e, bi nefsa xwe re cîhad e, paqijîya qelban e.⁴ Ji Ebu Mihemed Cerîrî pirsîne ku "Tesewûf çi ye?" Wî jî wiha bersiv daye : " Destpêka mişwarên rind û bilind e û ji mişwarên bedbext jî xilas bûne."⁵

²İslam Ansiklopedisi, c.V, *Tasavvuf Maddesi*, Diyanet Yayınları, r.38.

³Kabaklı, Ahmet, *Türk Edebiyatı c.II*, Türk Edebiyatı Vakfı Yayınları, İstanbul, 1994, r.236.

⁴Yılmaz H. Kamil, *Anahatlarıyla Tasavvuf ve Tarikatlar*, Ensar Neşriyat, İstanbul 1994, r.30-31.

⁵Kuşeyrî, Abdulkerim, *Kuşeyrî Risalesi*, (Hazırlayan Süleyman Uludağ), Dergah Yayınları, İstanbul 1991, r.451.

Li gor hin dîtinan jî tesewûf, peyva 'sufî' hatiye. Merivên ku ji gel dûr dikevin û nefsên xwe dikûjin re sufi tê gotin.⁶

Cuneydî Bexdadî jî, tesewûfê wiha terîf dike, "Ji hemû tiştên dinê têkiliyê xwe berdan û bi Xwedê re yekbûn e."⁷ Di demên ewil de, bi suffîyan re zûhhd, nûssak, kurra, şukuffîye, bekka'ûn, ubbad hwd. hatiye gotin.⁸

Terîfên tesewûfê meriv dikare bi sê hêjmaran xurt bike. Ew civandinan ya yekemîn, ferman û qedexeyên Xwedê re teslîm bûne. Ya duyemîn bi exlaqê Xwedê û Pêxember ve exlaq bûne; ya sêyemîn jî bi qelbekî safî, ji bilî Xwedê ji hemû tiştan dûr ketine.⁹

Çavkanîyên tesewûfê dudu ne. Yek ji wan Qur'ana Hekîm e. Çavkanîya duyemîn jî, jiyana Hezretî Pêxember û jiyana sihabeyên Wî ye.¹⁰ Mijarên tesewûfê bi wateya giştî Xwedê, hemû hebûn û insan in.¹¹

Li gor felsefa tesewûfê, gerdûn tek hebûn e. Ew hebûna tek jî, Xwedê ye. Xwedê ezêlî û ebedî ye, bê dawî ye. Ew li her dem û li her cihî heye, ji vê şûn de jî ew ê her hebe. Ew tek, hebûna wicûda mutleq e. Bi vê re ew, cemala mutleq, husna mutleq, xeyra mutleq, kemala mutleq e jî. Hebûnên ku di vê gerdûnê de hemû şewqvedana wicûda mutleq in, şewqvedana Xwedê ne. Ew, di wateya mutleq de yek e, îlahekî bi tenê ye.

Piraniya zikir, wird û emelên baş di tesewûfê de armanc nîne. Qalîteya ew zikir, wird û emelên baş zêde kirin û paqijîya qelban di tesewûfê de armanca esîl e.¹²

Wehdetîl wicûd jî, di tesewûfê de, felsefa wehdetê ye. Hebûn tek e, ew jî Xwedê ye. Hemû tiştên ku em dibînin, hebûna Xwedê ne, wekî ku meriv rêzeçiyayê li peşîyê xwe dibîne û ji bilî wan tiştêkî din nabîne, hemû tiştan de jî Ew heye. Her wiha hemû hebûnên ku hene, heqîqet ew xiyalên Xwedê ne.¹³

⁶Tavvakoli, Muhammed Rauf, *Kürdistan Tasavvuf Tarihi*, (Çeviren Mehmet Polat, Hivda Yayınları, İstanbul 2010, r.9.

⁷Sühreverdî, *Tasavvufun Esasları*, (Çeviren H.Kamil Yılmaz), İstanbul 1989, r. 64.

⁸Doğrul, Ömer Rıza, *İslamiyetin Geliştirdiği Tasavvuf*, Ahmet Halit Kitabevi, İstanbul 1948, r.48.

⁹Eraydın, Selçuk, *Tasavvuf ve Tarikatlar*, Marmara Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Yayınları, İstanbul 1994, r.40.

¹⁰Gündoğdu, Cengiz, *Abdülmeccid-i Sivasi, Hayatı, Eserleri ve Tasavvufî Görüşleri*, t.ç. r. 5-8.

¹¹Yılmaz, h.b., r.59.

¹²Kuşeyrî, h.b., r.24.

¹³Banarlı, Nihad Sami, *Resimli Türk Edebiyatı Tarihi*, Milli Eğitim Basımevi, İstanbul 1971, r.120.

Xwedê Teala di Qur'ana Hakîm de dibêje: Xwedêyê we bi tenê ye. Ji bilî wî îlah tune ye, Ew Rehman û Rehîm e.¹⁴

Di tesewûfê de "Insanê Kamil" payeya mitesewifan ya herî bilind e. Her murîd li vê payeyê digere. Pênc mertebeyên felsefeya tesewûfê hene: Xeyba Mutleq, 'Elema Ceberût, 'Elema Melekût, 'Elema Şehadet, 'Elema Insanê Kamil. Insanê kamil, hemû mertebeyan digire nava xwe. Ew mertebe, nêzikiya bi Xwedê re yekbûnê ye. Murşîdê kamil, insanê kamil e. Berê xwe nas dike, bi vê nasbûnê jî Xwedê nas dike û bi Xwedê re dibe yek. Ew bi Xwedê re yek bûnê insanê kamil re fenafillah û beqabîllah tê gotin. Di Xwedê de fanî û baqî bûne.

Di tesewûfê de sofî ji alemê hîçî tèn alemê hebûn e. Berê ew hebûnên bê can in, paşê dibin heywan û dû re hêj dibin insan. Pêda pêda bilind dibin û dibin insanê kamil û digihîjin Xwedêyê xwe û vedigerin eslê xwe. Mitesewif ji vê rêwîtiyê re dibêjên "Seyra Nuzûlê" û "Seyra 'Urûcê".

Di tesewûfê de şêx hene. Şêx insanên kamil û murşîdên kamil in. Şêx li dergahan rêya Xwedê de diçin. Mirov jî li pey van şêxan diçin. Şêx murşîd e, merivê ku li pey şêxa diçin jî murîd in.

Ebu Nasr Abdullah b. Elî Serrâc Tûsî di pirtûka xwe 'El-Luma' de heft meqamê tesewûfê dibêje: tewbe, wer'a, zuht, fexr, sebir, tewekûl, riza.¹⁵

Mitesewif bi peyvên mecazî, biwêjên tesewûfê wekî mehbûb, yar, bilbil, gul, mecnûn, dil, dilber, cewr, cefa, me'şûq, aşiq, eşq, evîn, şerab, mey, xemr, serxweşbûn, mestbûn hwd. armanca xwe tînin ziman. Armanca mitesewif eşqa îlahî ye. Wekî ku bilbil her dem eşqa gulê diyar dike û bi vê eşqa gulê dijî; aşiq jî, mitesewif jî, wekî bilbil her tim eşqa Xwedê diyar dike û bi eşqa Xwedê re dijî.

Di tesewûfê de eşq du cure ye. Yek ji wan eşqa mecazî ye. Eşqa duyemîn jî eşqa heqîqî ye, eşqa îlahî ye. Ew eşq rasterast eşqa Xwedê ye. Eşqa mecazî, eşqa dost û xweşikîyên dinê ye, eşqa demborî ye. Lewra ku mirov ji kê û ji her çî hez dike, lê belê dîsa Xwedê bi sifet û şewqa xwe di wan de xuya dike. Her hebûn meriv digihîjine Xwedê. Ango dîsa ew ji Xwedê hez dike. Eşqa mecazî dibe eşqa heqîqî.

¹⁴Beqere, 163.

¹⁵Tavvakoli, h.b., r.75.

BI KURTASÎ LI SER DÎROKA TESEWÛFÊ

Tesewûfê di dema Hezretî Pêxember de bi Ehlê Suffe dest pê kiriye. Lê di vê dema ewil de, rebazeke felsefî tune bû.

Tesewûf, bi rêbazeke felsefî di sedsala piştî dema Hezretî Pêxember derketiye holê û pêşve çûye. Lê belê bi distur û mitesewifên girîng tesewûf di sedsala nehan de destpê dike.

Ji Hîcra Hezretî Pêxember (s.x.l), şûn de Hîcrî sala 150an de merivê ewil ku bi navlekê 'Sûfî' te gotin, Ebû Haşim El-Kûfî es-Sûfî ye. Ji ber vê yekê ew mitesewifê yekemîn te qebûl kirin.¹⁶

Tesewûf, dema ewil deverên wekî Kûfe, Horasan, Misr, Nîşapûr, Şam û bi taybetî jî li Bexdadê pêş ve çûye. Ew herêm, mitesewifên mezin ghişandine. Hadraveyh (854), Ebû Turab Nahşebî (859), Ebû Abdullah Siczî (sedsala 9an), Hallacê Mensûr (921), Bayezidê Bestamî (875) meriv dikare di nav wan mitesewifan de bihejmêre.¹⁷ Îbrahîm Edhem, Bîşr Hafî, Ma'rufê Kerxî, Şaqîq Belhî, Seriyî Sakatî, Hamdun Kassar ji mitesewifên seretayî ne.¹⁸ Mitesewifên herî mezin li herêmên Tirkîstan, Îran û Bakûrê Efrîkayê belav bûne. Buxara, Semerqend, Bexdad di nav bajarên ku tesewûf lê serkeftî bûye cîhên baş digrin. Li vê herêmê Ehmed Yesewî, Evdilqadir Geylanî û Cuneydî Bexdadî mitesewifên serkeftî ne. Ebdal Musa, Beyazîd Bestamî, Bîşrê Xafî, Fudeyl Bîn Îyaz, Haris El Muhasibî, Îbrahîm Edhem, Îmamê Xezalî, Muhyeddîn Erebbî, Şahê Nexşebend, Yunus Emre, Mewlana jî sofîyen mezin in.¹⁹

Di nav neteweyên misilman de wekî ereban, ji tirkan jî gelek mitesewifên navdar hene. Neteweya kurd jî eynî wekî tirkan, çand û jiyana xwe li gor tesewûfê sererast kiriye. Ji ber vê yekê tesewûf di nav neteweyên tirk û kurd de gelek belav bûye û mitesewifên mezin ghiştine û berhemên gelek navdar dane.

Li Anatolyayê, Mewlana Celaleddîn Rumî, Suhrewerdî, Faxreddînê Irakî, Ahî Ewran, Evhaddîn Kîrmanî, Hecî Bektaş, Hecî Bayram Welî, Yunus Emre,

¹⁶Gündoğdu, h.b., r.2.

¹⁷Köprülü, Fuad, *Türk Edebiyatında İlk Mutasavvıflar*, Milli Eğitim Bakanlığı Yayınları, Ankara 1984, r.16.

¹⁸Eraydın, h.b., r.63.

¹⁹Türer, Osman, *Ana Hatlarıyla Tasavvuf Tarihi*, Ataç Yayınları, İstanbul 2011, r.29.

Sadreddîn Konewî hwd. mitesewifên navdar in. Bi tirkî, erebî û farisî felsefa tesewûfê di berhemên xwe de bi taybetî cih kirine.²⁰

Di nav kurdan de mitesewifê ewil Şêx Xelîl Kurdî ye. Ji wî şûn de, Xace Ebdullah Çavpare, Şêx Ebubekir Yezdanyar, Ebu Hasan El Urmewî, Şêx Ebul Hasan Kurdeweyh, Ebu Ebdullah El Mukrî, Ebu Abdilkasim El Mukrî, Ebu Ebdullah Dinewerî, Ebul Kasr Bestî, Ehmed Sûnbûlî, Şêx Ebu Tahirî Kurd, Cemaleddîn Lorî, Şêx Cagîr, Ebubekir bîn Hewara, Şêx Mihemed Şenbekî, pîrî Vefaiyan Tacul Arifîn Şêx Ebul Vefa, Şêx Suweyd Sincari, Şêx Elî El Kurdî, Ebu Mihemed Macîd El Kurdî, Yûsif El Acemî El Goranî, 'Emer El Kurdî, Cuhlan El Kurdî, Şêx Ebubekir Zahîd El Kurdî, Şêx Elî Herîrî mitesewifên pêşî ne.²¹

Li gor hin lêkolîneran, di nav kurdan de mitesewifê yekemîn Elî Herîrî ye. Tahîrê Hemedanî ji dû wî re tê.²² Melayê Cizîrî, wekî Ehmed Yesewî di nav kurdan demitesewifê serkeftî ye. Feqiyê Teyran, Ehmedê Xanî, Mela Huseynê Bateyî, Îsmail Bazîdî, Mewlana Xalid, Şerefhanê Hekarî, Murad Xanê Bazîdî, Mele Xelîlê Sêrtî jî di nav mitesewifên kurdan yên navdar de meriv dikare bihejmêre.

Li ser mitesewifan bandora terîqeta Neqşebendîyê jî gelek mezin e. Mitesewifên kurdan jî gelek di bin bandora Neqşebendîyê de mane. Medresa pêşîn ku lê mitesewifê kurd gihîştinê di sala 950'an de li Hemedanê ye. Tahîrê Hemedanî (Tahîrê Uryan) li vê derê gihîştîye û melatî kiriye. Navnasê wî Uryanî ye.²³

Terîqet ji felsefa tesewûfê re bingeh e. Terîqetên Neqşebendî û Qadîrî di nav van de yên navdar in. Terîqeta Mewlana ya ku bi Mewlewî nav dibe, li Anatolyayê belav bûye. Terîqeta Ehmed Yesewî ya ku bi Yesewî nav dibe jî li Asyaya Navîn belav bûye. Rifaî, Halwetî, Şazelî û Bektaşî ji terîqetên din in.

Behaeddîn Mihemedê Neqşebendî, pîrê terîqeta Neqşebendîyê ye. Mewlana Xalid Bexdadî jî Neqşebendî ye. Mexlana Xalid, şêxê beşa terîqeta Neqşebendîyê

²⁰Köprülü, Fuad, *Edebiyat Araştırmaları*, Milli Eğitim Bakanlığı Yayınları, Ankara 1986, r. 184.

²¹Müfit Yüksel, *Tarihimizde Kürt Mutasavvıflar*, <http://yenisafak.com.tr/yazarlar/?t=18.02.2012&y=MufitYuksel>, 18 Sibata 2012.

²²Sağınç, Feqi Huseyn, *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2002, r.364.

²³Sadık Yalsızuçanlar, *Kürt Dilinde Tasavvuf*, sadikyalsizucanlar.net/soylesiler/kurt-dilinde-tasavvuf-2.html, 24 Hezîran 2010.

Xelîlîyê ye. Şêx Evdîrehman Xâlis Tâlebânî û Şêx Nureddin Brîfkânî jî, pîrên terîqeta Qadîrî ne. Her du şêx jî helbestvan û mitesewifên kurd yên gelek navdar in.²⁴

Di sala 1136-1206an de li Medreseya Sor, Îsmâîl Cizîrî derketiye, ew jî di nav mitesewifên kurd de navdar e. Wî projeya robot û computerê jî çêkiriye. Medresa Sor di nav kurdan de cihêkî baş girtiye. Elî Herîrî jî di vê demê de gihiştîye. Di dema Selaheddîn Eyyubî de, di nav kurdan de bîst medreseyên navdar hebûne. Di sedsala 13an de gava Moxolan êrîş anîne li ser Rojhilata Navîne, gelek medreseyên kurdan yên mezin şewitandine. Di sedsala 14an de Tîmurleng, medrese û berhemên kurdan şewitandiye da ku ew bi pêş nekevin. Di sala 1501ê de Şahê Îranê Şah Ebbas zor daye kurdan ku Şîatiyê qebûl bikin. Kurdan qebûl nekiriye. Wî bi pîranî mitesewif û alîm, li der dor î çel hezar kurd kuştîye. Bi pêşketiya Mewlana Idrîs Bedlisî Kurd çûne cem Yavuz Selîm e. Li Amasyayê “Peymana Amasyayê” çekirine. Bi vê peymanê li hember Şahê Îranê yekîfî çekirine û zilma Şah ji ser xwe rakirine. Li ser vê peymanê, Împaratoriya Osmanî berfireh bûye. Ji vê demê û şûn de, medreseyên kurdan jî ava û geş bûne û tesewûf di nav kurdan de gelek bi pêş ketiye Mitesewifên wekî Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran û Ehmedê Xanî derketine holê.²⁵

²⁴Yüksel, h.b. , r.2.

²⁵Agahiyên li vir, Nivîskar/Lêkolîner Zeynel Abidîn Zinar di sala 2013an meha Adarê de li Zenîngeha Bîngole, di semînerê de diyar kir.

BIWÊJÊN TESEWÛFÊ

Zimanê tesewûfê bi tesewûfê re derketiye holê. Di demên ewil yên tesewûfê de sûfî bi hev re peyvîne, berhem û name nivîsandine. Biwêjên tesewûfê bi van name, berhemanan ve pêk hatine. Di sedsalên dû re jî, ew biwêjên tesewûfê di nav mitesewifan de belav dibin. Sedema ku tesewûf, felsefa dînî ye, sembolên tesewûfê jî bi wateya xwe hemû dînî ne. Hin ji wan bi peyvên mecazî, hin jî rasterast bi peyvên dînî pêk tên. Li jêr em bi kurtasî van biwêjên tesewûfê binêrin.

1. Biwêjên Mecazî

Di tesewûfê de biwêjên ku mitesewif di helbestên xwe de bi kar tînin hin me'neyên xwe mecazî ne. Wekî saqî, cam, mey, meyxane, cefa, bilbil, me'şûq cewr, mecnûn, derd, eşq, aşiq, dilber, husn, şerab, zulf hwd.

Bi biwêjên saqî, mey, meyxane, şerab, cam helbestvan cih ku li şerab tê vexwarin, ango meyxaneyê teswîr dikin. Lêbelê ew meyxane, dergah e, tekke ye. Ev der e ku qûl ji Xwedê re dia dike û perwerdeya dînî dibîne. Saqîyê ku meyê belav dikin jî murşîd, ango şêxan temsîl dikin. Mey û şerab jî perwerdeya ku murşîd didine murîdan in. Cam dilê murîd û murşîdan îfade dike. Lê ev dila bi eşqa Xwedê tijî ye.

Ehmedê Xanî, bi van biwêjên mecazî wiha dibêje :

Saqî! Bi gerrîn badeyê engûrê bi tenbûr

Cana! Bide min boseyekî her we bi dil xwaz²⁶

Ji saqî dixwaze ku ev şerabê bi saz û tenbûre ve bigerîne û belav bike. Ji yara xwe bi dil xwastî ramûsanekî dixwaze. Ew eşqa Xwedê dixwaze. Merivên wekî Ehmedê Xanî mitesewif û şêx, karên xwe bi şerab û saqî û meyxanan tune ye. Ev peyvên mecazî ne. Di tesewûfê de sembol in.

Dilber, husn, mecnûn, eşq, me'şûq, aşiq, mest, zulf jî peyvên mecazî ne û têkilîyê xwe bi hev re hene. Dilber dildar e, yar e, bedew e. Husna, xweşikîya li dinê herî baş ew e. Ev bi zulfên xwe aşiq mest û serxweş dike. Aşiq di helbestan de bi pîranî, bi dîn bûna xwe ve xwe teşbîha mecnûn dikin. Dilber, husn, me'şûq Xwedê Teala îfade dike. Eşqa ku helbestvan bi van peyvên mecazî dibêje eşqa heqîqî ye eşqa Îlahî ye.

²⁶Durre, Abdurrahman, *Şerha Dîwana Ehmedê Xanî Felsefe û Jiyana Wî*, Weşanên Avesta, Stenbol 2002, r.233.

Di vê çarîne de ji Tahirê Hemedanî xwe wekî mecnûn û bilbil teşbîh dike:

Bi bêhna zulfê te meftûn im ey gul
Ji rengê ruwê te dilxûn im ey gul
Aşiq im ji eşqa te bêqerar im
Tu wek Leyla, ez wek Mecnûn im ey gul²⁷

Bilbil aşiqê bêhna zulfê gulê ye. Deng li gulê dide. Ev jî wekî bilbil e, ji rengê gulê dilxwîn e, lê bêqerar e. Wekî mecnûn aşiq e. Ew eşq, eşqa mecazî ye. Helbestvan bi van biwêjên mecazî eşqa îlahî diyar dike.

Di tesewûfê de aşiq ji dest eşqa xwe cefa, cewr û derd dibîne. Her dem ah dikişîne. Lê dîsa ev ji halê xwe gazind nake. Dixwaze ku ew cefa û derdên wî berdewam bibe. Ev derd û ahên aşiq ji eşqa Xwedê ne. Ku ew derd û ah xelas bibin, eşqa Xwedê jî yê li holê rabe. Wê wextê ew derdên divê xilas nebin.

Melaye Cizîrî, di helbestên xwe de cewr û cefaya yarê gazind dike:

Sed cewr û cefa dî bi me naçin ji derê te
Yekser tu nabatî û li tab'ê megesim ez²⁸

Ey yara min, min sed cewr û cefa ji te dît, lê ez ji der û dorê te dûr nakevim. Lewra tu wekî şekir î, ez ji wekî meşê me. Ew eşqa te çiqas bêhtengî, cewr û cefa bide min jî, wekî ku mêş ji şekir dûr nabe, ez jî, ji te dûr nabim. Ku aşiq çiqas cefa û cewr bibîne jî ji eşqa xwe dûr nabe. Di wêjeya klasîk ya tirkî de helbestvanê navdar Fuzûlî jî wekî Mele ji cefayê yarê gazind dike û wiha dibêje:

Aşk derdiyle hoşem el çek ilacımdan tabib
Kılma derman kim hela kim zehri dermanındadır²⁹

Ango, ez ji derdên eşqa xwe evqas kêfdar im, dermanên ku tu ji min re bibînî yên bibin axuya min û derdê min. Ji vê eşqê dûrbûn derd e. Ev eşqa Xwedê ye. Merivên ku ji eşqa Xwedê dûr dibin, ew bi xwe cefayê dikin.

²⁷Kara, Sabah (Wer.), *Dubeytî, Baba Tahirê Uryan*, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2012, r.36.

²⁸Turan, Abdulkaki, *Melayê Cizîrî Divanı ve Şerhi*, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2010, r.402.

²⁹İpekten, Halûk, *Fuzûli, Hayatı, Sanatı, Eserleri*, Akçağ Yayınları, Ankara 1997, r.194.

2. Biwêjên Dînî

Mitesewif bi piranî di helbestên xwe de rasterast peyvên dînî bi kar tînin. Ew biwêjên tesewûfê bi peyvên, Reb, Xaliq, Xwedê, Mehbûb, Heq, Tûr, navê pêxemberan, tewhîd, wehdet, bezma elest, bihuşt, terîqet, dergah, şêx, murîd û murşîd hwd. pêk tên.

Mela Zahirê Tendûrekî, li jêr ew biwêjên tesewûfê yên rasterast nav û sifetên Xwedê Teala wiha bi cih dike :

Ya Îlahî tu Kerîm î tu Rehîm î bêxerez

Tewqedarê rehm û îhsanê ji te ya Reb tu bes³⁰

Mela Tendûrekî, di vê risteyê de sifetê Xwedê Teala dihejmêre û dipesîne. Ew Reb e, Rehîm e, Kerîm e, Xwedê ye. Hemû rehm û îhsan ji Wî ne. Ew ne hewceyî tu kesî ye. Hemû hebûn hewceyî Wî ne.

Hin simbolên tesewûfê rasterast di helbestan de bi nav nabin. Lê bi wateya peyvan, mitesewif ew sembolan eşkere dikin. Wekî simbolên insanê kamîl, dia, munacat, wehdetîl wicûd, fena fillah, beka billah, fena, beka hwd.

Melayê Cizîrî, felsefa wehdetîl wicûd, di risteyê jêr de eşkere dike:

Mela her wî bibîn her wî eger her wî dinasî tu

Huwe-l me'bûd huwe-l meşhûdu bella xayre fid-dareyn³¹

Ey Mele, her tim Wî, ango Xwedê Teala bibîn, ew her tim ma'bûd e. Li dinê û li axretê bê Wî tişteki din tune ye. Ew mewcûd e, tek hebûn e. Hemû hebûnên ku Wî afirandinî sedema ku, Wî bi me qûlan bimînin hene. Li vir Mele, simbol û felsefa wehdetîl wicûd bi peyvên erebî û kurdî bikaraniye.

³⁰Biçici, Mela Abdurrahman (Amd.), *Dîwan, Mela Zahirê Tendûrekî*, Weş. Nûbihar, Stenbol 2007, r.139.

³¹Turan, h.b., r.732.

1. BEŞA YEKEMÎN

1. WÊJEYA KLASÎK YA KURDÎ

1.1. LÎ SER WÊJEYA KLASÎK YA KURDÎ

Klasîk, ji tiştên kevn yên ku dema xwe bihûrandine re tê gotin. Ew tiştên ku bi klasîk nav dibin bi kok û bingehên xwe qehîm in û di nav gel de demên pişt re jî kevneşopiya xwe hene.

Ji bo wêjeyê jî “klasîk” nivîs û berhemên di her demê de qîmet re tê gotin. Berhemên klasîk di demên pişt re de bîr nabin. Her tim di nav gel de bi coş tîn xwendin.

Ferhenga Zana Farqînî de klasîk wiha tê terîfkirin:

*"Tiştê ku bi ziman û hunera serdema kevn a Roma û Yewnan re têkildar e, tiştê ku bi ziman, huner û nivîskarên Fransîz ên serdema XVII. re têkildar e, berhem an jî hunermendê ku demeke dûvdirêj di ser re derbas dibe, tişteke ji qîmeta xwe wînda nake. Herwiha kevneşopî, kevnare, vetûrî yanê tiştê ku tê de nûnî çênebûye, kevnetore."*³²

Zeynel Abidîn Zinar jî peyva klasîk wiha terîf dike: "

*"Peyva klasîk, wek bêje bi wateya xwe ya ferhengî, ji wê nivîsê re tê gotin ku di çarçoveyêke kifş de hatiye amadekirin. Lê di nava xelkê de bi gelek hawayên cuda tê fêmkirin. Îcar ji ber ku piraniya berhemên kurdî bi kêş û nikl û qafiyê hatine nivîsandin, ji ber hindê ye ku ji wan re klasîk hatiye gotin. Ev gotina klasîk, li piraniya welatên dinyayê jî her klasîk/kilasîk tê gotin."*³³

Di wêjeya kurdî de berhemên kû di nav gel de roj bi roj qîmetên xwe zêde dibin hene. Wekî Mem û Zîn a Ehmedê Xanî, Dîwana Melayê Cizîrî, Mewlîda Mela Huseynê Bateyî hwd. Ev berhem klasîkên me kurdan in. Wêjeya klasîk ya kurdî ji van berhemên bêhempa pêk tîn.

Helbestvanên wêjeya klasîk yên kurd, bi piranî di bin bandora folklorê kurdî, çanda Îslamê û tesewûfê de mane. Wekî tesewûfê, bingehên din yên wêjeya klasîk a kurdî jî hene.

³²Farqînî, Zana, *Ferheng*, Enstîtuya Kurdî ya Stenbole, Stenbol 2002, r.731.

³³Zinar, Zeynel Abidîn, *Di Çanda Kurdî de 37 Şaxên Zanistiyê*, Weşanxaneya Çanda Kurdî, Stockholm 2009, r.168.

Nivîskar, lêkolîner Zeynel Abidîn Zinar, li ser bingeha klasîkên kurdî de wiha dihêjmire:³⁴

1. Afîrandina bavê mirovan Adem pêxember û ji dola wî pence pêxemberên ku derketine holê heta Mihemed Pêxember.

2. Afîrandina dinyayê.

3. Baweriya bi xwetiye.

4. Berbihevanîna zaravayên kurdî.

5. Berpirsyarî û xwenasîya mirovan û mirovatî û dinyayê.

6. Bipêşketina mejiyê mirovan.

7. Camêrî û mêvanperwerî, mêvanperwerî ya kurdan.

8. Çîrok û çîrvanokên folklorê kurdî û toreyê kurdî.

9. Girêdana mirovan bi koka wan ve û serbilindiya wan bi nijada wan.

10. Hemû cûre şaxên zanistiyê.

11. Peyv û bêjeyên ji zarava û devokên din yê kurdî.

12. Qelaştina sînorên dewletan.

13. Rengê bav û bapîran.

14. Rewşa kaînatê û dabeşkirina dinyayê wek parzemîn.

15. Serkeftina di karûbarên xwe de.

16. Şexsiyeta kesayetî.

17. Tekstên olî, ol û ayîn.

18. Term û bêjeyên kevnare.

Nivîskar/Lêkolîner Tehsîn Îbrahîm Doskî, sê çavkanîyên wêjeya kurdî dihêjmire:

"Sê serkaniyên, yanî çavkanîyên zimanê kurdî hene: "Çavkaniya yekemîn, axaftina xelkê kurd yê ku nehatiye bişavtin. Çavkaniya duyemîna zimanê kurdî folklorê kurdî ye, jixwe folklorê jî dinava xelkê nehatî bişavtin de ya zindî ye. Çavkanîya sêyemîn jî wêjeya klasîka kurdî ye, lewra ev klasîka han hatiye nivîsîn û parastin. Rast e di nava wêjeya klasîk a kurdî de, peyv û termên biyanî wekî peyvên Erebi, Farisî û Tirkî hene. Wêjeya çêkirî ne mumkîn e ku xwerû bi zimanekî be."³⁵

³⁴Zinar, h.b., r.169.

³⁵Doskî, Tehsîn Îbrahîm(Amd.), *Dîwana Bêxew*, Weş. Nûbihar, Stenbol 2013, r.9-10.

Lêkolîner li ser wêjeya klasîk ya kurdî gelek xebat kirine. Li ser dîroka wêjeya klasîk ya kurdî, di navbera lêkolîneran de bergehên cuda hene. Di nav van lêkolîneran de yekbûn tune ye.

Dema ku meriv xebatên li ser dîroka wêjeya kurdî dinêre, kêmasiyên nivîskar û lêkolînerên kurd xuya dike. Lewra nivîskarên ku li ser wêjeya kurdî xebat û lêkolîn kirinî, bi piranî nivîskarên biyanî ne. Wekî Alexander Jaba, Rudenko, Mînorskî hwd.

Xebatên lêkolînerên kurd û biyanî yên li ser wêjeya kurdî, piraniya helbestvanên wêjeya klasîk ya kurdî û dewlemendiyê wêjeya kurdî nîşan dide..

Qanetê Kurdo ew mêrên qehreman bi me dide nasîn:

*"Di tarîxa edebyeta kurdî de tê li ber çavan, ku li nav sing û berê çiyayên Kurdistanê de gelek mêrên çê, gelek camêr, zanyar, hozan û şêrbêj û helbestbêj derketine, ku di tarîxê de ji nav neteweyê kurd mêrên qehreman hebûne, tiştên wusa rind û hêja afirandine, ku merivên niha jê ecêb mayî dibe."*³⁶

³⁶Kurdo, Qanatê, *Tarîxa Edebyata Kurdî*, Weşanên Öz-Ge, Ankara 1992, r.8.

1.2. NÛNERÊN WÊJEYA KLASÎK YA KURDÎ

Meriv ku xebatên li ser dîroka wêjeya kurdî ya klasîk dinêre, piraniya nunerên wêjeya kurdî yên klasîk dibîne. Ji van hinek di dîrokê de ji bîr bûne, berhemên xwe qet çap nekirine. Hinek jî wekî Melayê Cizîrî navdar bûne û berhemên xwe pir caran çap kirine.

Li ser nûnerên wêjeya klasîk yên kurdî lêkolîn pir in. Lê ji nav wan helbestvana yekemîn kî ye? Li ser vê mijarê jî, di nav lêkolîneran de yekîti tune ye.

Qanadê Kurdo, di berhema xwe ya "*Tarîxa Edebyata Kurdî*" de li ser helbestvanên wêjeya klasîk ya kurdî helbesta Ehmedê Xanî nimûneyeke digre û wiha dibêje:

"Berê pêşin sertacê lîtêratûra kurdî, binyat û binaxedarê bîr û baweriya kurdewerî, kurdperwerî û wetenperwerîya serxwebûnakurd û Kurdistanê, şairê kurd ê mezin û bi nav û deng Ehmedê Xanî di "Mem û Zîn"a xwe de nivîsiye, ku berî wî şair û nivîskarên kurdan hebûne, lê navê wan hatiye ji bîr kirine, çimkî kesek tune bûye navê wan ji bîr bûne û binivîse, ku kurd jî xwediyê şair û nivîskaran bûne, ku şairên wan jî hebûne. Derheqa vê yekêda Ehmedê Xanî ev rêzên jêrîn di "Mem û Zîn"a xwe de nivîsiye :

Ger dê hebûwa me jî xudanek
Alî keremek, letîf danek
U'lm û huner û kemal û ezan
Şêr û xezal û kitab û dîwan
A'lî bikira li banê gerdun,
Binave ruhê Melê Cizîrî,
Pê hê bikira Elî Herîrî,
Keyfek wê bida Feqê Teyran,
Heta ba ebed bima heyran

Li paşê aşkera bû, ku bi rastî ev hersê şair (Mele Cizîrî, Elî Herîrî û Feqê Teyran) li berî Ehmedê Xanî hebûne, şêr û dîwan bi kurmancî nivîsîne. Lê sed car heyf, ku di wê demê de kes tune bûye, ku serhatîya wan û nivîsarên wan di nav gel de belav bikin. Le divêt bêjin, ku li nav goveka xwendekar û xwendevanê silsilata derebegên kurdan de navê gelek şair û nivîskaran aşkera bû, ku di nav wan de bi nivîsar yan jî bi zargotîn gilî dikirin, ku şêrbêj û helbestbêjên kurd hebûne."³⁷

M. Emin Demir, di meqaleya xwe ya bi navê, "*Li Ser Klasîkên Kurdî*" de ramanên Alexander Jaba, Enver Mayî û Celadet Elî Bedîrxan û nûnerên wêjeya klasîk yên kurdî dihêjmire. Nivîskarê wêjeya klasîk ya kurdî yê yekemîn, Elî Herîrî ye. Hin Tahirê Hemedanî re dibêjin ku ew mitesewifê kurdan ê pêşî ye. Lêkolînerên kurd jî dibêjin ku nivîskarê wêjeya klasîk a kurdî Îbn Xelîkan e. Di zemanê me de qet berhemê Îbn Xelîkan tune ne. Feqet berhemên Elî Herîrî gihîştine roja me. Alexander

³⁷Kurdo, h.b., r.13.

Jaba di pirtûka xwe de heşt nivîskarê klasîkên kurd dihejmêre. Elî Herîrî (1010-1078), Melayê Cizîrî (1407 – 1481), Feqiyê Teyran (1560-1650), Melayê Batê (1417-1491), Ehmedê Xanî (1650-1706), Îsmâîlê Bazîdî (1654-1709), Şerefxanê Hekarî (1682-1748), Murad Xanê Bazîdî (1736-1778). Celadet Elî Bedîrxan jî di nav nivîskarên klasîk yên kurd de, Axayê Bidarî, Siyahpûş, Axayok, Mewlana Xalid, Mela Yehyayê Mizûrî, Mela Xelîlê Sêrtî, Hecî Fetahê Hezroyî, Şêx Mihemedê Hedî, Şêx Evdîrehmanê Taxê, Şêx Nureddînê Birîfkî, Şêx Evdîrehmanê Axtepî, Melayê 'Erwasî dihejmirê. Ev helbestvanan bi kurmancî nivîsandine.³⁸

Li gor lêkolîner Zeynel Abîdîn Zinar, 202 helbestvan di wêjeya klasîk ya kurdî de hene. Zeynel Abîdîn Zinar, di berhema xwe "*Di Çanda Kurdî de 37 Şaxên Zanistiyê*" de ji wan helbestvanan hinek nivîsandiye:

- Axa Şewqiyê Bêdarî.
- Bekir Begê Erzî.
- Celadet Elî Bedîrxan.
- Derdî.
- Dr. Mes`ûd Kitanî Bihnarî.
- Ebdulqadir Beg Guş.
- Feqî Sirayî.
- Ebdulqadir Kuvlî.
- Ebdulsemed Babek ji S. Beh.
- Ebdurehîm Rehmiyê Hekarî.
- Ebdurehîm Şewqî.
- Ehmed Emîn Nalbend.
- Ehmed Ramizê Licî.
- Ehmedê Katib.
- Ehmedê Mirzayê Wanî.
- Ehmedê Xanî.
- Elî Herîrî.
- Elî Seydo Goranî Kurdî.
- Elî Teremaxî.
- Eliyê Amêdî (Elî el Emadî).
- Enwerê Mayî.
- Feqe Ehmed Rusî El Muxliss.
- Feqî Reşîdê Hekarî.
- Feqî Reşîdê Şalekî.
- Feqiyê Teyran.
- Fethulahê Sêrtî.
- Hacî Fetah Hezroyî.
- Hamidê Mayî.
- Haris Bedlîsî Sewadî.
- Heme Kûr.
- Hemîdî.

³⁸Demir, M. Emin, *Li Ser Klasîkên Kurdî*, nucevan.com/cand/li-ser-klaskn-kurd.htm, 13 Îlon 2012.

- Hesênê Bamernî.
- Hesênê Kewaşî.
- Hicrî.
- Huseynî.
- Husniyê Bamernî.
- Huznî .
- Îsmâil Bayezîdî.
- Kamîran Bedirxan.
- Laxerê Cizîrî.
- Macid.
- Melayê Bateyî.
- Melayê Cizîrî Ehmed.
- Mele Ebdulkerîmê Banî.
- Mele Ehmed Qoxî.
- Mele Ehmed Xasî.
- Mele Evdilhadiyê Comanî,
- Mele Evdilmecîd.
- Mele Hesên Kurdî.
- Mele Hesên Qerenazî.
- Mele Huseyn Keleş.
- Mele M. Emîn Heyderî.
- Mele Mehmûd Bazîdî.
- Mele Mehmûd Dêrşewî.
- Mele Mehmûdê Hoserî.
- Mele Mihemed Liceyî.
- Mele Mûsa Mizî.
- Mele Naîf.
- Mele Necmedîn Tengezarî.
- Mele Nûriyê Hesarî.
- Mele Nûrulah Kodişki.
- Mele Şêx mûsê Hesarî.
- Mele Ūnisê Herqetênî.
- Mele Xelîlê Sêrtî.
- Mele Yasîn Yusrî.
- Memdûh Birîfkanî/Xelatî.
- Mensûrê Girgaşî.
- Mêzer Rast.
- Mihemed Axayê Bisrî.
- Mihemed Elî Ewnî.
- Mihemed Emînê Hilalî Goyan.
- Mihemed Hezînê Xalidî .
- Mihemed Sedîqê Şernexî.
- Mihemed Seîdê Birîfkî.
- Mihemed Teyar Paşa Xerîbî.
- Mihemedê Mexribî.
- Mihemedê Zêbarî.
- Mîhreban Berwarî.
- Mihrî.
- Mîna.
- Mîr Emadedînê Hekarî, Hakimê Hekarî.
- Miskîn.

- Mistefayê Bîtarî."³⁹

Ew nûnerên wêjeya klasîk ya kurdî ku lêkolîner dihêjmirin, hemûyan berhemên xwe negihîştine dema me ye. Lê hin helbestvanan bi tenê navê xwe hene. Hin helbestvanan jî berhemên xwe tune ne, lê hin helbestên xwe di nav gel de belav bûne. Wekî helbestê Elî Herîrî ya bi navê "Têt". Berhemên Elî Herîrî negihîştine dema me ye û çap nebûne, lê helbestê xwe "Têt", di nav gel de navdar e.

Di dîroka wêjeya klasîk ya kurdî de giştî zaravayên kurdî jî, berhemên herî baş hatine nivîsandin. Ew jî dewlemendiya ziman û wêjeya klasîk a kurdî ye.

Hin nivîskarên klasîk ya kurdî jî bi zaraveyî soranî, goranî û zazakî berhemên xwe dane. Hecî Qadirê Koyî, Nalî, Kurdî, Şêx Riza Telebanî bi zaravaya soranî nivîsîne. Ehmedê Textî, Şêx Mistefayê Beseranî (1641-1702), Xanay Qubadî (1700-1759), Feqî Qadirî Hemewend, Mewlana Xalid (1777-1826) jî, bi goranî berhem dane. Mele Hunij û Ehmedê Xasî jî bi zazakî nivîsîne. Em dikarin ve navnîşê jî pir bikin.⁴⁰

Nehcul Enam, berhema Mele Xelîlê Sêrtî(sedsala 18'an) ye. Şêx Evdirehmanê Axtepî, bi navên Dîwana Rûhî û Rewdneîm du berhemên xwe kurdî ne. Mela Zahirê Tendûrekî, Seyîd Eliye Findikî, Mela Nezîrê Bedewî, Mela Beşîrê Bedewî, Mela Ebdulfettah Hezroyî, Mela Zahirê Tendûrekî, Şêx Muhammed Hadiyê Qewmanî, Mela Mihemedê Liceyî helbestvanên dema wêjeya klasîk a kurdî ya dawî ne. Wan jî dîwanên xwe hene.

Pertew Begê Hekarî, Selîm Silêman, Xaris Bêdlîsî û Elî Teremaxî jî bi kurdî nivîsandine û bi berhemên xwe zimanên kurdî dewlemend kirine.

Qanadê Kurdo, li ser nûnerên wêjeya klasîk ya kurdî û li ser dîroka wêjeya kurdî wiha dibêje:

"Sala 1980an li Bexdayê kitêbeke mezin ya zanyarê kurd Sadiq Behadin Amedî çap bûye. Navê wê kitêbê 'Hozanê Kurdî' ye. Evkitêbeke baş e û gelek bi nirxe, bi zaravayê Behdînanî,herfên erebî li ser şanzde şairên kurd hatîye nivîsandinê. Têda jîngarîya wan û nimûnên şêrên wan çap bûne. Xên jî şairên bi navdar û 'eyan Elî Herîrî, Feqê Teyran, Meleyê Cizirî, Ehmedê Xanî, Pertewê Hekarî ye. Sadiq Behadin Amedî nav û nişanên jîngarî û nimûneyên şêrên di kitêba xwe de navê donzde şairên nehîya Behdînanê nivîsîne. Navê wan evin: Mele Mensûr (1417-1490), Xalîd Axa Zehar (905-974). Mela Husêyn Batêy (ji Hekariye, 1417-

³⁹Zinar, Zeynel Abidîn, *Di Çanda Kurdî de 37 Şaxên Zanistiyê*, r.170.

⁴⁰Demir, M. Emin, h.b., r.1.

1475), Bekir Beg Erzî(1867 hatîye dinyayê) , Şêx Nuredîn Brîvkanî(1791 hatîye dinyayê) , Şêx Tahayê Mayî(1844 hatîye dinyayê), Huseyn Bamernî (1868 hatîye dinyayê), Şêx Xeyatêdîn Neqşbendî(1890-1944) Mela Enver Mayî (1913 hatîye dinyayê), Taha Goş (1918 hatîye dinyayê), Ehmed Enver Neqşbendî(1891 hatîye diyaye),Taha Ruşdî (1912 hatîye dinyayê).⁴¹

Di nav nivîskarê wêjeya klasîk ya kurdî de tenê mêr tune ne. Her çiqas ku kêr bin in jî, lê helbestvanên jin jî hene. Helbestvanên Jin yên Kurd jî bi berhemên xwe ziman û wêjeya kurdî dewlemend kirine.

Mah Şeref Erdelanî (Mestûre Xanim) (1800-1847), Sirre Xanima Amedî (1814-1865) û Mîhrîbana Berwarî (1814-1865) berhemên xwe yên bi kurdî gihîştine roja me ye.⁴²

Me di vê xebatê de ji helbestvanên wêjeya klasîk a kurdî hineka hîlbijartin û di hin helbestên wan de em li ser bandora tesewûfê rawestiyan. Em ê niha li jêr li ser ew helbestvanên ku ji terefê me hatine hîlbijartin bi kurtasî di derheqê wan de behs bikin.

⁴¹Kurdo, h.b., r.9.

⁴²Demir, M. Emin, h.b., r.1.

1.3. HIN HELBESTVANÊN WÊJEYA KLASÎK A KURDÎ

1.3.a. Melayê Cizîrî (1407 – 1481)

Melayê Cizîrî, di nav helbestvanên wêjeya klasîk ya kurdî de helbestvanê herî navdar e. Navê wî yê rast, Ehmed e. Di helbestên xwe de bi piranî mahlasa “Nîşanî” bi kar tîne.

Di sala 1407an de ji dayik bûye. Mamosteyê wî yê pêşîn, bavê wî ye. Dû re li gelek deverên welêt, wekî Amed, Hekarî û Hesenkêf xwendina xwe dewam kirîye. Îcaza meletîyê li Amedê ji Mela Tahayî wergirtiye. Demek dirêj li gundê Serba yê Amedê û li Medreseya Sor melatî û seydatî kiriye.

Dîwaneke wî heye. Dîwana wî, di wêjeya kurdî de yek berhemek sereke ye. Dîwana Melayê Cizîrî de bi giştî 140 helbest hene. Di dîwana Melayê Cizîrî ya bi navê “Çapa Cizîrê” de 114 helbest hene. Ji van helbestan teqriben 80 xezel, 13 qesîde, 12 murebba, 1 muxemmes, 1 texmîs, 1 mustezad, 2 muesser, 27 bend muselsel in, ku ew ji tercîfî bend û terkîbî bend, 16 çarîn û 2 yekane û 2 daneberhev tê de ne.⁴³

Di wêjeya klasîk a kurdî de, dîwana Melayê Ciziri, berhemeke giranbiha ye, bijarte ye. Ev berhema kurdî, ji bo wêjeya tesewufê nimûneyeke baş e. Mele di dîwana xwe de biwêjên tesewûfê bi hunereke baş kar anîne.

“Ji dîwana Melayê Cizîrî jî tê fêmkirin ku wî perwerdeyî li ser tefsîr, hedîs, kelam, tesewûf û zanînen klasîk yê Îslamî û pêşiya Îslamê dîtiye. Farisî, Erebî û Tirkî baş zane. Lê dîsa jî wî beravejî gelek helbestvan û zanayên esil kurd, ku bi zimanekî biyanî nivîsîne, melayê Cizîrî bi kurdî nivîsiye. Mela, xwestiye ku milletê xwe wekî milletên yê derûdorên xwedîpirtûk û bi xwendin be. Xwestiye ku eşqa îlahî di nav gelê xwe de belav bibe. Lewra helbestên wî bi piranî tesewûfî ne. Kesên ku dîwana Melayê Cizîrî bixwînin, dibînin ku bi rastî jî ew yek ji wan melayên Kurdistanê yê mezin e. Bi ser de jî xwediyê gelek zanistên din e, dinyadîtî ye. Xebera wî ji zanayên dinyayê yê dema wî û beriya wî hebûye. Tarîxê dizane, civatê nas dike, hekîm e, arif û ‘ellame ye.”⁴⁴

Melayê Cizîrî di helbestên xwe de wêjevanekî pir mahir e. Ew mirovekî mitesewif e. Ehlê xwenasbûnê ye. Helbestên wî bi piranî li ser eşq û evîna Xwedê Teala ye.

⁴³Dîlovan (Amd.), Selman, *Dîwan, Melayê Cizîrî*, Weş. Nûbihar, Stenbol 2010, r.11.

⁴⁴Dîlovan, h.b., r.9.

Hin helbestên wî, yên ku rasterast li ser jiyana xelkê, li ser evînê ne, bi kurmanciyê zelal û vekiri hatine nivisandin. Fêmkirina wan gelekî hêsan e. Melayê Cizirî, helbestvanekî oldar e û di wêjeya tesewûfê de zana bûye. Zanîna wî li ser wêjeyê, felsefê, dirokê û hwd. gelekî hebûye. Bi mijarên dîrokî û felsefî, ew zanebûna wî di helbestên wî de xuya dike.⁴⁵

1.3.b. Mela Huseynê Bateyî (1417-1491)

Melayê Bateyî, di nav helbestvanên kurd de bi Mewlûda kurdî navdar e. Mewlûda xwe bi zimanekî sivik û şêrîn bi kar anîye.

Li Colêmergê li gundê Batê hatiye dinyaye. Navekî wî jî Ehmed e. Ji malbateka oldar hatiye dinyayê. Bavê wî Mistefa, bi softiyê navnas bûye. Mela Huseyn Bateyî pêşî li cem birayê xwe Mela Ehmed, dest bi xwendinê kiriye. Paşê li medreseya Mîr Zeynel Begê Hekarîyê xwendina xwe dewam kiriye. Wî jî, ji zarokên xwe re jî dersdarî kiriye. Bateyî erebî û farisî baş hîn bûye, tirkî jî zanibûye.⁴⁶

Dîwaneke wî heye. Pirtûkeke wî ya bi navê “Zembilfroş” jî heye û gelek jî navdar e. Berhema wî ya herî navdar Mewlûda Kurmancî ye. Silêman Çelebî di wêjeya klasîkên tirkî yên sedsala 15an de berhema Mewlûdê derxistiye. Nêzikî sed salî pişt re jî, Melayê Bateyî rêya wî domandiye û berhema xwe ya Mewlûdê ava kiriye. Di helbestên xwe de bi nasnavê “Bateyî, Batê Hekkarî” bi kar anîye.

“Mela Huseyn Bateyî, mirovekî oldar, xwedêtirs û zanyar bûye. Ji helbestên wî baş diyar dibe ku ew zanayekî dema xwe bûye. Her wisa mirovekî bi bizav û mîrxas bûye. Her wekî di serpêhatiyên li ser wî de hatine gotinê peywendiyê wî ya payebilind bi mîran re bûye. Lê ew ne pêvenûskekê koçka mîran bûye. Ew alimek, zanyarek û aqildarekî dîwana mîran bûye... Em vê yekê ji helbestên wî dizanin... Zimanê Melayê Bateyî pir xweş û asan e. Di helbestên wî de zimanekî zelal hatiye bikaranîn. Wekî helbesta ‘Ji çiriya paşî û pê da’ bi sedsalan e ku di nava xelkê me de hatiye belevkirin û hertim têne gotin. Em di helbestên wî de dibînin ku çî zimanekî xweş û şêrîn heye.”⁴⁷

Mela Huseyn jî wekî zanayên din yên kurd, biwêjên tesewûfê di helbestên xwe de bi cih kiriye. Mewlûda wî, helbest û qesîde û medhiyeyên wî gelek bandor li ser xwendevan û zanayên xwe dihêle. Di dema me de jî, hemû xelk li ber mewlûda

⁴⁵Kaya, Zeynelabidin(Wer.), *Dîwan, Melayê Cizîrî*, Weşanên Roja Nû, Stockholm 1987, r.20.

⁴⁶Sadinî, M. Xalid, *Mela Huseynê Bateyî*, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2010, r.19.

⁴⁷Sadinî, *Mela Huseynê Bateyî*, b.n.,r.35.

wî dawetiyân didin û di xêr û şerên xwe de vê berhemê didin xwendin. Di medreseyan kurdan de jî, berhemên wî nimûneyên pir baş in.

1.3.c. Feqiyê Teyran (1560-1650)

Navê wî yê rast Mihemed e. Li Miksa Hekariyê di sedsala 14an de jiyaye. Ev jî di nav helbestvanên kurd de gelek navdar e.

Di sala 1560an de ji dayik bûye. Li Miksê, Hîzan û Finikê jî xwendina xwe dewam kiriye. Di medreseyan li wan herêman de gelek maye. Feqiyê Teyran, heta çûye ber dilovaniya Xwedê, li Miksê û li gundê Werezozê maye. Niha jî gelek ji xelkê me, ji bo ziyareta meqbera wî diçin Werezozê.⁴⁸

Abdurrehman Durre di berhema "Evîna Welat" de ji bo jiyana Feqiyê Teyran wiha gotiye: 'Feqiyê Teyran di navbera salên 1590 û 1660 de jiyaye.'⁴⁹

Zimanê kurdî, di helbestên Feqiyê Teyran de bi her dewlemendîya xwe eşkere bûye. Zimanekî pir hêsan û zelal bi kar anîye. Di helbestên xwe de li ser mijarên dîrokî û jiyana civakî rawestiyaye. Tesewûf, şîretên olî, wehdetîl wicûd, bawerî, ji Xwedê Teala re îbadet kirin û pesnê Hezretî Pêxember jî, mijarên ku di helbestên wî de bi giranî cih girtine.

Feqiyê Teyran gelek li Cizîra Botan jî ma ye û li wir xwendiyê. Ew hemdemê Melayê Cizîrî ye. Hin dibêjin ku Feqiyê Teyran şagirtê Melayê Cizîrî bûye û li ber destên wî xwendiyê.⁵⁰

Mehmed Uzun di berhema xwe 'Destpêka Edebîyata Kurdî' de wiha gotiye: '*Feqiyê Teyran şagirdê Melayê Cizîrî bû û dabû ser rêya wî. Li gor uslûba wî şairiya xwe pêş de biriye.*'⁵¹

Feqiyê Teyran di nav nivîskarên kurd de sereke ye. Di dîroka wêjeya kurdî de cihekî bêhempa girtiye. Wekî hemû helbestvanên kurd yê klasîk, zanayekî Îslamê ye û di nav jîyaneke olî de mezin bûye.

Berhemên Feqiyê Teyran di pirtukekê de hatine civandin. "Şêxê Senan", berhema wî ya herî navdar e. Berhemeke wî ya din a navdar jî "Bersîsê Abid" e. "Qewlê Hespê Reş û Kela Dimdim"ê jî berhemên wî yê din in.

⁴⁸Sadinî, M. Xalid, *Feqiyê Teyran*, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2011, r.54.

⁴⁹Durre, Abdurrehman, *Evîna Welat*, Weş, Melsa, Stenbol 1992, r.27.

⁵⁰Sadinî, *Feqiyê Teyran*, b.n.,r.40.

⁵¹Uzun, Mehmed, *Destpêka Edebîyata Kurdî*, Weşanên Beybûn, Ankara 1992, r.11.

1.3.ç. Ehmedê Xanî (1650-1706)

Ehmedê Xanî, di nav helbestvanên kurd de bi Mem û Zîn a xwe yê herî navdar e. Çîroka Mem û Zînê di nav hemû gel de belav bûye.

Li bajarê Bazîdê, di sala 1650an de hatîye dinyayê. Ehmedê Xanî, Kurê Îlyas e. Îlyas kurê Rostem Begê ye. Rostem Beg, ji eşîra "Xanî" ye. Bavê wî yê rehmetî, ji herêma Hekkarî yê bi koçberî hatîye Bazîdê, li wir bi cih bûye. Xanî, di sala 1706an li wir wefat kirîye. Merzeîê wî yê pîroz li rojhilata qeleya Îshaq Paşa, li Bazîda xirabe, zîyaretgaha xelkê ye.⁵²

*"Devkî wiha rîwayet dikin, dibêjin, ku Xanî, ji medresa Mûradîyye ya Bazîdê, dest bi xwendinê kirîye, ji boyî temamkirina xwendina xwe, çûye Exlat û Bidlîs û Êrfa (Rûha) û Cizîra Botan, çûye Sûrîya û Misrê û Stenbolê jî, piştî temamkirina tehsîla xwe ziviriye Bazîdê, li wê derê ders daye û dest bi nivîskarîyê kirîye."*⁵³

Xanî bi "Mem û Zîn" a xwe ya ku destana neteweyên kurd e, di dilê neteweyên kurd de cihekî bilind girtîye. Bi vî awayî di nav gelê xwe de ew bûye "Xanîyê Nemir".

Cizîra Botan ji ber ku di nav paytextên mîrên kurdan de bajarê herî girîng bû, bala gelek helbestvanên deverên din jî kişandiye ser xwe û mêvandariya gelek kesên kurdî kiriye. Di nav wan kesan de yê herî navdar bêguman Ehmedê Xanî ye.

Xanî herçend helbestvanê mîrekiya Bazîdê be jî, berhema xwe ya navdar Mem û Zîn li ser çîrok û efsaneyên devera Botan nivîsiye û navenda bûyera berhema wî ya navdar jî Cizîra Botan e. Ji bo xwendina zanistiyê çûye Xelat û Bedlîs, Cizîr, Riha, Şam, Heleb û Bexdadê. Li Misir, Îran û Stenbolê jî geriyaye. Nemaze li medreseyan Mezopotamya, Suriye û Îranê hînî felsefa Yewnan a kevnare, tesewûf, asîmanzanî, helbest û teknîka hunerî bûye. Piştî xwendina 'ilimê, dîsa vegeriyaye Bazîdê û ji bo xwendina zarokê kurdan medrese ava kiriye. Di van medreseyan de ders daye wan.⁵⁴

Jiyana wî li medreseyan di nava perwerdehiyê de derbas bûye. Ehmedê Xanî ji bilî zimanê kurdî, bi erebî, tirkî û farisî jî dizanibû. Ilmê fen û olî xwendiyê û

⁵²Durre, Abdurrahman, *Şerha Dîwana Ehmedê Xanî Felsefe û Jiyana Wî*, Weşanên Avesta, Stenbol 2002, r.10.

⁵³Durre, h.b., r.11.

⁵⁴Ergün, Zülküf, *Di Peydabûna Edebiyata Kurdî ya Li Cizîra Botan De Karîgeriya Bajarvaniyê*, t.ç., Mêrdîn 2012, r. 6.

gelekî bi pêş ve çûye. Zarokên kurdan di medreseya Xanî de, ilmê olî û wekî wêje, felsefe, asîmanzanî ilmê zanistîyê jî, ji Xanî tehsîl kirine.

"Ehmedê Xanî zanyarekî welatparêz û gelparêz bûye. Ji bo ku gelê Kurd bi pêş keve, serbilind be û serxwebûna xwe bi dest bixe, xebat û têkoşîneke mezin kiriye. Gengeşî û pirsgirêkên civaka kurdên wî heyamî, ji hêla wî ve hatine dahûrîn. Li ser bindestî, bê tifaqî û neyartiya di navbera Kurdan de, fikr û ramanên xwe di berhemên xwe de anîne zimên."⁵⁵

Berhema wî ya herî navdar "Mem û Zîn" e. Berhemên din, Eqîda Îmanê û Nûbihara Biçûkan e. Mem û Zîn, wekî çîroka Leyla Mecnûn ku di nav tirk û ereban de navdar, ew jî şahesera kurdan e.

*"Ji bilî xemxwariya Xanî ya ji bo kurdî û kurdan, hema bêje di dawiya her beşên Mem û Zînê de, sentezên tesewûfî, felsefî û eqîdeyî ji me re pêşkêş dike û bi zimanekî hîkmetane pend û şîretan li me dike. Eger em bi kûrebînî li vê kitêba şaheser a wî binêrin, em ê bibînin ku hemû mînak û mîsalên ku wî anîne, pend û şîret û hîkmet in."*⁵⁶

1.3.d. Pertew Begê Hekarî (1756-1834)

Pertew Begê Hekarî, di nav helbestvanên wêjeya klasîk a kurdî de yê ku mîrektî kiriye û bi vê mirektîya Hekarîyê navdar bûye.

Di sala 1756an de li bajarê Hekariyê hatiye dinyayê. Zarokatiya xwe li Hekariyê derbas kiriye. Pêşî Quran xwendiyê û di Medresa Humayûn de, xwendina xwe qedandiye. Gelek helbest bi kar anîye û li Hekarîyê mîrektî jî kiriye. Di nav gel de 'Pertewî, Pertew Beg, Pertew Begê Hekarî tê nasin. Lê di hinek belge û deveran de, ev zat, bi navê "Şah Pertew", "Şah Perto", "Şah Pertewê Hekarî" û "Şah Pertewê Hekarî Ebas" jî tê bi karanîn.⁵⁷

Berhema Pertew Begê Hekarî 'Dîwan' e. Dîwanên helbestvanên wêjeya klasîk bi piranî bi helbestên duyînî, bi risteyan pêk ten. Di dîwana Pertew Beg de, helbestên duyînî, çarînî, pêncînî heta şeşînî jî hene. Pertew Beg, di dîwana xwe de, bi mexlesên Perto, Pertew û Pertewî bi kar anîye.

⁵⁵Demir, h.b., r.2.

⁵⁶Şemrexî, Huseyn (Amd.), *Mem û Zîn, Ehmedê Xanî*, Weş. Nûbihar, Stenbol 2010, r.9.

⁵⁷Bateyî, Qahir, *Pertew Begê Hekarî*, yuksekovahaber.com/author_article_detail.php?id=713&uniq_id=1193684575, 21 Cotmeh 2007.

Pertew Begê Hekarî, mirovekî sofî ye. Ew sofftîyê wî, di gelek helbestên wî de xuya dike. Evîn û evîndari di helbestên wî de gelek cih digre.

"Pertew Begê Hekarî di dîwana xwe de gelek awa û kêşeyên helbesta klasîk bi naverokeke edebî û estetîk ve bi kar anîye. Lê di helbestkariya xwe de belkî taybetiya herî mezin ew e ku wî (wekî gelek şairên din) bo xwe wekî ustad Melayê Cizîrî dîtîye û li ser usûla wî helbesta xwe honandiye... Li gor hin çarçoveya edebiyata klasîk Perto mezmûn û sembol û îmajên serkeftî di dîwana xwe de bi hostayî bikaranîye. Bi vî awayî Pertew Beg di nava edebiyata kurdî de xwe digihîne astek bilind. Ligel wê belkî tiştê herî eşkere ew e ku Pertew Beg di dîwana xwe de zêdetir behsa Hezretî Mihemed dike û ji ber ku navek wî jî wekî yê Pêxember "Mistefa" ye, bi teşbîh û telmîhan ve vî navî bi hostayî bi kar tîne."⁵⁸

1.3.e. Mela Xelîlê Sêrtî (1753-1843)

Mela Xelîlê Sêrtî mitesewif e, alim e. Li medresan ders daye, melatî kiriye. Ew di nav mitesewif û nivîskarên kurd yên dema xwe de bi navûdeng bûye.

Mela Xelîlê Sêrtî, li gundê Gulpîka Hîzanê, navçeya Bedlîsê di sala 1753an de hatiye dinyayê. Ozan û nivîskarên kurdên bi navûdeng Mele Xelîlê Sêrtî esl û azbata xwe ji Hîzanê ye. Navê bavê wî, Mele Hesen e. Dersên pêşî ji bavê xwe dîtîye. Li Bedlîs, Miks, Hîzan, Xoşab, Cizîr û Imadiyê di medreseyan kurdan de xwendîye û icazeta xwe ya ilmê ji cem Mela Mehmûdê Behdînî standîye. Mela Xelîl pişt re veqeriyaye Hîzanê û di medreseya Meyadanê de ders daye şagirdan. Pişt re çûye Sêrtê û li navenda Sêrtê bi cih bûye. Mele Xelîl ji xwendinê pir hez dikir. Hem seydatî dikir hem jî ji seydayên mezin fêr dibû. Di tesewwûfê de gihîşt kemalê. Bûye muftiyê wê demê. Li gor rîwayetan gelek keramet nîşan daye. Di sala 1843yan de jî, li Sêrtê çûye ser dilovaniya Xwedê.⁵⁹

*"Mela Xelîlê Sêrtî derbarê ilmên wekî Serf, Nehw, Belaxet, Mentîq, Munazere, Cedel, Wed', Eqâid-Kelam, Hedîs, Fiqh, Tefsîr, Tecwîd, Tesewwuf, Mewlûd û Şemalê de ji 25an bêhtir berhem li dîw xwe hiştine."*⁶⁰

Mexlesa wî di helbestan de "Şewqî" ye. Mele Xelîlê Sêrtî, 24 pirtûk nivîsîne. Heşt ji van berhema bi kurdî ne. Piraniya wan bi zimanê erebî ne û mijarên wan jî

⁵⁸Doskî, Tehsîn Îbrahîm (Amd.), *Dîwan, Perto Begê Hekarî*, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2011, r.26-28.

⁵⁹Yavuz, Kemal, *Mele Xelîlê Sêrtî*, <http://siirttenote.com/yedek/arsiv/siirtte-dair/siirtliuenlueler/2397-mela-xelile-serti-1753-1841.html>, 13 Sibata 2011.

⁶⁰Adak, Abdurrahman, *Mela Xelîlê Sêrtî*, Mukaddîme, Weş. Zaningeha Artukluyê, j.1, 2010, r.147.

dînî ne. Ji berhemên Mele Xelîl tenê "Nehcul Enam" çap bûye, di destên me de heye. Ev berhema bi kurmancîyeke baş û bi helbestkî hatiye nivîsandin.

*"Nehcul Enam li Kurdistanê baş hatiye naskirin û zarokên kurd vê eserê dixwînin û jiber dîkin û li her cihê jê jêderkan digrin."*⁶¹

Helbesta Mela Xelîlê Sêrtî ya yekemîn, bi şeklê mesnewîyê hatiye nivîsandin. Ji 19 risteyan pêk hatiye. Medhîyeyek e ku di vê medhîyê de medhê şêxê xwe Şêx Ehmed Reşîdî kiriye. Helbesta duyemîn 27 risteyan pêk hatiye. Nesîhetnameyek e, li vir di derheqê nefîsê de nesîhet dike. Helbesta sêyemîn ji 22 risteyan pêk hatiye. Munacat e, gazî û daxwazîji bo Xwedê kiriye. Helbesta çaremîn jî 13 bendan pêk hatiye. Tê de medhêşêxê xwe Şêx Ehmed Reşîdî kiriye.⁶²

1.3.f. Mela Mihemedê Liceyî (1860-1912)

Di helbestên xwe de bi nasnavê Hadî bi kar anîye. Ji wê sedemê ji dîwana wî re 'Dîwana Hadî' tê gotin.

Navê wî ye rastî Mihemed e. Kurê Sibxetullahê kurê Resul Paşayê Rewandîzî ye. Resûl Paşa jî wekî tete zanîn, birayê Mîrê Soran Mihemed Paşa ye. Ew jî nasnavê Mîrê Kerê tete nasin. Dîroka ji dayîka xwe bûn bi tamamî, ne eşkere ye. Lê gor lêkolînan meriv dikare bêje ku, ew di sala 1860an de ji dayîka xwe bûye. Di sala 1912yan de jî çûye ser rehma Xwedê.⁶³

*"Seydayê Liceyî di zanînên şer'î de pêşkeftî bû û îcaza melatîyê jî standbû. Her çende wî nasnavê xwe di şê're de kiribû 'Hadî' jî belê ew di nav xelkê deverê hemûyê bi nasnavê 'Seyda' dihate nasîn. Ew di sofîtiyê de seyda ji dûkeftiyên rêbaza Neqşebendî bû wêk ji xelîfên Şêx Ebdulqadirê Hezanî bû û ji ber ku Şêxê Hezanî kartêkirineka mezin li ser seydayê Liceyî hebû wekî ji dîwana wî diyar dibe."*⁶⁴

Berhema wî ya mezin dîwane. Li ser îlmê tecwîdê jî pirtukeke xwe piçûk heye. Di dîwana xwe de bi çar zimanan helbestên xwe gotine. Bi tirkî, erebî, farisî û kurdî. Mele, ji wan zimanan de hîn pir bi zimanê kurdî û taybetî jî bi zaraveya kurmancî helbestên xwe nivîsandiye.

⁶¹Kaya, Zeynelabidîn(Werger), *Nehcul Enam, Mele Xelîlê Sêrtî*, Weşanxana Kurdistan, Stockholm 1988, r.6.

⁶² Adak, h.b., r.152.

⁶³Doskî, Tehsîn Îbrahîm (Amd.), *Dîwana Hadî, Mela Mihemedê Liceyî*, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2012, r. 14-17.

⁶⁴Doskî, h.b., r.18.

“Mela Mihemed Cemil Seyda neviyê Seydayê Liceyî eşkere dike ku bapîrê wî Mela Mihemedê Liceyî jimareke nivîsîn û berhemên cuda cuda di babetên dînî de hebûn. Piştî serhildana Şêx Seîd di sala 1925 ev nivîsîn jî wekî gelek berhemên din ên zanayên kurd hatine sotin û bi tenê du berhemên wî parastî ew jî: Kitêbeke biçûk bi zimanê kurdî li dor ilmê tecwîdî û Dîwan.”⁶⁵

Mela Mihemedê Liceyî, sedema ku xelîfeyî Şêx Ebdulqadirê Hezanî bû, şêxê rêbaza Neqşebendî bû, wî jî wekî helbestvanên wêjeya klasik yên kurd biwêjên tesewûfê di helbestên xwe de bi kar anîye.

1.3.g. Şêx Mihemed Hadîyê Qewmanî (1884-1956)

Şêx Muhammed Hadî, li gundê Sîsê yê li Licêya Amedê ji dayika xwe bûye. Di şeş salî de nexweşiyek li peyda dibe û çavên wî kor dibin. Ew, her tim li rêya îlmê ye. Di demê xwe de tengayî heye jî, ew her tim perwerdeya îlmê dewam dike. Sifte ji bavê xwe Şêx Mistefa ilmê dibîne û xelîfetiye ji bavê xwe digre.⁶⁶

Li medresa Qewmanê de nêzikî bîst salan ders dîtîye û her îlm xwendîye. Li gundê Qewmanî çûye ser dilovanîya Xwedê.

“Şêx Mihemed Hadî, li cem bavê xwe ‘emelê tesewûfî kiriye û bi terbiya wî ya manewî mezin bûye. Çawa ku li cem wî perwerdahiya îlmê girtiye her wiha dersên tesewûfê jî, li dergaha bavê xwe dîtîye û berdewam kiriye. Ji ber ku Şêx Mihemed Hadî, mirovekî qenc û bi cehd û xîret bû, bavê wî jî gelekî pê re eleqedar bûye û ew pêşve çûye... Ji hêla aliman leqeba ‘Hafiz’ul-îlm’ jî hatiye nasîn. Di warê îlmî de, belkî di warê edebî de jî gelekî serkeftî bû, her wekî ku ji helbestên wî tê zanîn.”⁶⁷

Di dîwana Hadî de bi piranî qesîde hene. Di van qesîdeyan de mijar, Xwedê Teala û Hezretî Pêxember û merivê wê wextê pêşta ne. Mele di wan qesîdan de Xwedê Teala dipesine û li ser jiyana Hezretî Pêxember û li ser şêxê xwe rawestiyaye.

Şêx Mihemed Hadî, bi şeklê wêjeya klasik û bi peyv û sembolên tesewûfê helbestên xwe nivîsandiye. Berhema wî ya gihîştî roja me û çap bûyî dîwana wî ye.

⁶⁵Doskî, h.b., r.21.

⁶⁶Seydaoğlu, Muhammed(Amd.), *Dîwan, Şêx Muhammed Hadîyê Qewmanî*, Weş. Nûbihar, Stenbol, 2011, r.24.

⁶⁷Seydaoğlu, h.b., r.24-25.

1.3.h. Seyîd Elîyê Findikî (1890-1967)

Li Sêrtê, Findika Botan hatiye dinyaye. Kurê Seyîd Suleymanê kurê Seyid Îbrahîm e. Malbata wan bi rêya şêx Evdilkadirê Geylanî digihîje Îmamê Hesên. Zarokatiya xwe li Findikê derbas kiriye. Ders ji feqîyan dîtiye û ji Seyîd Evdirahman îcazet sitandiye. Paşê li gundê xwe melati kiriye. Seyîd Elî di sala 1967an de li Cizîrê wefat kiriye.⁶⁸

Seyîd Elî, li medresan ders daye. Ew çawa ku alîmekî mezin e, ewqas jî helbestvanekî serkeftî ye. Qesîdeyên wî bi biwêjên tesewûfe pêk tên. Bi piranî qesîdên wî şîret in. Ew qesîdeyên wî gelekî bi qîmet in.

Dîwana wî heye. Di dîwanê de zimanê wî hemû kes fêhm dike, ji wê sedemê dîwana wî di nav gel de pir hatiye xwendin.

Li ser tefsîr, fiqih, îtîqad, sîyer û eqîdê berhemên Seyîd Elîyê Findikî hene. Yek berhema wî jî li ser dîwana Melayê Cizîrî ye. Lê ew berhemên wî çap nebûne. Di nav berhemên wî de bi tenê dîwana wî çap bûye.

1.3.i. Mela Nezîrê Bedewî (1933-1982)

Li gundê Ezîmê ku li der û dora Kerboranê ye hatiye dinyayê. Navê bavê wî Şêx Mihemed Zahir e. Di malbata wî de faqî û şêx pir bûn. Kalê wî jî Şêx Mistefayê Bedewî bû. Di zarokatiya xwe de dest bi medresê kiriye û îcaza xwe ji Şêx Îbrahîm Heqî girtiye. Di sala 1982yan de li gundê Sêgiranê çûye ser dilovaniya Xwedê.⁶⁹

Mela Nezîrê Bedewî, erebî û tirkî jî dizanibû û bi her sê zimanan jî helbestên xwe nivîsandin. Dîwana xwe bi zimanên kurmancî û erebî nivîsandiye.

Li ser helbestên wî agahî kêmtir in. Di helbestê xwe de bi piranî, bi nasnavê 'Dahî' nivîsandiye. Mexlesên 'Torî, Feqîr û Nezîr' jî bi kar anîye.

Di dîwana wî de 129 helbest hene. Ji wan 129 helbestan yek bi tirkî ye. Ji bilî dîwana kurdî dîwaneke Mela Nezîrê Bedewî ya bi zimanê erebî jî heye.

⁶⁸Dîlovan, Selman(Amd.) *Dîwan, Seyîd Elîyê Findikî*, Weş. Nûbihar, Stenbol, 2011, r.7.

⁶⁹Doskî, Tehsîn Îbrahîm(Amd.), *Dîwana Dahî, Mela Nezîrê Bedewî*, Weş. Nûbihar, Stenbol 2012, r.17.

2. BEŞA DUYEMÎN

2. DI HELBESTAN DE SEMBOLÊN TESEWÛFÊ

2.1. BIWÊJÊN TESEWÛFÊ YÊN DI DÎWANÊN KURDÎ DE

2.1.a. Bekabîllah / Beka

Dinya demborî ye, hemû hebûn heta saet û wexte xwe temam dibe li ser erdê ne. Ku wext temam dibe, ew hebûnan li holê radibin. Lê yê berdewam hebe Xwedê ye. Ango Xwedê baqî ye. Beka, ji sifetê Xwedê "Baqî" te.

Mirov, ku ji sifetên fanî dûr dibe û bi sifetên Xwedê xwe dixemilîne, baqî dibe û bi vê rewşê re bekaîllah te gotin. Bi Xwedê re baqî bûn, bekaîllah e.⁷⁰

Di helbestên **Melayê Cizîrî** de sembola bekaîllah û beka:

Allah ji nûra sermedî yek qetreyek da Ehmedî
Şîrînî û remzek we dî medhûşî ma hetta ebed⁷¹

Xwedê ji nûra ezêlî qetreyek da Mele. Mele di vê qetreyê nûr de nîşanek bedew dît û heta ebed xwe bi vê nîşanê ve girt. Tecelîya nûra Xwedê, Mele heta ebed baqî kir. Bi nûra Xwedê re baqî bûn bekaîllah e. Mele jî gihîştîye mertebeya bekaîllah û bi Xwedê re yek bûye.

Herfên reqemê lewhê wucûda min bixwan
Da qenci bibînî ku çi îmla yim ez⁷²

Tu binêre li afîrandin û hebûna min, hingê te bibînî ku hebûna min çiqas baş e. Di nav nivîs û di nav herfan de, îmla pir muhîm e. Îmla nebe hevok watedar nabin. Ez jî mîna vê îmlayê me. Çawa ku îmla nivîsê bi naverok û watedar dike, ez jî bi wî awayî hebûnê watedar dikim. Lewra ez tecelîya Xwedê Teala me. Xwedêyê baqî ye û ez jî bi Wî re baqî me.

Di helbesta **Mela Huseynê Bateyî** de sembolên bekaîllah û beka:

Ecel saqî bi dest min da

⁷⁰Uludağ, Süleyman, *Tasavvuf Terimleri Sözlüğü*, Marifet Yayınları, İstanbul 1990, r. 91-92

⁷¹Turan, h.b., r.720

⁷²Turan, h.b., r.740

Meya Baqî d'peyalê da
Ji wê rojê heta îro
Dilê min ma d'xeyalê da⁷³

Saqî di ecel de meyek baqî daye dest Mele. Dilê Mele ji wê rojê de heta îro her tim di vê xeyalê de ye. Meya baqî ku saqî dide dest Mele, eşqa Xwedê ye. Xwedê Baqî ye û Mele ji bi vê mey û xeyalan baqî bûye. Ew di mertebeya beqabîllah de ye. Bi Xwedê re vê yekbûnê ve baqî bûye.

Di helbesta **Ehmedê Xanî** de sembola beqabîllah û beka :

Fanî nebitin fenayê mûtleq
Nabînitin ew beqayê mûtleq
Fanîtî ji bo wî ra beqa ye
Baqîtî ji bo wî ra fenaye⁷⁴

Mebde û muntehayê de, ango ezel de heta ebed Ew heye. Ji Wî bêtir tu tişt tune ne; fanîbûyîn û baqîmayîn jî, yên Wî ne. Merivên ku li heqîqetê digerin heta ku fanîtiya xwe nebînin, fanîyê mutleq û bekayê mutleq Xwedê nas nakin. Fanîtiya Wî wesîla baqîtiya Wî ye, baqîmayîna Wî jî bi fanîbûyîna Wî ye. Ew merivên ku xwe û Xwedêyî xwe nas dikin û bi Xwedê re berdewam dibin, bi vê yekbûnê ve digihîjine mertebeya beqabîllah.

Di helbesta **Seyid Eliyê Findikî** de sembola beqabîllah û beka :

Lezzet ew e hubba Xudê
Her kî ku bigrê bernedê
Ew dê bighête meqsedê
Gava biçîtin wê dinê⁷⁵

Mirov li dinê fanî ye. Tehma her tiştên dinê jî wekî dinê fanî ne. Xwedê bi xwe baqî ye. Gor Seyid Elî jî lezzet û tehma herî mezin hub û hez kirina Xwedê ye. Heqê ku meriv her tim ji Xwedê hez bike, meqseda meriv Ew be. Li vê dine jî li wê

⁷³Doskî, *Mela Huseynê Bateyî*, b.n., r.155.

⁷⁴Durre, *Şerha Dîwana Ehmedê Xanî Felsefe û Jiyana Wî*, b.n., r.81.

⁷⁵Doskî, *Diwan, Seyid Eliyê Findikî*, b.n., r.77.

dinê jî, ango li axretê jî meqsed Xwedê be. Meqsed ne cennet û ne hûrî be, bi tenê rizaya Xwedê be. Ev bi Xwedê re bakîbûn bekaîllah e.

2.1.b. Bezma Elest

Bezma elest, bi meclîsa muhebet û sohbetê re tê gotin. Ew meclîs ya ku Xwedê bi ruhên insanen re gotiye, "Elestû bî Rebbîkum", ango "Ma ez Xwedêyê we nînim?" Ruhên insanen jî wiha gotiye, "Belê, Tu Xwedêyê me yî!" Ev bûyer ya ku Xwedê afirandinê mirovan li dinê hîn nekiribû, di navber Xwedê û ruhan de derbas bûye.⁷⁶

Bi vê bûyer û demê re, di tesewûfê de "qalûbela" jî te gotin. Hin helbestvan di helbestên xwe de vê sembola tesewûfê bi biwêja "qalûbela" pêk tînin.

Di helbestên **Melayê Cizîrî** de sembola bezma elest:

Min di ber qalûbela batin vi wê ra bû evîn
Hêj li ser 'ehda elest im ta bi roja axirîn⁷⁷

Mele, dibêje ku, eşqa îlahî ji ber qalûbela ve bi min re hebû. Ez ehda bezma elest re dilsoz im, heta roja qiyametê jî ez ê bi vî awayî bi me. Di bezma elest de Xwedê gotiye, ez ne Rebê we me û qûlan jî soz dane û gotine, belê. Mele, li vir eşqa xwe ewqas mezin dike ku dibêje li ber vê soz dayinê ez aşîqa Xwedê Teala bûm.

Min dî sehergaha "elest" camek ji kewser dost di dest
Jê da Melê lew maye mest hetta heyatê serxweş î⁷⁸

Berbanga roja bezma elest Mele, di dest yarê de, di qedehekê de şeraba eşqê dibîne. Yar ji vê şerabê hinê Mele vexwartin dide û Mele heta dawîyê jiyana xwe serxweş dibe. Eşqa îlahî di roja bezma elest de ketiye dilê Mele. Mele heta dawîyê jiyana xwe jî bi vê eşqê dijî.

Di helbesta **Ehmedê Xanî** de sembola bezma elest:

Em aşiq eger çî meyperestin
Emma ji meya "Elest"î mestin

⁷⁶Uludağ, h.b., r.99.

⁷⁷Turan, h.b., r.535.

⁷⁸Turan, h.b., r.706.

Ew mey ne wekî meya Te, tal e

Ew mey ji cemala zûl celal e

Ew hûbbê Hebîbê Pakî Zat e

Gerçî em aşîq in û herdem meyê eşqê vedixwin. Lê em ji vê meyê ne lê, em ji meya "Elest" de serxweş in. Ew meya pîroz e. Wekî cûrên meya dinê, ew meya ne tal e. Ew mey, ji Xwedê ye, meya eşq û muhebeta ezemeta Xwedê ye. Meclîsa bezma elest Xwedê bi rûhan ra gotîye, "Elestû bî rebbîkum", ruhan jî gotine, belê, tu Rebbê me yî. Ji vê bûyerên vir de Ehmedê Xanî, aşîqa Xwedê ye û bi vê eşqê mest bûye.

Di helbesta **Pertew Begê Hekarî** de sembola bezma elest:

Go hatîfî: 'Elest' ji rojê kerem nîda

Zerrat da cewab 'ne'em' yek bi yekî 'bela'

'Îşq afirand û kirye dilê 'aşîqan jar

Ser muhir ger bîna ji tena vê perdeya heya⁷⁹

Ristêya yekemîn de Pertew Beg, bûyera ezel de ku Xwedê ruhên qûlan afirandinê de pêk hatiyê eşkere dike. Dema ku Xwedê insan di alema ruhan de afirandiye, ji wan wiha pirsîye: 'Elestû bî Rebbîkum?' Ango, 'Ma ez ne Xwedêyê we me?' wan jî gotîye, belê, tu Rebbê me yî."

Risteya duyemîn de jî Pertew Beg afirandina eşqê diyar dike. Gor wî Xwedê eşq jî bi vê bûyerê ve afirandiye û di dilê mirovan de bi cih kiriye. Ku mirov jî Xwedê zanibin û hem jî bi eşqa Wî jiyane xwe berdewam bikin.

Di helbesta **Mela Mihemedê Liceyî** de sembola bezma elest:

Heçî erwahê 'elest' î

Hebû wan ulfet û mestî

Ku ketin 'alema hestî

Dikin ew dostî beraber⁸⁰

Gor Mele, di bezma elest vir de ruhên mirovan ji Xwedê hez dikin û ulfetên xwe, anga nêzikîyên xwe bi Xwedê re hene. Ew ruhên mirovan bi vê hez kirine mest

⁷⁹Doskî, *Dîwan, Perto Begê Hekkarî*, b.n., r.31.

⁸⁰Doskî, *Dîwana Hadî, Mela Mihemedê Liceyî*, b.n., r.107.

in. Bezma elest de ruha bi Xwedê re gotine, belê, Tu Rebbê me yî û ew ulfet diyar kirine. Dema ku mirov ketine alema hestî jî, ji Wî dostî dûr nebûne. Alema hestî ya ku Mele dibêje, dinyaya ku mirov bi can û cesed û hestî li dijîne.

2.1.c. Bihuşt

Merivên ku li rêya Xwedê diçin, Xwedê ji jiyana dinê şûn de, bihuştê ji wan re pêşkêş dike. Ew cihê rihat û kêfê ye. Helbestvan jî di helbestên xwe de vê armancê bi sembola bihuştê eşkere dikin. Dozex jî tam vajîyê bihuştê ye. Ew jî cihê ceza ye. Bihuşt hin helbestan de bi peyva cennet îfade dibe, dozex jî bi peyva cehnem bi kar te. Firdews ji di helbestan de bi cih dibe, ew jî mertebeyeke bihuştê ye.

Di helbesta **Ehmedê Xanî** de sembola bihuşt:

Ger di hîna ez wefat kim, bête ser min Ezraîl
Mujdeya xuldê bidet min hem di wê geh Cibraîl

Xidr û Îlyas hem bibîtin her ji bo min ra delîl
Dê bibêjim min nevêtin xuld u kewser Selsebîl⁸¹

Xanî, di van risteyan de rewşa xwe mirinê teswîr dike. Dibêje, dema ku ez bimirim, firişteyê ku ruhan distîne Ezraîl were ser min, firişteyê wehyê Cebraîl mizgînîya jîyana ebedîya bihuştê bide min, Xidr û Îlyas jî, ji çûna min ya bihuştê re bibin rêber, ez ê di wê demê dê dîsa bêjim, ez jiyana bihuştê ya ebedî naxwazim, ava Selsebîla Bihuştê jî naxwazim. Ez Xwedêyê xwe dixwazim. Ew, ku diçe bihuşte, bê wesleta yarê xwe, ku ew weslet eşqa Xwedê ye, tiştêkî din naxwaze. Xidr û Îlyas, navê du pêxemberên Xwedê ne, Îlyas di reşayê de, Xidr jî di deryayê de, hewarîya mirovan in.

Mitesewifê tirkî navdar Yunus Emre jî weki Xanî wiha dibêje,

Cennet Cennet dedikleri birkaç köşkle birkaç huri
İsteyene ver sen anı, bana seni gerek seni⁸²

⁸¹Durre, h.b., r.137.

⁸²Dilçin, Cem, *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara 1997, r.344.

Bihuştê ku di nav gel de tê gotin çî ye ku, ew çend qesr û çend hûrî ne. Xwedêyê min Tu wan bide yên ku dixwaze. Ez bi tenê Te dixazim. Daxwazê Yunus Emre jî wekî Xanî, eşq û riza ya Xwedê ye.

Di helbesta **Mele Xelîlê Sêrtî** de sembola bihuşt:

Heçî cennetî dê ji hewzê vexwin,
Hemî cehnemî her hemîmê vexwîn
...
Efûkî îlahî bi sidq û sefa
Bibî Cennetê tabî'ê Mistefa⁸³

Merivên ku ecelê xwe tên û dimirin, ji wan hin yên ku li rêya Xwedê ne û diçin cennetê, hin jî li rêya şeytan in û diçin cehnemê. Mele di ristêya yekemîn de bi biwêjên tesewûfê bihuşt û dozex, rewşê merivên ku diçin axrete eşkere dike. Risteya duyemîn de jî, ji Xwedê efû û bihuştê dixwaze. Daxwazeke xwe din jî heye ku ew jî, tabî'ê Hezretî Pêxember Mihemed Mistefa (s.x.l) bibe û bi wî re biçê bihuştê.

Di helbesta **Pertew Begê Hekarî** de sembola bihuşt:

Çûn can û sûret cismek in
Ma'şûq û aşiq îsmek in
Her yek mecazê îsmek in
Ew ibtidata û inteha

Gotin bi wê zulfa çu hey
Bi qewlê Xweda yê ferd û hey
Bûne ji qetîlanê te hey
Ba rizq û Fîrdewsê 'ela⁸⁴

Pertew Beg, di çarîna yekemîn de dibêje, can û sûret, aşiq û ma'şûq yek in û ew mecazî ne. Di dawî de ew yekitîya Xwedê ne. Li vir felsefa wehdetil wicûd jî eşkere dibe. Peyvên aşiq, ma'şûq û zulf biwêjên tesewûfê yên mecazî ne.

⁸³Kaya, *Nehc-ul Enam, Mele Xelîlê Sêrtî*, b.n., r.19-36.

⁸⁴Doskî, *Dîwan, Perto Begê Hekkarî*, b.n., r.93.

Di çarîna dûyemîn de jî dibêje, her tişt hemû heyîn bi qewlê Wî ne, rizqê mezin di Fîrdewsê de ye. Fîrdews mertebeyek bihuştê yê mezin e, wê sedemê Pertew Beg dibêje, Fîrdewsê 'ela, ango Fîrdewsê mezin.

Di helbesta **Seyid Eliyê Findikî** de sembola bihuşt:

Hezar hemd ji bo Xaliqê layenam
Ku em rahet in keyfxweş in bit-temam
...
Temam em bibin tabi'ê Mustefa
Biçin cennetê da bi sidq û sefa⁸⁵

Li dinê em rahet û kêfxweş in. Ji bo vê hezar hemd ji Xwedê re. Di vê risteya yekemîn de Seyid Elî, ji Xwedê re hemd û dia dike. Risteya duyemîn de jî mifte ya bihuştê dibêje. Ew mifte, sidk û tabi'ê Hezretî Pêxember Mihemed Mistefa (s.x.l) bûne. Bi biwêja bihuştê, li vir bandora tesewûfê li ser helbestvan diyar dibe.

2.1.ç. Cefa / Cewr / Derd

Cefa, cewr û derd biwêjên ku tekilîyê xwe bi hev re ne. Cefa, ezabê ku aşiq ji ber eşqê dibîne re tê gotin. Bê wefabûnê yarê jî, cefa ye. Cefa ezab e. Gor suffî ji rêya Xwedê û ji eşqa Xwedê dûr ketin cefa ye.

Cewr jî dîsa wekî cefayê ezab e, eza ye. Cewr, bi hêla manewî ve soffî ji bilindayîyê mehrûm kirin e. Derd jî, elem e, izdirab e. Ji Xwedê dûr bûn elem e, derd e. Nêzikî Wî bûn jî, ji derdan dûr ketine.

Derd, eşqa îlahî ye. Derdê herî mezin bê derd bûne. Mewlewî ku ji hev re dia dikin, dibêjên, "Xwedê derdê te zêde bike."⁸⁶

Di helbesta **Melaye Cizîrî** de sembola cewr û cefa:

Cewra te behîfîn we cefaya te perîfîn
Qurbanê te bim guh bide carek gilehê min⁸⁷

⁸⁵Doskî, *Diwan, Seyid Eliyê Findikî*, b.n., r.295-299.

⁸⁶Uludağ, h.b., r.140.

⁸⁷Turan, h.b., r.447.

Zilma dilberê Mele hilandiye, cefaya wê jî Mele hencirandiye. Mela deng lê dilbera xwe dike û dibêje, carek be jî, guh bide gilîyê min. Cewr û cefa biwêjên mecazî ne û eşqa Mele ya heqîqî diyar dikin. Ji ber eşqa îlahî Mele her tim di tade û cefayê de. Gilî dike, lê bersivê nabîne.

Di helbestên **Feqiyê Teyran** de sembola cefa û derd :

Serxeş û ebter kirim te
Ji îllet û reng zer kirim te
Sotim û kerker kirim te
Agir û biryan im ez⁸⁸

Feqiyê Teyran, ji bo eşqê serxeş e, xirab bûye. Rengê xwe zer bûye. Ji ber vê eşqê hatiye hencirandin û di nav agir de ye. Cegera xwe şewitiye. Goştê laşê xwe di nav agir de pijandiye. Derd û cefayên ku Feqiyê Teyran dihêjmire mecazî ne. Ew mitesewif e, ji ber eşqa Xwedê her tim mest û serxweş e. Ku ji vê eşqê dûr be, cefa dibîne, ku nêzik be ji sedema nagihîje Xwedê, disa di nav agir de ye.

Çerxê di nêv çerxa ez im
Ruh û rewana min tu yî
Ez hişkedar im ne rez im
Xeml û rihana min tu yî
...
Bizan ku min yar tu yî
Dil jê birîndar tu yî
Ez kuştim yekcar tu yî
Kubkub li min yar tu yî⁸⁹

Gor mitesewifan, di jîyanê de, mirovan di nav çerxa felekê de ne. Feqiyê Teyran jî di çarina peşî de vê rewşê diyar dike. Ew di nav çerxê felekê de, di derd û nalinê de ye. Lê yara wî heye û yê ji wî re alîkarîyê bike. Di vê nalin û di nav çerxê de, yar alîkar e, lê bi xwe jî aşiq birîndar dike û dikuje.

Ew ji ber vê eşqê birîndar û hêsîr bûye, berdewamî jî, ji dest wê dinale. Lê dîsa ew eşqa xwe dixwaze. Dixwaze ku ji Xwedê dûr nemîne. Ku bikujê jî dîsa ew

⁸⁸Sadinî, *Feqiyê Teyran*, b.n., r.131.

⁸⁹Sadinî, h.b., r. 8-429.

Wî dixwaze. Kuştin eşq qedandin e. Sofî jî, nefsa xwe dikuje û ji benda xwe derdikeve. Ew jî Xwedê re yekbûn e, fenafillah e.

Di helbesta **Ehmedê Xanî** de sembola cefa û derd :

Meyla te ye aşiqan dikêşit
Derdê te ye dil ji ber diêşit

Şîrîn te kire şeker li Perwîz
Ferhadî ji renga eşki xûnrîz⁹⁰

Xanî, di van risteyan de derdê eşqê, bi nimûneyên çîrokên eşqê eşkere dike. Meyla aşiqan meyla Xwedê ye. Ji derdî vê eşqê dil di êşe de ye, le dîsa jî, ji vê eşqê nabihûre. Çîrokên eşqê ku di nav gel de belav bûnî jî, dîsa di bin bandora vê eşqa îlahî de ne. Yê ku Şîrîn kirî şeker Ew e, eşqa Xwedê ye. Şîrînîya dilbera Şîrîn ji bo eşqa Xwedê ye. Dîsa yê ku Ferhat bi çiya xistî jî eşqa Xwedê ye. Xanî, li vir bi biwêjên tesewûfê derd û cefayê, eşqa îlahî eşkere kiriye.

Di helbestên **Pertew Begê Hekarî** de sembola cefa û cewr û derd:

Çi ye derdê te bêje ey dil ey dil
Ji çavan xûn birêje ey dil ey dil
...
Heçî dax û birîna min li sîne
Ji wê bejna dirêj e ey dil ey dil⁹¹

Ey dil bêje derdê te çi ye. Ew derd çi ye, ku ji çavê te xwîn dirêje. Derdê dil, bejna dirêj e. Ji bo vê bejnê dax û birîn, êş û xwîn di laşê wî de ne. Bejna dirêj, mecazî ye. Lê belê yara rast, Xwede ye. Eşq ji bo Xwedê ye. Ew biwêjên tesewûfê derd û xwîn û birîn ji eşqa Xwedê ne. Helbestvanên wêjeya klasîk ya kurdî vê peyvê bejna dirêj ya mecazî di helbestên xwe de pir bi cih dikin. Di wêjeya klasîk ya tirkî de jî, bi bejna dirêj re 'selvi boylu' tê gotin û helbestvan bi piranî vê simbolê di helbestên xwe de kar tînin.

Serwê azad û qedê eşnayê te yeksan e li min

⁹⁰Şemrexî, h.b., r.22.

⁹¹Doskî, *Dîwan, Perto Begê Hekarî*, b.n., r.215.

Sibhî halê me serê zilfê perîşan e li min
Ew qeder cewr û cefa û sitem dîtin e min
Dize yek lûtfê te qîmet bi dused can e li min ⁹²

Pertew Begê Hekarî bi dubare kirina ‘li min’ rewşa xwe û sedem û halê eşqa xwe teswîr dike. Di cewr û cefayê de sebr dike. Ew cewr û cefayan tev bi wî hêsan in.

Pertew Beg, her daîm ji ber eşqa xwe cefa dibîne le dîsa jî, ji vê rewşê gazind nake. Ezreyîl jî, ji wî re dost e. Çiqas canê wî hebe ew ê li vê rê bide. Wekî ku Mewlana ji roja mirinê re dibêje Şeba Erûz. Ango şeva dawetê, şeva ku aşiq digihîje maşuqa xwe. Pertew Beg jî, melekê rûxan ji xwe re dike canan. Lê ew canana mecazî ye, sedema ku mirin û Ezrayîl, wî digihîjine eşqa rast, anga Xwedê. Ezreyîl dostê ku wî digihîjine eşqa heqîqî ye. Eşqa heqîqî, eşqa Xwedê ye. Pertew Beg hemû cewr û cefayan li vê rê dibîne.

Di helbestên **Mela Nezîrê Bedewî** de sembola cefa û derd:

Neqş û xetê Rebbê ehed
Sotin li min daîm kebed
Dad û meded dad û meded
Can û dilê min herrişand

Îro birîndarê dil im
Sa’et bi sa’et dilkul im
Mûhtiyê mislê ewwel im
Sed şîş di cergê da tewand⁹³

Mele, neqşê Xwedê ehedîyetê pir dilketiye û bi eşqê vê ehedîyetê dilşewitiye. Ew cefayên ku Mele dibîne cefayên mecazî ne û felsefa tesewûfê de eşqa Xwedê diyar dikin. Ew ji ber wê eşqê dişewite û meded dixwaze. Her tim bê heval e, li dor eşqa delal tewaf dike. Dilê xwe birîndar e, kul e. Mitesewif, ji van êşandina eşqa yarê anga eşqa îlahî, zewqê digre û ji rewşê xwe kêfxweş e, dilşad e.

Dilbera min pur delal e mesnû’ê Rebbê qedîr

⁹²Doskî, *Dîwan, Perto Begê Hekkarî*, b.n., r.238.

⁹³Doskî, *Dîwana Dahî, Mela Nezîrê Bedewî*, b.n., r.46.

Wechê wê cama zelal e haşa nîne kes nevîr
Lami'ek hatî ji bala emr û fermana emîr
Go: Seher Dahî binale her tu yî îro esîr
Lê tenê تنها dinalî ew Nezîrê dilbirîn⁹⁴

Mele, di vê çarinê de wesfên dilberê dibêje û bi vê dilberê re axaftinê xwe berdewam dike. Ew dilber bi bejn, zulf, bisk, kember û toqê li puştê ve pir delal e. Wechê wê jî wekî camê zelal e. Ew mesnû'e Rebbê qedîr e. Mele, bi van wasf û bi vê eşqa mecazî, digihîje eşqa îlahî. Ew ji derdê eşqa xwe her daîm dinale. Lê wekî mitesewifên din hez nake ku ew derd û nalîn jî qet xilas bibin.

2.1.d. Eşq / Aşiq / Me'sûq

Eşq, muhebet e, hezkirina herî zêde ye. Mertebeya hezkirinê dawî ye. Aşiq di me'sûqê xwe de xwe winda dike. Nefsê xwe li holê radike. Di tesewûfê de eşq, di nav pêtê agir de şewitandinê û bi taybetî ceger şewitandinê teşbîh dibe. Dîsa bi serxeşbûn û bi mecnûniyê re jî mecazî tê gotin.

Eşq du cure ye. Yek eşqa mecazî ye. Ew, eşqa hember cins yan jî eynî cinsê mirovan e. Yên ku nikaribin vê eşqê bi çavkanîyek îlahî ve girebidin ew dibe eşqa heywanî. Eşqa mecazî yê ehlê tehwid dîsa dibe eşqa îlahî. Eşqa duyemîn jî eşqa heqîqî ye. Ew jî rasterast eşqa Xwedê ye. Qûl ji Xwedê hez dike, Xwedê jî, ji qûlî xwe hez dike. Munesebeta aşiq û me'sûq e.⁹⁵

Aşiq, dilketî ye, dildayî ye. Ji dereceyên herî zêde Xwedê hez dike. Me'sûq, yar e, dilber e, canan e. Di tesewûfê de ew Haq Teala ye. Lê Belê Heq Teala ji hezkirine re bi her awayî layiq e.

Gor mitesewifan muhebet bingeha eşqê ye. Muhebet, tiştên ku dilê mirovan pê de meyl dibin re dibe. Muhebet ji Xwedê re ye. Muhebetê Xwedê bi du rêyan di qelbê mirovan de bi cih dibe. Yek her tim îbadet û ta'et zêde kirine. Yek jî, ji dilê xwe muhebetê dinê derxistine.⁹⁶

⁹⁴Doskî, h.b., r.85.

⁹⁵Uludağ, h.b., r.59.

⁹⁶Yılmaz, h.b., r.220.

Di helbestên **Melaye Cizîrî** de sembola eşq û aşiq:

Aşiq ku bi dil fatiheyê ‘işqê xwand

Ayati yekayek dikirin amînê⁹⁷

Aşiq ku bîryara xwe dide û eşqa xwe berdewam dike û fatiheyê eşqê dixwîne, ayetên eşqê yek bi yek dibêjên amîn û li pey fatiheyê diçin. Fatihe di Qur’an’a Hekîm de sureya yekemîn e, destpêka Qur’anê ye. Bi diaya amîn xelas dibe. Mela li vir eşqa xwe îlahî teşbîha fatiheyê dike. Ji eşqa wî re aşiq hemû dibêjên, amîn. Ew eşqa îlahî dixwîne. Wekî ayetên ku li pey fatihe diçin, aşiq jî li pey wî ne.

‘Îşqê ji Xudê da tu bixwazî jê ra

Ger dê li neyarek xwe bikî nefrînê⁹⁸

Mele li vir ji mirovan re şîreteke dike. Ev şîret jî li ser dijminan e. Eger tu ji dijminên xwe re nîfirek bikî, ji dijminê xwe re, ji Xwedê eşqê bixwaze. Gor wî eşq belaya herî mezin e. Mele ewqas ji dest eşqê birindare ku bi vî awayî şîret dike. Mele dizane ku eşqa îlahî tiştekî di meriv de nehele. Eşqa îlahî meriv ji nefis û jiyana dinê derbas dike. Bi Xwedê re yek dibe. Bi vî halî re fenafillah tê gotin. Di eşqa Wî de fanîbûn e.

Di helbesta **Mela Huseynê Bateyî** de sembola eşq û aşiq:

Aşiqê bê kar û kesb im

Ez feqîr im dûredest im

Serxweş û sekran û mest im

Mam di nav qewmê xerîb

Serxweş im min hal çu nîne

Cerg û dil safî birîn e

Rondikêm tîn av û xwîn e

Mam di nav qewmê xerîb⁹⁹

⁹⁷Turan, h.b., r.168.

⁹⁸Turan, h.b., r.530.

⁹⁹Sadinî, *Mela Huseynê Bateyî*, b.n., r.119.

Aşiq ji ber eşqa xwe berdewam mest û serxweş e, xerîb û birîndar e. Mey di tesewûfê de sembola eşqê ye. Mey, ango şerab, feyza îlahî ye. Wekî ku mey meriv serxweş dike, aşiq jî, ji eşq û feyza îlahî mest bûye.

Bateyî, li vîr bi van simbolên tesewûfê, eşqa xwe diyar dike. Yar, dil, dilber, me'şûq, aşiq, eşq, evîn, şerab, mey, xemr, serxweşbûn, mestbûn hwd. di tesewûfê de simbolên mecazî ne. Di wêjeya klasîk ya kurdî de helbestvan eşqê bi van sembolan kar tînin.

Di helbestên **Feqiyê Teyran** de sembola eşq û aşiq:

Ey av û av ey av û av
Ma tu bi 'îşq û muhbet î?
Mewc û pêlan tavêy belav
Bêsekne û bêrahêt î
...
Ji îşqa kê her tê yû têt
Heta kengê her bê yû bêy
Bo min bibêj heyranê kêy?
Da ez bizanim qissetê¹⁰⁰

Feqiyê Teyran di çarîna yekemîn de gazî avê dike û li dipirse: Ma tu ewqas diherikî tu qet navestî. Ew meşin û herikandinên te ji eşq û muhebetê ne. Wekî tavêy belav tu her tim bêrehat û bêsekne yî. Di çarîna duyemîn de dîsa ji avê dipirse: Bibêj tu heyranê ke yî, ji ber eşqa xwe tê heta kengê biherikî.

Di wêjeya klasîk ya tirkî de, helbestvanê girîng Fuzulî, qesîdeya xwe ya herî navdar "Qesîdeya Avê (Su Kasidesi)" wekî Feqiyê Teyran li ser avê nivîsandiye. Lê belê gor dîrokê, wî li ber Feqiyê Teyran nivîsandiye. Fuzulî di vê helbestê de wiha dibêje :

Saçma ey göz eşkden gönlümdeki odlara su
Kim bu denlü dutuşan odlara kılmaz çâre su¹⁰¹

¹⁰⁰Sadinî, *Feqiyê Teyran*, b.n., r.111-112.

¹⁰¹Çalışkan, Adem, *Fuzûlî'nin Su Kasidesi ve Şerhi*, Diyanet İşleri Başkanlığı Yayınları, Ankara 1992, r.57.

Fuzûlî di “Qesîdeya Avê” de, bi sembola avê, eşq û muhebetê xwe Hezretî Pêxember dest nîşan dike. Gor wî av bi eşqa Hezretî Mihemed û eşqa Xwedê çiya diqelişe û her tim diherike.

Feqiyê Teyran jî, di van çarinan de, wekî Fuzûlî, wekî qesîdeya avê nivîsandiye. Ew bi sembola avê, eşq û evînê xwe ji bo Xwedê Teala dest nîşan dide. Av paqijî ye û safî bûn e. Sofî bi vê avê, karên çepel li ser xwe radikin. Av bi eşqê li rêya xwe diçe, çiya û zinaran diqelişe. Sofî jî wekî avê, bi eşq û heyecan di rêya Xwedê de diçe.

Işqa mecaz tu terk ke
Ew sir û dîn betal bûn
Tu yarekê heder ke
Li min bê ilm û xeyb bûn
Carek li wî nezer ke
Ebed heye her hebûn¹⁰²

Feqiyê Teyran, di helbesta xwe ‘Feqe û Bilbil’ de bi bilbil re diaxive. Bilbil li rêya xelet e. Ew dû eşqa mecazî diçe. Bilbil her tim li sorgula xwe digere û gazî sorgula xwe dike. Gor Feqiyê Teyran ew karên bilbil betal in. Ew şîretan li bilbil dike û dibêje: Bes e, li dû vê eşqa mecazî mere. Eşqa mecazî terk bike. Ew eşqa mecazî betal e. Carek li Xwedê nezerê bike. Ew nezerê li rêya Xwedê, eşqa heqîqî ye, eşqa îlahî ye. Eşqa ebedî bi hebûnê re heye.

Feqiyê Teyran, bi simbolên mecazî yê tesewûfî, bi eşq û bi bilbil, li mirovan wiha şîret dike: Eşqa mecazî terk bikin. Hemû hebûnan li rêya eşqa îlahî ya ebedî bidin.

Di helbestên **Ehmedê Xanî** de sembola eşq û aşiq:

Leyse fî qelbî sîwake ya hebîbî kulle hal
Her demem xem hem demem şud der fîraqet mah û sal
Ger benim kanım dilersen, çoktan olmuştur helal
Mest û ser xwoşem ji îşqê, min nema 'eql û kemal¹⁰³

¹⁰²Sadinî, *Feqiyê Teyran*, b.n., r.153.

¹⁰³Durre, h.b., r.126.

Ehmedê Xanî, di helbesta xwe "Şehîdê Kerbela" de, bi erebî, farisî, tirkî û kurdî, bi her çar zimanan kar anîye. Ew jî delîla vê yekiye ku, Xanî pisporê her çar zimanan jî bûye.

Di rêza yekemîn de bi erebî dibêje ku, "Ey evîna min, di her halî de, di dilê min de, ji bê te tişteke tune ye." Di dilê Xanî de bê eşqa Xwedê, tişteke tune ye.

Di rêza duyemîn de bi farisî dibêje ku, "Ji Te qetandinê min de her dem, ji min re xemgînî heye. Ji te dûr bûnê min de jî, her dem û her meh ji min re wekî salan dirêj dibin." Xanî ji Xwedêyî xwe dûr bûnê, qet naxwaze.

Di rêza sêyemîn de bi tirkî dibêje ku, "Eger Tu xwîna min dixwazî, ji pir deman de yê ku ew, ji Te re helal e." Xwîna Xanî, li rêya evînê wî ye.

Xanî, di van çarînan de jî dîsa eşqê xwe îlahî û tesewûfî eşkere dike. Ew eşqa berdewamî ye. Bê wê eşqê tişteke di dilan de tune ye.

Şerha xemi dil bikim fesane
Zînê û Memî bikim behane¹⁰⁴

Ehmedê Xanî, di vê risteya ku me ji helbestên wî girtî de, bi kurtasî hemû armancên xwe eşkere dike. Armanca wî ne Mem e, ne jî Zîn e. Ew bi Mem û Zînê eşqa dila şîrove dike. Eşqa hemû dilan de jî bi van eşqên mecazî digihîje eşqa rastî, eşqa heqîqî. Eşqa Mem û Zînê û wekî eşqa Mem û Zînê hemû eşqên di dilê mirovan de mecazî ne. Eşqa heqîqî û mezin, eşqa Xwedê ye. Xanî li vir eşqa tesewûfî eşkere kiriye.

Namê te ye lewhê nameya 'eşq
Îsmê te ye neqşê xameya 'eşq

Bê neqşê te neqşê xame xam e
Bê namê te name natemam ê

Namê te ye şahibeytê meqsûd
Fêhristê mukatebatê mehmûd¹⁰⁵

Navê Xwedê, li ser hemû lewhên nameya eşqê nivîsîye. Hemû neqşên xameyan jî, ji eşqa îsmê Wî ne. Hemû neqş û nivîs li ser eşqa Xwedê ne. Neqşên li

¹⁰⁴Şemrexî, *Mem û Zîn, Ehmedê Xanî*, r.41.

¹⁰⁵Şemrexî, h.b., r.15.

ser lewheyê ku bê navê Xwedê bin, hemû betal in. Nameyên ku bê navê Xwedê bin jî natemam in.

Şahibeyt, di nav beytan de beytên serkeftî û baş re tê gotin. Xanî di risteya sêyemîn de jî dibêje, wekî ku di nav beytan de ya herî baş, bi şahibeyt nav dibe, di nav navê baş de jî navê te şahibeyt e. Gor wî, navên Xwedê jî, şahibeytê navan in. Ehmedê Xanî di van risteyan de wekî mamikan peyv û ramanên xwe rêz kiriye. Navê Xwedê sedema hebûnê ye. Eşq, eşqa Xwedê ye, eşqa navê Xwedê ye.

Di helbestên **Pertew Begê Hekarî** de sembola eşq û aşiq:

Agirê işqê helandin li me cism û ten û can
Were carek ji te ra da bikim ez derdî beyan
Tu bizanî çî tikêşim ji birînê te nîhan
Bi êş û sotin û jan in ne bi ewsaffî beyan
Nale û ‘îlel û ahan digirim ta seherê¹⁰⁶

Di tesewûfê de aşiq tev ji agirê eşqê dişewitin û lê dîsa jî, ji eşqa xwe venagerin. Her dem eşqa Xwedê dixwazin. Pertew Beg, eşqa xwe diyar dike, ji derdê eşqa xwe her tim dinale. Êvaran heta sibehê digirî. Ji dest agirê vê eşqa mezin, cism û canê wî hatine helandin. Lê dîsa ew bi tenê berdewamî eşqa îlahî dixwaze û eşqa xwe beyan dike.

Di wêjeya klasîk a tirkî de jî, Fuzûlî li ser cewr û cefa ya ku ji ber eşqa Xwedê dibîne wiha dibêje:

Cefâ vu cevîr ile mu'tâdim anlarsız nolur hâlim
Cefasına had u çevrine pâyân olmasın yârab¹⁰⁷

Ew, ji ber eşqa xwe her tim cewr û cefa dibîne, lê naxwaze ku ew cewr û cefa qet sax bin. Ku cewr û cefa sax dibin, eşq jî, aşqa Xwedê jî xelas dibe. Fuzûlî wê sedemê wekî Pertew Beg, dixwaze ku cefayê xwe berdewam be.

Min ji ewwel qet nezanî agirek sûzan e ‘işq
Ateş û pêt û şerar e agir û nîran e ‘işq

Ulfet û mihr û muhebbet şewq û şûrevîn heme

¹⁰⁶Doskî, *Dîwan, Perto Begê Hekarî*, h.b., r.79.

¹⁰⁷İpekten, h.b., r.136.

Derdê bê derman û lê her derdî ra derman e ‘işq¹⁰⁸

Eşq, dilê mirovan dişewitine. Bi vê yekê ve, ew agirek e. Pertew Beg, di risteya yekemîn de dibêje ku eşq agirek e, lê heta niha min qet nizanibû ku eşq agirek e. Di risteya duyemîn de ji dibêje ku eşq li dinê zewq û sefa ye. Dû re di rêza dawî de terîfeke eşqê baş dide. Gor wî eşq, hem derdekî bê derman e, hem jî, ji her derdî re derman e. Mitesewifê navdar Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Feqiyê Teyran, Fuzûlî hwd. hemû bi vî awayî di helbestên xwe de li ser eşqê disekin. Wekî Pertew Begê Hekarî, li gor wan jî eşq, derdekî bê derman e, lê ji her derdî re jî derman e û her dem vê eşqê dixwazin. Eşqa ku ji derda re derman eşqa Xwedê ye, lê dîsa eşqa ku dermanê xwe tune jî eşqa Xwedê ye. Ew eşqa berdewamî ye, eşqa ebedî ye.

Aşiq e ya mest e Pertew dîn e ya dîwane ye
Teyhû ye ya qumrî ye ya bilbil û perwane ye
Ya xerdmend e qewî ya aqil û ferzane ye
Ya di nîva aşiqan Pertew dîn e ya dîwane ye
Lew ku mîslê wî kesek der kuçe û koyan nebû¹⁰⁹

Di van rêzan de, di helbestên klasîk de pêşketiya Perto Begê Hekarî bi taybetî xuya dike. Peyv û simbolên tesewûfê yên mecazî baş bi kar anîye: dilber, dil, gul, bilbil, afitab, kakul, aşiq...

Di nav aşiqan de ew dîn û dîwane ye. Pertew Beg, dîniyê xwe qebûl kiriye. Ew dîn û dîwane ye. Dîsa rewşa xwe aşiq û mest bûnê teşbîha bilbil, qumrî û perwane yê kiriye. Di nav aşiqan de kesekî wekî wî aşiq û dîwane tune ye. Sedema ku ew merivekî softî ye û li medreseyan ders xwendîye, bi van simbolên mecazî eşqa xwe tesewûfî, eşqa îlahî eşkere kiriye.

Di helbestên **Mela Mihemedê Liceyî** de sembola eşq û aşiq:

Ev çav û rux û zulf û leb û sîne û qamet
Girtîne ji şeş alî li min rahê selamet
...
Dikujî tu ‘uşaqan û bi zincîrê du zulfan
Der çahê hebeş dikî her bi melamet¹¹⁰

¹⁰⁸Doskî, *Dîwan, Perto Begê Hekarî*, b.n., r.83.

¹⁰⁹Doskî, h.b., r.83.

Di wêjeya klasîk de dilber bi zulfa xwe aşiq li dor xwe digre û aşiqan bi van zulfan her dem dikuje. Zulf, piranî ye. Ew piranîya digihîje hev û dibe yekbûn. Mele Mihemedê Liceyî jî sembola, zulf û çav û leban eşqa xwe dibêje. Zulf, çav û leban her şeş alî wî girtine. Ew zulf û leb û qamet mecazî ne. Ew eşqa ku şeş ali girtî eşqa îlahî ye. Seydayê Liceyî vê eşqê bi sembolan teswîr dike. Eşqa îlahî li her cihê ye. Sembolên ku Seyda dihêjmire, di wêjeya klasîk û di tesewûfê de baş cih digrin.

Bulbul bi hezar awaz
Bo gul heye ew çilmaz
Wek ney e bi sewt û saz
Her ‘işqê wî kir îqaz¹¹¹

Bilbil û gulê jî di wêjeya klasîk de, di nav helbestvanan de, sembolên evîniyê û eşqê ne. Bilbil aşiq a gulê ye û ew bilbil, her dem ji bo gulê heye. Bilbil wekî neyê bi hezar sewt eşqa xwe bo gulê eşkere dike. Lê belê, bê vê eşqa gulê, ku çiqas eşq hene jî, wî diyar kirine. Ew eşq mecaz in, eşqa Wî, eşqa heqîqî ye. Ew eşqa bilbil jî eşqa Xwedê îqaz kiriye. Mitesewif, her dem bi van sembolan eşqa Xwedê Teala di helbestên xwe de bi cih dikan.

Di helbestên **Şêx Mihemed Hadîyê Qewmanî** de sembola eşq û aşiq:

Mehbûb î tu husna te purr
Wek lû’lû’ û yaqût û durr
Lew dil ji ‘uşşaqan dibir
Xweş tê li min navê şîrîn

Leyla zemanî her tu wî
Zîna Memanî her tu wî
Dil bir bi talan her tu wî
Xweş tê li min navê şîrîn¹¹²

Xwedê mehbûb e, dildar e. Wekî yaqût û dur husna xwe pir e. Ew navê Xwedêyî şîrîn, dil ji aşiqan dibe. Di çarîna duyemîn de jî Şêx Hadî, vê husna îlahî,

¹¹⁰Doskî, *Dîwana Hadî, Mela Mihemedê Liceyî*, b.n., r.93.

¹¹¹Doskî, h.b., r.127.

¹¹²Seydaoğlu, h.b., r.48.

teşbîha Leyla û Zînê dike. Ew Leylaya her zemanî ye. Wekî ku Mecnûn aşîqa Leylayê bû, her dem jî, hemû kes aşîqa Wî ne. Wekî Zîna Memê jî, her dem hemû kes dîsa aşîqa Wî ne. Aşîqa Xwedê ne, ew eşqa her demê ye. Eşqa bêdawî ye. Şêx Hadî jî, li vir eşq û evîna Leyla û Mecnûn, Mem û Zînê tîne bîra me. Ew çîrokan di nav gel de gelek belav bûne. Eşqa wan ya mecazî ye, demborî ye. Ew eşq, pişt re dibe eşqa îlahî. Ew eşqa rast e, eşqa îlahî ye.

Hewar û sed hewar bûme
Hilak ez şewq û sewdayê
Nema min çareya sebrê
Digel vê herb û xewxayê
...
Bike lutfê hebîba min
Li min îro qewî jar im
Gedayê ber derê canan
Ji wesla te ricakar im¹¹³

Şêx Hadî, dîsa li vir eşqa xwe îlahî diyar dike. Di tesewûfê de eşq, mijara yekemîn û herî girîng e. Mele, ji vê eşqê eza û cefa dibîne dîsa jî heznake ku ji vê eşqê dûr bikeve. Zulf û çêşm jî dîsa sembolên vê eşqê ne. Helbestvan bi van biwêjên mecazî di helbestên xwe de eşqa xwe kar tinîn. Şêx jî bi van sembolan eşqa xwe muşexes dike.

Ji dest eşq û sewdayê, sebra Şêx Hadî nemaye. Xemgîn bûye, her tim hewar û sed hewar dike. Ji eşqa dilberê, ew esîr û bendewar e, şev û roj xew naye.

Çarîna duyemîn de Şêx, ji dilbera xwe lutfê dixwaze. Dibêje ez dil sar im, gedayê te û jar û ricakar im. Lutf ji Xwedê ye, ew eşqa Xwedê diyar dike û ji Xwedê lutfê dixwaze.

Di helbesta **Seyîd Elîyê Findikî** de sembola eşq û aşîq:

Xema ‘işqê gelek zor e
Dibêjim behrekî kûr e
Firaq û wesletê dûr e

¹¹³Seydaoğlu, h.b., r.54.

Me ev reng dî ji dewranê

‘Elî bes ke ji nalînê

Tu nawestî ji kalînê

Sebir ke wek Memê Zînê

Ew e derman ji tibxanê ¹¹⁴

Aşiq, li rêya Xwedê, ji ber eşqa Xwedê her tim dinale. Di eşqa îlahî de wesl, ango derman li dinê tune ye û vê sedemê derdên eşqa îlahî berdewamî ne, bê derman in. Seyda, çarîna pêşî de bi vê eşqê re dibêje ku, ew behrekî kûr e. Wesleta vê eşqê jî dûr e. Seyda di dewranê de dîtiye ku eşqa bi derman e. Çarîna duyemîn de jî Seyîd Elî, ji derdî eşqê westabûna xwe dibêje. Ewqas westiye ku dibêje, êdî ji nalînê min re bes e. Min derman li nexweşxane dîtiye. Ew derman ji wekî Memê, Zînê sebir kirine.

Seyîd Elî, xwedîyî sebra mezin Memê jî, li vir, wekî helbestvanên wêjeya tesewûfê din, tîne bira me û dibêje, wekî Memê sebr dermana min e.

Di helbestên **Mela Nezîrê Bedewî** de sembola eşq û aşiq:

Ji ber ‘işqê dinalim ez

‘Eqîq û ‘enberê derxe

Ji ber ‘işqe dikalim ez

Şev û rojê li kember xe

Girê de çîçek wala

Tu hilkêşe were bala

Li ber çavê me ‘ebdala

Li dorê ez bidim çerxe ¹¹⁵

Mela, ji hember eşqê dinale. Wekî mitesewifê din, ku ji ber eşqê dinalin, lê disa jî eşqê dixwazin, ew jî dinale lê dîsa jî eşqa Xwedêyî xwe dixwaze. Şev û rojê dikale, lê dîsa jî Wî dixwaze.

¹¹⁴Dilovan, *Dîwan, Seyîd Elîyê Findikî*, b.n., r.101.

¹¹⁵Doskî, *Dîwana Dahî, Mela Nezîrê Bedewî*, b.n., r.42.

Ebdal jî, di tesewûfê de wekî şêxan in. Di terîqeta Bektaşîyan de bi pîrê terîqetan re ebdal te gotin. Mele jî li vir, xwe jî ebdal qebûl dike. Ebdal jî wekî şêxan li ber Xwedê digerin û eşqa Wî dixwazin. Ew jî wekî ebdalan eşqa Xwedê dixwaze.

Me go rewhanê di ber avête dil ‘işqa xedar
Aşiq û me’şûq yek in purs meke ji va behsê kûr

Bes bike cewrê li min padişahê ru li cihan
Ma ricûkar me heye hîvî me ma Rebbê xefûr¹¹⁶

Gor Mela Bedewî, aşiq û me’şûq eynî ne. Hem jî ew behsa, behsa eşq û evîniyê, behsekî kûr e. Ew aşiq, di eşqa xedar de ye, di eşqa giran de ye. Ji Rebbî xefûr, efû û hêvîya xwe heye. Ji dest evîniyê jî, di sîneya wî de jîyan nema ye û bêcan e, ketiye şeklê tîrê ye. Ji van evîn û eşqan û ji ber ehlê fucûr de Mele, her tim dinale. Van peyvan dîsa biwêjên wêjeya tesewûfê ne û bi van bandora tesewûfê li ser Mele Bedewî diyar dibe.

2.1.e. Fenafillah / Fena

Fena hîçî ye, tunebûn e, demborî ye. Qûl di vê mertebeya tesewûfê de tu karên xwe nabîne. Hemû kar û barên qûl, yên ji Xwedê ne.¹¹⁷ Qûl îradeya xwe di îradeyê Xwedê Teala de fanî dike. Bi vê mertebeyê re fenafillah te gotin. Fenafillah bi Xwedê re fanîbûn e. Xwe sifetên beşerî xilas kirin û xwe bi sifetên îlahî xemilandine.

Mertebeya fenayê herî mezin fena anîlfena ye. Ew mertebe ji fanîbûne jî fenabûn e. Ji fanî bûnê jî derbas bûne.¹¹⁸

Fenafil wicûd jî wekî fenafillah di hebûne de bi Xwedê re yekbûne. Hemû tiştên ku xuya dikin Xwedê ne, yan jî, ji Xwedê tên. Bi vî awayî fenafil wicûd wekî felsefa wehdetîl wicûd e.¹¹⁹

Di helbestên **Melayê Cizîrî** de sembola fena û fenafillah:

Qesdê ser çeşme ê heywanê heqîqet ke Nîşanî

¹¹⁶Doskî, *Dîwana Dahî, Mela Nezîrê Bedewî*, b.n., r.55.

¹¹⁷Yılmaz, h.b., r.226.

¹¹⁸Yılmaz, h.b., r.227.

¹¹⁹Uludağ, h.b., r.188

Bi cehanê mebe mexrûr ku cehan ‘eynê serab e¹²⁰

Nîşanî mexlesa Melayê Cizîrî ye. Mele li vir bi vê mexlesê kar tîne û dibêje, ey Nîşanî, berê xwe bide çavkanîya heqîqetan. Bira dinê te nexapîne, bi hebûnên dinyayê mexrûr mebe. Ew hebûnên dinê wekî serabê çolê ne. Çavkanîya heqîqî destûrên Xwedê û jiyana axretê ye, yê din hemû fanî ne. Mele li vir dinê dût ketin û bi Xwedê re yekbûnê ve, biwêjê fenafillah diyar dike.

Ji “enelhaq” bi lebên le’li xebdari buwîn

Bi gulaba serê zulfa xwe te Mensûrî kirîn¹²¹

Ey yara min bi lêvên te yê sor em ji mertebeya enelheq xebdar bûn. Ew mertebeya fenafillah e. Ava gulan ku ketiye berçema te jî, em kirine Mela Mensûr e. Mela Mensûr, li ser wehdeta Xwedê Teala gotiye, hemû hebûn bi tenê Xwedê ne, yê din hemû derew in. Ez jî ne ez im, ez şewqedana Xwedê me. Hebûn hemû şewqedana Xwedê ne. Wekî ku Mela Mensûr wiha gotiye, Melayê Cizîrî jî dibêje ku, em bi Mela Mensûr xebdar bûn ku hemû heyîn şewqedana Xwedê ne. Ez jî wekî Mela Mensûr bi Xwedê re yek bûme. Ew mertebe, mertebeya fenafillah e.

Di helbesta **Mela Huseynê Bateyî** de sembolên fena û fenafillah:

Ger mu’min in ger kafir in

Ger hakim in ger sabir in

Wellah cemî’ dê bimirin

Kanê Mihemed Mistefa¹²²

Bi Xwedê xeyrî ku li gerdûnê de her çi heye wext û saetê xwe hatin yê bimirin, li hole rabin. Ger mu’min ger kafir, ger hakim bin hemû yê bimirin. Her wiha habîbê Xwedê Teala Mihemed Mistefa (s.x.l) jî, çu ser dilovaniya Xwedê. Hemû hebûn fanî ne yê baqî Xwedê ye. Li vir Mele, bi peyv û wateyên demborîyê, biwêja tesewûfê fena eşkere dike. Dinê, mirov, hemû hebûn demborî ne.

Di helbesta **Feqiyê Teyrande** sembola fena û fenafillah:

Ne Eyûbê birîndar e

¹²⁰Turan, h.b., r.722.

¹²¹Turan, h.b., r.735.

¹²²Sadinî, *Mela Huseynê Bateyî*, b.n., r.145.

Ne Yehya ma ne Salîh ma

Ne Harûn ma ne Mûsa ma

Ne Meryem ma ne Îsa ma

...

Ne Cumcum ma ne Exyar e.

Ne Eflatun û Loqman man

Ne Dawid û Suleyman man

Ne Fi'rewn û ne Haman man¹²³

Di wêjeya tesewûfê de helbestvan bi piranî li ser demborî û fanîyetê mirovan disekinin. Van çarînên Feqiyê Teyran jî bi vê mijare pêk tên. Ew dinê ya fanî ye. Bi tenê ne merivên navdar, feylezof û pêxemberan, wekî Fi'rewn merivên ku gotine em îlah in jî mirine. Feqiyê Teyran, ji van hin ê navdar dihêjmire. Ew mezin û dewlemend, ew şêx û pexember yên wekî Yehya, Eyûb, Mûsa, Eflatun, Suleyman, Loqman, Haman hwd. hemû mirin û çûn. Hebûna ezeli û ebedî, bi tenê Xwedê ye. Mirov tev, li vê dinyaya derewîn, fanî ne.

Di helbestên **Ehmedê Xanî** de sembola fena û fenafillah:

Ev mîr u wezîrîya mecâzî

Ev şu'bede u xiyâlebâzî

Bîlcimle betâl u bê bekâ ne

Bê âqîbet in, hemû fenâ ne¹²⁴

Xanî, di van risteyan de hebûna mutleq diyar dike. Ew beg û wezîrîyê li dinê hemû betal û bê aqîbet in, mecazî ne, fanî ne. Aqîbeta eslî ji Xwedê ye. Ji eşqa Xwedê ye. Ew wicûda mutleq e. Wî ji me re hurî û zarokên bihuştê û bexçeyên bihuştê xemilandine. Yên li vê dinê, mecazî ne. Hemû hebûn fena ne. Bi biwêjên beka û fena bandora tesewûfê li ser Xanî eşkere dibe.

Bêjê tu qedîr û zulcelal î

Bêjê tu qedîm û layezal î

¹²³Sadinî, *Feqiyê Teyran*, h.b., r.224-225.

¹²⁴Şemrexî, *Mem û Zîn, Ehmedê Xanî*, b.n., r.163.

Em fanî û jar û muştixak in
Hadî ne tu bî xwe em helak in¹²⁵

Di risteya yekemîn de Xanî, sifetên Xwedê Teala dihêjmire. Ew biwêjên tesewûfê (qedîr, qedîm, fanî hwd.) bandora tesewûfê bi me nîşan didin. Gor mitesewifan Xwedê baqî ye, mirov fanî ne. Helbestvan xwe jî, bi hebûnan re dike yek û dibêje ku, em bi kemasîyan û derd û cefan hene, em fanî ne. Ey Xwedêyê min Tu nebî em ê helak bibin. Em bi Te re hene, bi Te re yek in. Bi vê yekbûnê re wêjeya tesewûfê de fenafillah tê gotin.

Di helbesta **Mele Xelîlê Sêrtî** de sembola fena û fenafillah:

Fena dê bibin ew biçin Cennetê
Ji bo ehlê wêre bikin xizmetê¹²⁶

Xwedê insan li dine afirandîye û ji her kesî re ecel, ango çaxê mirine tayîn kiriye. Merivên ku li rêya Xwedê bin, yên biçin bihuştê ye. Ji bo ku meriv biçin bihuşte yê li dinê îbadet û ta'et bike. Li vir Mele fanîyê mirovan eşkere kiriye. Mirovên bimirin û yên li rêya Xwedê bi Xwedê re fena bibin û biçin cennetê ye. Fena, fanîbûn û bihuşt li vir biwêjên tesewûfî ku Mele Xelîl bi kar anîne.

Di helbesta **Mela Mihemedê Liceyî** de sembola fena û fenafillah:

Mebe dilbendê vê dunya denî ye
Dê bimirin namîne yek ferdekê hey

Li kû ye qeyser û fexfûrê Çînî
Li kû ye Keyqubad û Xusrew û key

...

Tu bispêre Xwedê Hadî umûran
Xwedê qudret dikî her tişt û her şey¹²⁷

¹²⁵Şemrexî, h.b., r.33.

¹²⁶Kaya, *Nehc-ul Enam, Mele Xelîlê Sêrtî*, b.n., r.10.

¹²⁷Doskî, *Dîwana Hadî, Mela Mihemedê Liceyî*, b.n., r.157.

Mitesewif, di helbestên xwe de dinya û mirovan û jîyanê rexne dikin û li ser van mijara disekinin. Seyda jî li vir, li ser dinyayê mirokî disekine. Dinyaya ku em lê dijîn fanî ye. Mirin lê heye. Ji vê sedemê merivê nebe dilbend, Xusrew jî Keykubad jî mirin. Bi peyvên Xusrew, Keykubad û fexfûrê Çînê Mele merivên ku di dîrokê de navdar tîne bîra me û dibêje ku, ew li ku ne. Ew merivan fanî bûn, wexta xwe tamam bû û mirin.

Meriv ku tiştêkî ji dinê hêwî bike, ew xelet e. Bi tenê hêwî ji Xwedê dibe. Hemu tişt di bin qudreta Xwedê de ne. Mele, li vir, qudretê Xwedê û fanîyatîya vê dinyayê eşkere dike. Ew mertebeya tesewûfê fenafillah dixwaze. Fenafillah nêzikiya bi Xwedê re yekbûnê ye. Meriv li vê mertebeyê dibe insanê kamîl.

Di helbestên **Seyîd Elîyê Findikî** de sembola fena û fenafillah:

Di dinyayê heçî rabê
Feqîr û şêx û axa bê
Ji ber mirine xîlas nabê
Di şerq û hem di xerbê da¹²⁸

Mirin û dinyaya derewîn, di wêjeya tesewûfê de mijarên balkêş in. Fena û beka biwêjên tesewûfê ne. Seyîd Elî jî li vir, li ser vê mijarê disekine. Dinyayê ku mirov li dijîn, ew mirokî ye. Dinê jî, mirov jî fanî ne. Ku meriv, şêx be jî, axa be jî, feqîr be jî, dewlemend be jî, ew ê bimirin. Meriv li şerq be jî, li xerb be jî, ji ber mirine xilas nabe. Dinyaya derewîn li cem mitesewifan betal e.

Axret e mala heqîqî dunya mulkek fanî ye
Heyf û yazox e ku em ji bona dinê bin bendewar

Soz û bextê wê tunîn e ew ji kes ra nabê dost
Kanî axa kanî paşa ka xudanê Zulfeqar¹²⁹

Seyda li vir dîsa fanîtiya dinyayê dem dide û mala heqîqî hişyar dike. Ew mala heqîqî axret e. Ji vê dinê re kesek nabe dost, dost her tim li cem meriv dibe, lê belê dinê ne berdewamî ye. De û bav û biran û hevalan heta demekê li cem meriv in. Li merzel şûn de meriv bi tenê dimîne.

¹²⁸Dîlovan, *Dîwan, Seyîd Elîyê Findikî*, b.n., r.19.

¹²⁹Dîlovan, h.b., r.219.

Axa jî, paşa jî, xwedîyê Zulfeqar jî çûn (xwedîyê Zulfeqar Hezretî Elî ye), dinya ji wan re jî dost nebû. Dostê heqîqî li axretê ye, ew jî bi tenê Xwedê ye.

2.1.f. Insanê Kamil

Insanê kamil, merivên ku Xwedê bi zat, sifet û hemû karên xwe ve bi awayekî baş tede tecelî kirî re te gotin. Murşîdên heqîqî insanê kamil in.

Însanê kamil nurê aleme ne, eyneyê Xwedê Teala ne. Insanê kamil, sûretê Xwedê ne, Xwedê jî wekî ruhê wan e. Dîsa insanê kamil ruhê alemê ne, alem jî sûreta insanê kamil e. Vê sedemê ji alemê re "alema kubra" tê gotin. Mirov li ser erdê xelîfeyê Xwedê ye. Bi vê hêle ve insanê kamil, sifetên Xwedê giştî li xwe dicivîne.¹³⁰

Di demê tesewûfê ewil de peyva insanê kamil tune ye. Tesewûf ku wekî rêbazeke dibe, murşîd û şêxên terîqetê re insanê kamil tê gotin.

Insanê kamil, sifet û navên Xwedê Teala hemû zanin. Biwêja insanê kamil, madî û manewî mertebeyên kemalê hemû digre nav xwe. Insanê kamil Hezretî Mihemed e, ew ne şexsa wî ya dîrokî, heqîqeta Mihemedîyê ye. Eger ku insanê kamil tunebûn a, meriv Xwedê jî nizanî bû.¹³¹

Di helbestên **Melayê Cizîrî** de sembola insanê kamil:

Şahîdê cilwenuma qudsiyê feyrûze lîbas
Heçî rengê te nîşan dît tu nîşanê xwe binas"¹³²

Tu wê yara ku bi kincên pak tecelî dike binere û nas bike. Tu wê nas bikî te xwe jî nas bikî. Tecelî sifet û neqşên Xwedê Teala ne. Merivên ku sifet û neqşên Xwedê bizanibin, yên xwe jî nas bikin. Mele, dixwaze ku qûl xwe nas bike, xwe bizanibe. Xwedê ku insan afirandiyê, sifetên xwe jî, li mirovan neqş kiriye. Ji bo vê insan ku xwe nas bike, ew ê Xwedê ji bibîne. Merivê ku xwe nas dîkin insanê kamil in. Mitesewif Yunus Emre jî wekî Mele wiha gotiye:

İlim ilim bilmektir ilim kendin bilmektir
Sen kendini bilmezsın bu nice okumaktır

¹³⁰Uludağ, h.b., r.269-270.

¹³¹Yılmaz, h.b., r.328.

¹³²Turan, h.b., r.677.

Dema tu xwe nizanibî, xwandina te jî betal e. Xwe zanîbûn çawa ye? Merivên ku xwe bizanibin, Xwedêyê xwe jî dizanin. Xwedê bi sifetên xwe insan afirandiye. Merivên ku Xwedêyê xwe bizanibin, xwe jî dizanin. Yunus Emre, bi wateya baş wekî mamikan helbesta xwe pêk anîye.

Tûr im û bi dil peyrewê Mûsa yim ez

Ateşperes û Tûrê tecella yim ez¹³³

Melayê Cizîrî li vir wiha dibêje, di hêla dilê xwe de ez wekî Hezretî Mûsa me û wekî çiyayê Tûr im. Her wiha li rêya Mûsa me. Ango, ez wekî çiyayê Tûr im. Ku bi çi awayî Xwedê Teala tecelîya çiyayê Tûr kiriye, bi wî awayî jî di qelbê min de jî tecelîya xwe bi cih kiriye. Bi vê cih bûnê Mele insanê kamil e. Lê dîsa bi vê tecelîya Xwedê Mele felsefa wehdetîl wicûd jî eşkere dike.

Hezretî Mûsa li aliyê çiyayê Tûrê agir dîtiye û berê xwe daye wî alîyî, xwe li agir girtiye û çûye. Ez jî bi her awayî, xwe li agirê nûra Xwedê digrim û li wê rê diçim.

Di helbesta **Feqiyê Teyran** de sembola insanê kamil:

Guh bidêrin niqtê aşiqan

Da ez bixûnim vê xetê

Hemd û senaya xaliqê

Sibhan ji şahê qudretê

Sibhan ji şahê zulcelal

Fikrê me neqşê bê zewal

Halê bê micaz na ête bal

Kamil dibin bi ulfetê

Kamil dibin ev rengê bela¹³⁴

Feqiyê Teyran, insanê kamil bi çi awayî dibe li vir kurt dibêje. Ew insanên kamîl bi fikr û jiyana xwe li ser rêya Xwedê ne. Xwedê şahê Zulcelal e. Hemd û sena ji Wî re ye. Neqşê berdewamî jî yên Xwedê ne. Merivên kamil û xwe nas dikin, mezinahîya Xwedê jî dinasin. Bi vê ulfet û nasîne kamil dibin. Mitesewif bi vî awayî

¹³³Turan, h.b., r.737.

¹³⁴Sadinî, *Feqiyê Teyran*, b.n., r.239.

di mertebeyên tesewûfê de seyra nûzul û seyra urûcê dikin, ango digihîjine Xwedêyê xwe û vedigerin eslê xwe, dibin insanê kamil.

Di helbesta **Ehmedê Xanî** de sembola insanê kamil:

Remz û î'cazê di xûban bê îbaret medh dikem
Murşidê kamil ez im Îrohe, sahib raz im ez¹³⁵

Remz û î'cazê ku Ehmedê Xanî li vir dibêje gotin û karên wekî mûcîzeyên baş in. Ango ew pesnê xwe dide û dibêje ku ew kar û barên ku ez dikim wekî mucîzeyan in. Ez bi peyvan, medh û sena û pesnê tiştên derûnî û mûcîzeyên baş dikim. Ez îro murşidekî kamil im, xwedîyê tiştên derûnî û hîkmeta me. Ehmedê Xanî, li vir bi xwe re rasterast dibêje, ez insanê kamil im.

Di helbesta **Mele Xelîlê Sêrtî** de sembola insanê kamil:

Bi Qur'anê xeyrê wê mensûxî bûn,
Kemal û fedil bo me pê zêde bûn
...
Sifatê kemalî hemî, Reb hene
Sîmatê di neqşî ne mewcûdene¹³⁶

Kemal û fedil bi xeyrê Qur'anê zêde dibin. Merivên ku dergah û terîqetan li rêya Xwedê ne û Qur'anê dixwinîn û destûrên Qur'anê di jiyana Xwe de tetbîq dikin, bi fedl dibin. Dibine insanê kamil. Mele bi peyvên fedl û kemal, taybetiyê merivên insanê kamil qest dike. Risteya duyemîn de dibêje ku sifetên kemalê li Xwedê hene. Ew sifetên Xwedê, di yê ku wî mewcûd kirî de jî hene. Bi şewqê Wî ne. Kemal ya Wî ye, kemalê mirovan şewqa vê kemalê ye.

Di helbesta **Mela Mihemedê Liceyî** de sembola insanê kamil:

Werin hûn ey gelî nasan vexwun hûn mey bi tasan
Xelas bin hûn ji weswesan bibin dûr hem ji xennasan
Bibin dil pak ji ednasan berî bin hûn jî ecnasan
Hebîba taca her rasan bi wan du burhê wek dasan

¹³⁵Durre, h.b., r.121.

¹³⁶Kaya, *Nehc-ul Enam, Mele Xelîlê Sêrtî*, b.n.,r.9.

Bi berqa şîr û elmasan bi tîrêjên di şehkasan
Seraser ehlê dunyayê disojin ‘turfetl-ayn’ ê ¹³⁷

‘Turfetl-ayn’ dema herî biçûk e. Jîyana dinyayê demeke biçûk e. Seydayê Liceyî, di van rêzan de meyê, ji hemû mirovan re pêşkeş dike. Ev mey, meya ku mirovan ji wesweseyan dûr dixê û pak dike. Mey, di tesewûfê de sembola agahîyê li ser Xwedê ye, agahiya ku murşîd dide murîdan e. Jîyana dinê demborî ye. Hemû hebûnên li vê dine rabin. Jiyana ebedî li cem Xwedê ye. Merivên kamil digihîjine Xwedê û vedigerine eslê xwe.

Di tesewûfê de sofî ji alemê hîçî tîn alemê hebûnê. Berê mirov hebûneke bê can in, paşê dibin heywan û dû re hêj dibin insan. Pêda pêda bilind dibin û dibin insanê kamîl û digihîjin Xwedêyê xwe. Bi vê gihîştinê Xwedê vedigerin eslê xwe. Mela li vir, mertebeya tesewûfê insanê kamil nîşan dide.

Di helbestên **Seyîd Elîyê Findikî** de sembola insanê kamil:

Kar û bar teqwa Xuda ye ne rim û şûr û tîfing
Herkesê teqwa hebê ew dê xilas bî bê xusar

Ey Xuda teqwa ke rizqê me em hêvî dikin
Me ji pencê vê dinê derxe eva hinde neyar¹³⁸

Seyîd Elî, li vir li teqwayê digere û ji Xwedêyê xwe teqwayê dixwaze. Murşîdê kamil xwedî teqwayê ne. Seyîd Elî jî, mertebeya insanê kamil dixwaze. Her tiştên li rêya dinyaya ronêk, hemû betal in. Yê ku ji meriv re bimînin giştî teqwa ye. Merivên ku bi teqwa bin ew ê xilas bin.

Destê xwe bavêje dawa murşidek kamil bi lez
Tu bizane hek ev e her çî diye pûç û betal

Ê ku bêjî ez bi xwe bighim Xudê bê murşidî
Ev xiyala wî mehal e pur mehal e pur mehal¹³⁹

¹³⁷Doskî, *Dîwana Hadî, Mela Mihemedê Liceyî*, b.n., r.169.

¹³⁸Dîlovan, *Dîwan, Seyîd Elîyê Findikî*, b.n., r.221.

¹³⁹Dîlovan, h.b., r.95.

Di tesewûfê de mitesewif bi peyva murşîd jî nav dibin. Murşîd li dergahan ders didine murîdan. Ew merivên li rêya Xwedê ne û rêya Xwedê bi murîdên xwe dimînin. Di helbestan de hin caran peyva murşîd rasterast bi cih nabe û hin caran jî bi sembola tê kar anîn. Saqî, sembola murşîd e, ew bi hunera mecazî tê nivîsandin. Lê belê, li vir Seyîd Elî, peyva murşîdê kamil nivîsîye û şîreteke wiha kiriye: Destê xwe bavêjên dawa murşîdekî, ew ê her tiştên betal, bi we zanîbûn bide, bizanibin ku heq ew e. Merivên ku bêjên, ez ê bê murşîdê kamil nêzikî Xwedê me, ew kara jî pir muhal e, zor e.

Di tesewûfê de şêx, insanên kamil in, murşîdên kamil in. Li vir Seyda, rêya şêx û murşîdê kamil şîret dike. Di tesewûfê de insanê kamil payeya herî bilind e.

2.1.g. Mecnûn

Mecnûn, di dîrokê de, di çîroka Leyla û Mecnûnê de derbas dibe. Navê wî Kays e. Ji ber ku ew, sedema eşqa Leylayê dîn bûye, bi wî re mecnûn hatiye gotin.¹⁴⁰ Ew, sembola eşqê ye. Lê belê ew peşî li dû eşqa Leylayê, eşqa mecazî, ango eşqa beşerî ye. Paşe li çolê Leylayê dibîne, lê nas nake. Lê mixabin Mecnûn sedema ku eşqa Xwedê dîtîye, Leyla ji bîr kiriye. Di tesewûfê de jî mitesewif vê bûyerê tînin bîra meriv û xwe teşbîha mecnûn dikin. Yan jî bi wateya dîn bûnê biwêjê mecnûn di helbestên xwe de kar tînin.

Mecnûn, merivên di cizbeyê de ne. Xwedê ew merivan hilbijartine û ji xwe re kirine dost e. Ew welîyan, bi alîkarîyê Xwedê hemû mertebeyan derbas dibin û digihîjine Xwedê.

Di helbesta **Melayê Cizîrî** de sembola mecnûn:

Setweta Leylê yeqîn Mecnûn tepand

Wer ne Qeys naket beyabanê xelet¹⁴¹

Eşqa Leylayê, dilê Mecnûn şewitand, dîn kir û bi çolê xist. Eger ku Leyla nebûya Kays qet xeletê nedikir û bi çolê nediket. Mecnûn ji ber eşqa Leylayê dîn bûye, bi çolê ketiye, lê paşê lê hay bûye ku ew eşqa demborî ye. Eşqa Xwedê, eşqa heqîqî dîtîye. Melayê Cizîrî di vê risteyê de bi simbol û çîroka Leyla û Mecnûn

¹⁴⁰Uludağ, h.b, r.352.

¹⁴¹Turan, h.b., r.268.

armanca xwe diyar kiriye. Ew jî wekî Mecnûn ji ber eşqa îlahî dîn bûye û dilê xwe şewitiye.

Di helbesta **Mela Huseynê Bateyî** de sembola mecnûn:

Wekî mecnûnî dîn im ez
Wekî bilbil dixwînim ez
Heta kengî dimînim ez
Di zîndan û di hebsê de¹⁴²

Mele di derd û cefayê de her tim bêzar e. Ew cefa, ji wî re wekî zîndan û girtîgehê ye. Wê sedemê xwe teşbîha bilbil û mecnûn dike. Wekî ku bilbil her tim eşqa xwe dixwîne, ew ji her tim eşqa xwe dibêje. Wekî mecnûn ku sedema eşqa xwe dîn bûye, Mele jî, ji eşqa îlahî dîn bûye. Eşqa Xwedê ew ji dinê dûr kiriye. Lê ew rewşê heta kengê berdewam bibe ew nizane. Lewra eşqa Xwedê eşqa ebedî ye.

Di helbesta **Ehmedê Xanî** de sembola mecnûn:

Ew bû ku Zelîxayê îdînî di Yûsif da
Mecnûnê di Leylayê, Ferhadê di Şîrîn da¹⁴³

Ferhad, aşîqa Şîrînê ye. Dibêjin Şîrîn, jina Kesrayê duyemîn e, çîroka wan jî meşhûr e, di wêjeya kurdî û farisî de cîhekî wan bi taybetî û girîng heye. Yûsif, kurê Yeqûb pêxembere û Zelîxa jî, ezîzeyaya Misrê ye, ew jî aşîqa Yûsif Pêxember bûye¹⁴⁴

Zelîxayê ew nûr, di Yûsûf de, Mecnûn di Leylayê de, Ferhad di Şîrînê de dîtîbû, aşîqên wan bûn. Divê ew nûra ku wan dîtî, nûra Xwedê be. Ehmedê Xanî bi van çîrokan armanca xwe eşkere dike. Wekî ku ew aşîqan, aşîqa wan dilberan bûn, ez jî nûrê Wî dibînim û aşîqa Wî me.

Di helbestên **Pertew Begê Hekarî** de sembola mecnûn:

Ji agirê ‘işqa te her dem halê dîgergûn im ez
Helqeyê zulfa te ra serhelqeyê mecnûn im ez

Nîvcaneke min hebû ew bû ji derdan muzderib

¹⁴²Sadîni, *Mela Huseynê Bateyî*, b.n., r.156.

¹⁴³Durre, *Şerha Dîwana Ehmedê Xanî Felsefe û Jiyana Wî*, b.n., r.110.

¹⁴⁴Durre, h.b., r.160.

Way! Her yek lehze zêde izdirabefzûn im ez

Bestine min pîtê 'eqlê rişte yê sewda qewî

Lew bi sûret 'zûfinûn'ê sihr her efsûn im ez¹⁴⁵

Pertew Beg, di van risteyan de bi qafîya ez, teşbîhe dike û xwe hin caran dike efsûn û hin caran dike mecnûn. Mecnûn di tesewûfê de sembola eşqê ye, sembola ji ber eşqê dîn bûnê ye. Ew bi sedema agirê eşqa xwe, dîn bûye û bi çolê ketiye. Lê pişt re eşqa beşerî û mecazî çuye. Eşqa wî bûye eşqa Xwedê Teala. Helbestvan jî, li vir di agirê eşqê de wekî Mecnûn bûye. Ji wî derdî, ji derdî eşqê pir kul û derd kişandine. Ew nivê canê xwe ku maye jî, li vê rêyê bihurandiye. Ew rêya ku mitesewif dibêje fenafillah e.

Eceb aşufte û heyran e Perto

Mîsalê bilbilê baxan e Perto

Li şem' a 'arîzan heta sehergeh

Wekî perwane bêtaban e Perto

Nizanim ez tilisma sihra işqê

Wekî Mecnûn bêsamana e Perto¹⁴⁶

Di vê risteyê de dîsa Pertew Beg, bi sembola mecnûn eşqa xwe eşkere dike û dibêje ku ez di eşqê de wekî Mecnûn im. Wekî di, xwe teşbîha bilbil û perwaneyê jî dike. Bilbilê ku baxan heyran heyran dixwîne ew e. Perwaneya ku heta sehergeh li dor tîrêjan dizivire ew e. Bi van gotinên mecazî Pertew Beg, eşqa xwe îlahî diyar dike. Mecnûn aşîqa Leyla ye, bilbil li pey gule ye, perwane li dor şim'a ye, lê Perto jî, ji eşqa îlahî mest e, heyran e.

Di helbesta **Seyîd Elîyê Findikî** de sembola mecnûn:

Ez im Mecnûnê bê Leyla

Ketim ber pêl û ber seyla

Dikim hawar û waweyla

Meded Seydameded Seyda¹⁴⁷

¹⁴⁵Doskî, *Dîwan, Perto Begê Hekkarî*, b.n., r.166.

¹⁴⁶Doskî, h.b., r.293.

¹⁴⁷Dilovan, *Dîwan, Seyîd Elîyê Findikî*, b.n., r.83.

Seyid Elî, Mecnûnê bê Leyla ye. Ew aşiq e, ji ber eşqa xwe wekî Mecnûn dîn bûye, her dem hawar û waweyla dike, bê taqet bûye. Lê yara xwe wekî Leylayê li holê tune ye. Yara wî Xwedê ye û sedema ku bi çavên xwe nabîne dibêje, ez aşiqî bê Leyla me. Ji bo vê eşqê jî, ji seydayê xwe, ango ji şêxê xwe meded dixwaze. Seyid Elî, bi biwêja mecazî mecnûn eşqa xwe îlahî eşkere dike.

Di helbestên **Mela Nezîrê Bedewî** de sembola mecnûn:

Ji işqa sorgulê îro dibûm Mecnûn di salê da
Çi derb danî li min mîro eman xistim di çalê da

Felek dîsa hebîb kuştim bi derba awirên çeşman
Nizanim ku neyar ew bû ji mêj ev bû di dil wê da¹⁴⁸

Mele dibêje ku sedema sorgula min ez îro Mecnûn bûm, ango ez li rêya eşqa Xwedê dîn bûm. Ew li vê rê eza û cefa dibîne, av dikeve çavan, tê kuştin, li dinyayê tişteki fêm nake lê dîsa jî, ew ji eşqa xwe nabûhure. Dinê ji mirov re cihê îmtîhanê ye. Her tim derd û cefa hene. Mitesewif naxwazin ku derd û cefa xilas bibin. Mele jî, van derd û cefayan dihêjmire. Nizane çi bike. Wekî helbestvanên wêjeya klasîk yên din Mela Nezîr jî, ji ber vê eşqa îlahî, her tim dinale, dişewite, lê dîsa jî ew vê eşqê dixwaze.

Ez im pîrê di işqê da
Ez im mehbûs di qeydê da
Kezeb xweyn im di wê rê da
Ma qey hêj tu bawer nakî
...
Bi wî xakî ceger hûr bûm
Di işqê da muzeffar bûm
Wekî Mecnûn ezê har bûm
Li Leylayê ku loma kî¹⁴⁹

¹⁴⁸Doskî, *Dîwana Dahî, Mela Nezîrê Bedewî*, b.n., r.32.

¹⁴⁹Doskî, h.b., r.115.

Mele, di çarîna pêşî de dibêje ez pîrê eşqê me. Ji bo eşqa xwe pesnê xwe dide. Lê ew, hem mehbûs e, hem kezeb xwîn e. Ji xwendewanan re dibêje min bawer bikin, ez pîrê eşqê me.

Çarîna duyemîn de dibêje, ez ceger hûr bûm, lê di eşqê de muzaffer bûm. Wekî Mecnûn, ku Leylayê lewma dike, ez jî, ji vê eşqê lewma dikim.

Mela Nezîr, li vir bi xwe qure dibe û xwe pîrê eşqê dihesibîne. Dibêje ku ez di eşqê de muzaffer bûm. Ew gotin wekî gotinê Melayê Cezîrî ye. Melayê Cizîrî jî, bi xwe qure dibe û eşqa xwe dipesine. Mela Nezîr, wekî Mecnûn li ser vê eşqê mehbûs e, kezeb xwîn e. Her tim bi eşqa îlahî dijî.

2.1.h. Mey / Meyxane / Saqî

Mey, meyxane, saqî di tesewûfê de biwêjên mecazî ne û coş û peroşê eşqê diyar dikin. Mitesewif bi van sembolan eşqa îlahî eşkere dikin.

Meyxane cihên ku qûl ji Xwedê re eşq û bi kêf munacat dike re tê gotin. Mey, bi mecazî şerab û bade ye, lê di tesewûfê de coş û kelecana eşqê îfade dike. Saqî jî, bi mecazî merivên ku li meyxane şerabê belav dikin re tê gotin. Di tesewûfê de murşîdan re tê gotin.¹⁵⁰ Murşîd jî, li murîdên xwe eşqa Xwedê û agahiyên li ser Xwedê şîret dikin. Sedema ku Xwedê feyza mutleq û çavkanîye xoşewîstîyê ye, saqî Xwedê jî îfade dike.

Di helbestên **Melayê Cizîrî** de simbolên saqî, mey û meyxane:

Saqî ji ezel yek du qedeh bade bi min da

Hetta bi ebed mest û xumar û teles im ez¹⁵¹

Saqî, ji ezel de du qedeh daye Mele. Mele di ezel de heta ebed serxweş û bêhal e. Ango wî di ezel de, divê ku ew qalûbela de be, mezinahîya Xwedê dîtîye. Mele ezel de heta ebed li rêya Xwedê ye. Bezma elest de qûl Xwedêyî xwe nas kir. Mele vê nas bûnê, bi peyvên mecazî, di ezel de serxweş bûnê îfade dike. Ew ezel de aşîqa Xwedê bûye û ew eşqa yê heta ebed berdewam bibe.

Derê meyxaneyê 'îşqê seher 'arif ziyaret kir

Bi abê çeşm û xûnê dil wudû best û tehareet kir¹⁵²

¹⁵⁰Uludağ, h.b., r.366.

¹⁵¹Turan, h.b., r.98.

Merivêkî zanyar vexta berbang ser li meyxaneyê aşiqan xist. Aşiqan li vir şeraba eşqa îlahî vedixwarin. Armanca wî ku di hundurê meyxane keve û bi aşiqan ve eşqa îlahî vexwe. Lê aşiqan destûr nedan. Wî jî girî kir û bi histirên çavê xwe destnimêj girt. Dil xwîn bû û bi xwîna dilê xwe jî teharek kir. Mele bi van biwêjên mecazî, li pey eşqa îlahî bûnê xwe diyar kiriye.

Di helbestên **Mela Huseynê Bateyî** de sembolên saqî, mey û meyxane:

Qismet ji dîwana ezel
Mey da me saqî yek eded
Tasek ji xemra bê xelet
Ez kirime mexmûrê ebed
...
Zulfa ku tete ser milan
Çengal e tavêjî dilan
Qir kir te ehlê Berçelan
Dad û meded dad û meded¹⁵³

Melayê Bateyî, li vir bi biwêjên tesewûfî yê mecazî “mey, saqî, xemr, mexmûr, dil, zulf” eşqa tesewûfî bikar anîye. Di dîwana ezel de saqî tasek mey daye Bateyî û heta ebed mexmûr kiriye. Zulfan jî çengal avitîye ber dilê wî ye û ew meded dixwaze. Divê ew bûyera ku Bateyî dibêje di ezel de bûyera bezma elest be. Li wir Xwedê dîtîye û soz daye. Ji vê rojê vir de ew bi eşqa îlahî mest û mexmûr e.

Mey, heqîqeta Mihemmedî ye û feyza îlahî ye. Saqî, rêber e, murşîd e. Meyxane, tekya ye. Zulf, kesret e, piranî ye. Ew zulfan jî dibin yek û wehdeta Xwedê derdixin holê. Dîwan jî bezma elest e. Bi van peyvên, helbestvan eşqa îlahî ya ezel de heta ebed eşkere kiriye.

Aşiqê zulfa reş im
Aşiqê şeyda ye zulf
Bê bade lew serxweş im
Serxweşê şeyda ye zulf

¹⁵²Turan, h.b., r.32.

¹⁵³Sadinî, *Mela Huseynê Bateyî*, b.n., r.117.

Serxweş im ez vê demê
Kefîme tora xemê
Kuştîme vê berçemê
Çîçek û rena ye zulf¹⁵⁴

Melayê Bateyî aşîqa zulfa reş e. Meriv bi meyê serxweş dibe. Lê Mele, li vir bi şeydayê zulfa reş serxweş e. Berçemê dilberê jî wî aşîqî dikujin. Ew zulf, berçem dîsa mecazî ne û divê ew sifetên Xwedê îfade bikin. Mela Huseynê Bateyî, bi van biwêjên tesewûfê dîsa eşqa xwe îlahî diyar dike.

Di helbesta **Feqiyê Teyran** de sembolên saqî, mey û meyxane:

Îro ji dest husna hebîb
Sergeşt û heyranîm ez
Min eşq û muhbet bûn nesîb
Sewadayê sergerdan im ez

Bilbil im daîm dixwînîm
Ez yaqîn ez te dibînîm
Dîn dibim sewda dimînîm
Serxweş û sekran im ez¹⁵⁵

Feqiyê Teyran, li vir rewşa xwe dibêje. Ew bi heyranîyê ji husna dilberê serxweş e. Eşq û muhebet ji wî re nesîb bûne. Paşê risteya duyemîn de dibêje ez jî bilbil im. Xwe teşbîha bilbil dike. Diyar e ku bilbil bi berdewamî li pey eşqa xwe ye.

Bilbil aşîqa gulê ye. Bilbil dema were nav gulistanê, aciz dibe. Lê di nav gulistanê de texlîtên gulan cuda cuda hene. Bilbil li ser wan geredor dibe û gula xwe nabîne. Bilbil, ne evîndarê gulistanê ye, ew evîndarê gulê ye. Her tim eşqa xwe gulê dixwîne. Aşîq jî, mitesewif jî her tim, bi bade û mey û armanca eşqa Xwedê dijîn. Helbestvan jî dibêje ez wekî bilbil im, daîm behsa eşqa xwe dikim, li rêya sewdaya xwe dîn dibim û serxweş dibim.

¹⁵⁴Sadinî, h.b., r.119.

¹⁵⁵Sadinî, *Feqiyê Teyran*, b.n., r.127.

Di helbesta **Ehmedê Xanî** de sembolên saqî, mey û meyxane:

Meyxane bihişte, Hûre Saqî
Kewser Mey e lew Me bade noşîn
Bê hûdene lafê lew ku Xanî
Dunya kirr ô axîret firoşîn¹⁵⁶

Meyxane wekî bihuştê ye. Bihuştê hurî hene û hemû xwarin û vexwarinan ew belav dikin. Saqîyên ku li meyxane meyê belav dikin jî wekî hûrîyan in. Dîsa wekî ku li bihuştê ava Kewserê belav dikin, li meyxaneyê jî meyê belav dikin.

Ehmedê Xanî li vir bi sembolên tesewûfê mecazî armanca xwe eşkere dike. Saqî û hûrîyan wekî hev in, mey û ava Kewser jî wekî hev in, van teşbîha hev dike. Paşê dibêje, ey Xanî! laf û gotin, qîl û qal, beredayî û bê fayde ne. Ew rastîyeke ku em xeletê dikin, em dinyayê dikirin û axîretê jî difroşin. Ango em her tim jî dinê re dişuxulin, ji axretê re tiştêkî nakin.

Di helbestên **Mela Mihemedê Liceyî** de sembolên saqî, mey û meyxane:

Were ey can bibe ‘aşiq
Vexwe camek
Di sohbet rûne dil sadîq
Bibîn esrarê rehman e.

Ji Tûrê qelbê wek şem’e
Bi sîne çû giha lem’e
Bûye medhûş û bê sem’e
Wekî Mûsa binî ‘Îmran e

Di vî ‘esrî mebe xafil
Meborîn ‘umrî bê hasil
Vexwe meya nahil
Ji destê pîrê meyxanê¹⁵⁷

¹⁵⁶Durre, h.b.,r.141.

¹⁵⁷Doskî, *Dîwana Hadî, Mela Mihemedê Liceyî*, b.n., r.30.

Peyvên ku Seydayê Liceyî di vê helbestên xwe de bi kar anîn sembolên tesewûfê ne an sembolên wêjeya klasîk in. Ew peyv, “meyxane, camek meya raik, meya nahil, aşiq”xuya dikin. Meyxane, di wêjeya klasîk a kurdî de sembola dergahê ye, tek ye ye, ew mecazî ye. Ew dergah cihê tesewûfê ye. Aşiq, murşîd e, şêx e. Ew li rêya Xwedê ye. Mey, cam jî xwendina murîd in.

Mela Mihemedê Liceyî, di çarîna yekemîn de deng li mirovan dike û wiha şîret dide. 'Were dilê sadiq li sohbetê rûne, lê sohbetê guhdarî bike û bibe aşiq.' Çarîna duyemîn de Mele, bûyera Hezretî Mûsa ya ku li çiyayê Tûrê bi Xwedê re axaftî tîne bîra meriv. Wekî ku Mûsa li çiyayê Tûrê Xwedê dîtî û pê ewle/medhûş bûyî, tu jî Wî bîne. Çarîna sêyemîn de jî armanca xwe dibêje û şîretan dike. Jîyana xwe de mebe xafil û mebe êsîr, 'umrê xwe bi poşmanî derbas meke, ji destê pîrê meyxane mey vexwe, anga ji pîrê dergahê li sohbetê guhdarî bike. Bi van şîretên Mele û bi biwêjên tesewûfê, bandora tesewûfê eşkere dibe.

Sed ah û ah sed ah û ah
Ey mihr û mah û qutb û şah
Mame xerîb û rusiyah
Imdad bike lew serwerî

Îro riya meyxaneyê
Binbere min dîwaneyê
Da mey vexwûm ji xûmxaneyê
Berba bikim derdê serî¹⁵⁸

Di tesewûfê de aşiq, li rêya Xwedê her tim ah û ah dikişîne û dîsa jî, dev ji eşqa xwe ber nade. Seyda li vir ahê dikişîne û xerîbiya xwe diyar dike. Ji qutbê mezin, anga ji şêxê xwe, îmdad dixwaze. Ew qutba li meyxanê meyê vedixwe, anga li dergahê agahdariyên li ser rêya Xwedê û li ser eşqa Xwedê dide.

Di wêjeya tesewûfê de meyxane, xûmxane, mey biwêjên ku gelek cih digrine û Mela Mihemedê Liceyî jî, eşqa îlahî bi van sembolan kar anîye.

¹⁵⁸Doskî, h.b., r.79.

Di helbesta **Şêx Mihemed Hadîyê Qewmanî** de sembolên saqî, mey û meyxane:

Saqî tu lez ke bîne
Pîrê me meyhebîne
Şer'a wî rê dibîne
Tehqîq ev e li ba me

Ey 'abîdê perîşan
Camek meya dilqeşan
Bigre ji destê êşan
Bighêje her meqame¹⁵⁹

Şêx Qewmanî, çarîna yekemîn de, saqî re dibêje ku meyê bi lez bîne. Ew pîrê mest û rindan e. Dibêje, bi cam û fîncan, cîsm û cesed îhya bike. Ew pîrê me, li ba me tehqîq e. Hemû gotinên wî rast in.

Çarîna duyemîn de jî deng li qûlê feqîr û perîşan dike û ji wan re şîretan dide. Dibêje, camek mey, ji dest pîr bigrin û bigihîjin her meqame. Mey, cam, mest, pîr, saqî li vir sembolên mecazî ne û bandora tesewûfê bi wateya van peyvên eşkere dibe.

Meriv van sembolan dikare wiha şerh bike: Saqî, murşîd e û li medresan û dergahan dersê melatî û feqiyê dide. Mey gotinên wî ne. Agahiyên ku murşîd dide re tê gotin. Pîr şêx e, murşîd e. Her meqam jî, mertebeyên tesewûfê ne.

Ebu Nasr Abdullah b. Alî Serrâc Tûsî di pirtûka xwe 'El-Luma' de heft mertebeyên tesewûfê dibêje: tewbe, wer'a, zuht, fexr, sebir, tewekûl, riza.¹⁶⁰

Seyda, di van çarînan de bi van sembolên mecazî, rêya tehqîq û mertebeyên herî bilind ji xwendevan û mûrîdê xwe re pêşkeş dike.

Di helbesta **Mela Nezîrê Bedewî** de sembolên saqî, mey û meyxane:

Me di dil de heye narek tu ji pêtan meke behs
Ez dinûşim mey ji camê tu ji rengan meke behs
...
Sed û yek carî kiramet ku di dil de te hebit

¹⁵⁹Seydaoğlu, h.b., r.42.

¹⁶⁰Tavvakoli, h.b., r.75.

Bide şukrek bo Îlahî tu bi lîsan meke behs¹⁶¹

Mele, di risteya yekemîn de dibêje ku, di dilî min de agirek heye, tu ji pêtan meke behs, pêtê agir ez zanim. Lewra di dilî min de agir heye. Ez her tim di camê de mey vedixwim. Ez rengê meyê zanim, tu ji rengan behs meke. Rengê wan sor e, rengê şerabê ye. Ew li vir xeta û gunehên xwe jî eşkere dike. Mey, cam, agir biwêjên mecazî ne. Dibêje ku ez wekî agir di nav eşqa îlahî de me, her tim wekî meyê, eşqa îlahî vedixwim. Di jiyana min de eşqa îlahî heye.

Di risteya duyemîn de dibêje, ku çiqas keramet hebe jî, bi zimanên xwe behs meke, kerametan veşire. Ji Xwedê re şukr bike û ji kerametan behs meke. Keramet ji Xwedê Teala ne. Welîyên, aşiqên Xwedê Teala xwedîyên kerametan in.

Di terîqet û tesewûfê de ku keramet eşkere dibe, li holê radibe. Xweşikî ji dilberê ye, ne ji dûr û yaqut e. Ango Xwedê bi zatê xwe xweşikî ye.

2.1.i. Munacat / Dia

Munacat û dia, li ber Xwedê gerîyane, halî xwe ji Wî re niyaz kirine. Qûl daxwaza xwe ji Xwedê re diyar dike. Hemû tiştan û alîkariyê ji Wî dixwaze. Munacatan de mitesewif pêşî pesnê Xwedê didin û dû re miradên xwe ji Wî dixwazin. Diayê gel bi ziman dibe, lê diayê mitesewifan, zahidan bi çalakîyên wan dibe. Dia, bêrîkirina Xwedê ye.¹⁶²

Di munacat û dia de mitesewif berê sifetên Xwedê dihêjmirin, anga Xwedê zikir dikin û paşê daxwazên xwe pêşkêş dikin. Dîsa di munacatan de mitesewif Xwedê bi yekîtiyê û sifetan dipesinîn û sadiqîyên xwe dibêjin.

Di helbestên **Melayê Cizîrî** de simbolên munacat û diayan:

Ya Reb ji çî rû leb bi senaya te kuşayem

Subhaneke len uhsiye fî şe'nike hemda¹⁶³

Ya Reb bi çî awayî ez lêvên xwe vekim û ji te re medh û sena bikim. Tu ji hemû kêmasîyan dûr î. Ez hemd û senayê derbarê te de nikarim bêjim. Bi peyva “Subhaneke” diayê mezin dike. Me’neya vê biwêjê ew e: Ya Reb hemû kêmasî ji te

¹⁶¹Doskî, *Dîwana Dahî, Mela Nezîrê Bedewî*, b.n., r.32.

¹⁶²Uludağ, h.b., r.384

¹⁶³Turan, h.b., r.206.

dûr in. Mele li vir munacata Xwedê Teala dike. Bi hemd û sena li ber Xwedê digere, lê dîsa jî dibêje ez nizanim bi çi awayî li ber te bigerim.

Di helbestên **Mela Huseynê Bateyî** de simbolên munacat û diayan:

Ya Îlahî tu kerîm î
Tu xefûr î tu ezîm î
Ji ezel da tu qedîm î
Melikê seqfê sema yî

Tu wekîl î tu delîl î
Tu ezîm î tu celîl î
Tu ezîm î û cemîl î
Bi tekebbur tu siza yî ¹⁶⁴

Melayê Bateyî, di van çarînan de li ber Xwedê digere. Bi sifetên Xwedê ve munacata Xwedê dike. Li gor wî Xwedê hemû sifetan di xwe de dicivîne. Mele li vir van sifetên Xwedê dihêjmire. Ew kerîm e, ezîm e, xefûr e, hekîm e, qedîm e, wekîl û delîl e, celîl û cemîl e, melîkê sema ye. Hemû hebûnan hewceyî Wî ne, lê hewcedarîya Wî bi kesî tune ye.

Elem çi ye muhebbet e
Derman sebr û sekînet e
Ya Reb bikey bi qismet e
Ya Reb tu yî dermanê min

Vê elemê derman bike
Sirra ezel zahir bike
Daxa dilan hasil bike
Ya Reb tu yî dermanê min ¹⁶⁵

Mele, di van çarînan de peşî pirsra elemê dike. Peşî dibêje, “Elem çi ye” paşê jî bi xwe bersiv dide: Elem muhebet e. Ew muhebeta Xwedê ye, dermanê wê muhebetê jî, sebr û sekînet e. Ew derdekî xweş e. Aşiq ji wî derdî eza û cefa dikişîne

¹⁶⁴Sadinî, *Mela Huseynê Bateyî*, b.n., r.52.

¹⁶⁵Sadinî, h.b., r.73.

û dîsa jî wî dixwaze. Ango, derdê eşqê baş e. Reb, hem derd û hem derman e. Dermanê elemê ji Xwedê ye.

Mele ji Xwedê re dia dike û dibêje, ya Reb, elemê derman bike, sirra ezel jî eşkere bike. Sirra ezel divê qalûbela be, yan ji afirandina dinê û mirovan be. Daxa dilan jî tu derman bike. Dermanê min jî Tu yî. Bi van munacatan bandora tesewûfê li vir eşkere dibe.

Di helbestên **Ehmedê Xanî** de simbolên munacat û diayan:

Ey xaliqê erd û asîmanan
Way faliqê cumle îns û canan

Mulk û melek û felek bi carek
Bîlcumle te çêkirin tebarek¹⁶⁶

Xanî, di van risteyan de dia dike. Sifetên Xwedê Teala diyar dike. Xwedê erd û ezman, îns û canan ji tunebûnê xelkkirine. Mulk jî, felek jî, bi carekê re wî tebarekî çêkiriye. Daxwazên wî jî, ji xaliqê xwe ne. Hemû heyîn Wî afirandine û hemû hebûn digihîjine Wî.

Yareb, Tu dizanî Xanîyê jar
Teşbîhê bi xameya giriftar
Qelbê wî di dest Te da ye Elheq
Destê wî di dest xwe nîne mûtleg¹⁶⁷

Dema ku meriv helbestvanên wêjeya klasîk ya kurd dinêre, sedema ku di bandora tesewûfê de ne, ew merivên mitesewif in, bi piranî bi dia û munacatan dest bi helbestên xwe dikin. Xanî jî, dîsa li vir, bi vî awayî dest pê dike.

Dibêje, ya Rebî, ez qesem bi zatê Te dikim! Tu rewşa Xanîyê belengaz û jar dizanî. Meqseda Xanî, ji sipîyê û reşayîyê Tu yî. Nîyeta wî Tu yî. Her tiştên wî bi Te ne, ji bo Te ne. Xwedê wî zane, qelbê wî di dest Xwedê de ye.

Di helbesta **Pertew Begê Hekarî** de simbolên munacat û diayan:

Ya reb bi fixanê bulbulan kî

¹⁶⁶Semrexî, h.b., r.20.

¹⁶⁷Durre, h.b., r.14.

Ya reb bi teraweta gulan kî

Ya reb tu bi ‘işqa ‘aşiqan kî

Ya reb tu bi sidqa sadiqan kî¹⁶⁸

Pertew Beg, di berhema xwe Dîwan'ê de beşa “Sernameyi Fethê” de bi vî awayî li ber Xwedeyî xwe digere. Hemû rêzan de bi nidaya “Ya reb” dest pê dike. Ew diayan bandora tesewûfê li vir eşkere dikan.

Pertew Beg dixwaze ku Xwedê di eql û gotinê hemû merivan de hebe. Fîxanê bilbilan jî, teraweta gulan jî, sidqa sadiqan jî, işqa aşiqan jî Ew be.

Di helbestên **Mela Xelîlê Sêrtî** de simbolên munacat û diayan:

Bi Qur'an û Zebûr hindê kîtaban

B'e hedîs û kalamê mustetaban

‘Efû kî tu minê bêçare miskîn

Nekî behsa gunahê min bi te'yîn¹⁶⁹

Mela Xelîl, di nav mitesewifên kurd de gelek navdar e. Di helbestên xwe de daîm ji meseleyên îman û tesewûfê behs dike. Di van malikan de ji Xwedêyî xwe re dia dike. Gunahê xwe efû dixwaze; lê vê jî, hem bi hedîsê pêxember (s.x.l.) û kalamên welîyullah, hem jî bi Qurân û kîtabên semavîyê din dike navbeynkar û ji Xwedê dixwaze. Li vir, Mele bi bêjeya Zebûr û bi bêjeya kalamê mustetaban, kîtêbên Xwedê û pîrên li rêya Xwedê tîne bîra meriv. Ew bêjeyan heman bi temamî tesewûfî ne.

Tu yî meqsûd û metleb ya îlahî

Bi xeyrê te nehî min qet guwahî

Ridaa te dikim hêvî bidî min

Nekî Şeytan û nefsê rehberê min¹⁷⁰

¹⁶⁸Doskî, *Dîwan, Perto Begê Hekkarî*, b.n., r.63.

¹⁶⁹Adak, h.b., r.161.

¹⁷⁰Adak, h.b., r.161.

Meqsûd û metleba mitesewif, razîbûna Xwedê ye. Mele jî, di van risteyan de vê meqsûda xwe derdixê holê. Bi xeynî Xwedê Teala qet tiştêkî din naxwaze. Hêvîyê ji Xwedê dike. Dîsa rêza paşê, diayê xwe berdewam dike û ji Xwedê dixwaze ku nefsa û şeytên neke rêberê wî. Bi van peyv û wateya ku helbestvan bi cih tîne, bandora tesewûfê di van risteyan de baş xuya dike.

Di helbesta **Mela Mihemedê Liceyî** de sembolên munacat û diayan:

Ya Reb çî dibit ger bi me dî îro tu tewfîq
Da ji çaha wucûdê biderîn pak û bi tezwîq

Lew ‘umr bi xeflet çû û nefsa ma denes û pîs
Der qeydê hewa û hewesî maye bi tewsîq¹⁷¹

Mele ji Xwedêyî xwe re dia dike û îro ji tewfîq dixwaze. Alîkarîyê ji Xwedê dixwaze. Lewra, ku meriv çî bixwaze, divê ku ji Xwedê bixwaze. Ew xwastina wî razîbûna Xwedê ye. Jiyana ku xefletê de be, li rêya Xwedê yê hişyar bibe. Pak bûna nefsa pîs jî li rêya Xwedê ye. Dia ji Xwedê re ne. Mele jî vê sedemê dibêje, ya Reb û ji Rebê xwe re dia dike.

Di helbesta **Seyîd Elîyê Findikî** de sembolên munacat û diayan:

Eya Rebbî rîcakar im
Li dergahê te zarzar im
Ji mîlakê birîndar im
Birîna min tu dermankî

Eger çenda gunehkar im
Nezan û pir ne guhdar im
Ji rehma te xeberdar im
Bi rehma xwe min dilşakî¹⁷²

Seyîd Elîyê Findikî, munacata Rebbê xwe dike. Bi xwe jî bêzar e, birîndar e, gunehkar e. Ji Rebbî xwe dermanekî û alîkarîyekê dixwaze. Ew Rebba, Rehîm e,

¹⁷¹Doskî, *Dîwana Hadî, Mela Mihemedê Liceyî*, b.n., r.137.

¹⁷²Dîlovan, *Dîwan, Seyîd Elîyê Findikî*, b.n., r.33.

Xeffar e, Settar e. Wekî hemû munacatan Seyîd Elî jî, sifetên Xwedê Teala dihêjmêre. Ew ji Xwedêyî xwe hemû hewcetiyê xwe dixwaze û wiha dibêje: Ya Rebbî, bi taybetiya van sifetên xwe, ji qûlê xwe re alîkarîyê bike. Ji rehma te ez xeberdar im. Bîrîna min Tu derman bike. Bê Te kesekî ku me efû bike tune.

Di helbestên **Mela Nezîrê Bedewî** de sembolên munacat û diyan:

Heta kengî bikim zarî
Ji ber qebra reş û tarî
Dil û canê me xwîn xwarî
Feqet pur xiste me ya Reb

Fila tebkî aya Dahî
Li ser wî zatê wek mahî
Çi sorgul bû bi tebahî
Nezîr bêçare me ya Reb¹⁷³

Mele, xemgîn e. Dibêje, dil û canê min xwîn e. Ji dest mirina ku li pêşiyê me û qebra reş û tarî, her tim ez zarî dikim. Ji Rebbî xwe re dia dike. Çarîna duyemîn de jî, ji dest sorgul û zatê wekî mahî, dîsa ji Xwedê alîkarîyê dixwaze. Mele Nezîrê Bedewî jî helbestvanekî alim û mitesewif e. Dil û canê wî di xwîne de ne, le dîsa ew eşqa Rebbî xwe dixwaze.

Mîn go ez pur dinalim dixwazim yek tewafê
Destûr bide ji lutfê ezê bibim emirber
...
Ya Reb bike heqîqî ‘işqa di qelbê min de
Da ku herim ez vexom yek tas ji ava kevser¹⁷⁴

Mele li vir, ji Xwedê eşqa heqîqî dixwaze. Bi vê eşqê ve ew ê biçe bihuştê ye û tasek ava kewser vexwe. Di tesewûfê de hemû eşqên mecazî veduguhêrên eşqa îlahî. Van risteyan de jî cara peşî Mele Nezîr deng dide û lutfê dixwaze. Bi taybetî ew lutfa Xwedê ye. Ew lutfa yê wî bigihîjine Xwedê ye. Pişt re ew, ji Xwedê re dia

¹⁷³Doskî, *Dîwana Dahî, Mela Nezîrê Bedewî*, b.n., r.35.

¹⁷⁴Doskî, h.b., r.63.

dike. Dibêje kerem ke, ango eşqa min bersiv bide. Bi vî awayî eşqa heqîqî di qelb de, qelbî wî de bi cih dibe.

2.1.î. Murîd / Murşîd

Merivên ku nû ketî terîqetê re murîd tê gotin. Merivên ku di terîqetê de ders didin talebeyan, ango ders didin murîdan jî murşîd in.

Murîd, yên ku bi îradeya xwe hereket nakin re tê gotin. Murîd ferman û îradeya murşîdên xwe tînine cih. Bi her awayî pêş şêxê xwe diçin. Murîd di murşîdê xwe de fanî dibin. Bi vê rewşê re fenafîşêx tê gotin. Murîd nefsa xwe û îradeya xwe li holê radikin. Bi îrade û dixwaziyên şêx hereket dikin. Murîd, xelatiyên şêx ji rastiyan xwe çêtir digrin. Bi şêx re yek dibin.¹⁷⁵

Murşîd jî şêx in, rêber in. Rêya rast bi murîdê xwe dimînin. Murşîd, bi navên welî, şêx, pîr, ebdal jî bi nav dibin. Murşîd, ji murîdên xwe re wekî nêrdewanan in. Murîd bi van murşîdan bilind dibin. Dîsa murşîd wekî mûma nin, bi xwe dişewitin, lê derûdorê xwe ronayî dikin. Mitesewif di helbestên xwe de li murîdan şîretan dikin û bi vî awayî jî bandora tesewûfê xuya dike.

Di helbesta **Feqiyê Teyran** de sembola murîd û murşîd:

Hemd û sena heqq e li me
Bêhedd û bêqiyas bikin
Zikr û îbadet lazim e
Cehda terîqa ras bikin
Roja qiyamet qaîm e
Ta'etek pir esas bikin¹⁷⁶

Xwedê Teala mirovan li vê dinyayê her daîm îmtihan dike. Ji van ezmûnan yek ya muhîm li ser ta'et û îbadetê ye. Feqiyê Teyran di van rêzan de ta'eteke pir bi esas dixwaze û murîdan şîret dike. Dîsa dibêje ku ji Xwedê re bê hed û qiyas hemd heqê me ye. Heta roja kiyametê zikr û îbadet lazim e. Mitesewif di helbestên xwe de ji gel û murîdê xwe şîretan dikin. Feqiyê Teyran jî, li vir şîretan dike.

¹⁷⁵Uludağ, h.b., r.388.

¹⁷⁶Sadinî, *Feqiyê Teyran*, b.n., r.109.

Di helbestên **Ehmedê Xanî** de sembola murîd û murşîd:

Şêx û murîd û salikan, şah û feqîr û malikan

Cust û çeleng û çapikan dilket û bende payê zulf¹⁷⁷

Salik û şêx rêberên teriqeta ne. Murîd jî hemû kar û gotinên ku şêx dibêje dikin. Dilê şêx, murîd, salik, şah, merivên feqîr û merivên dewlemend yê hemû ketîye zulfên yarê ye. Zulfên yare hemû dest û ling û dil û canê wan bi xwe ve girêdaye. Zulf mecazî ye û li vir eşqa Xwedê îfade dike. Hemû kes aşiqên Xwedê ne û li pey vê eşqa xwe girêdayîne. Bi biwêjên şêx, murîd û salik bandora tesewûfê eşkere dibe.

Di helbestên **Mela Xelîlê Sêrtî** de sembola murîd û murşîd:

Tu guhdêr e nitq û beyana fesîh

Ji bo ferz û eynan e merdê melîh

Ku îman û islam û sewm û selat

Li ser malîdaran e hec û zekat¹⁷⁸

Mele, di van malikan de ferzên îman û îslamê diyar dike. Di beyanên fesîh de, ango di îlm û beyanên alîm û şêxan de ew ferzên misilmanîye hene. Bondora tesewûfê bi wan biwêjên tesewûfî pêk tê. Mele Xelîl, murşîd e, ji xwendevanên xwe re şîretan dike. Dibêje, hun guhdarî bikin. Rojî û nimêj hemû misilmanan re ferz in. Hec û zekat jî li ser merivên dewlemend ferz in.

Ji dest nefsê bi gazind im bi kovan

Ewê sebr û qerar nayê çu gavan

...

Xudê me'w we ji dest nefsê xilas kit

Bi destê şêxekî murşîd fena kit¹⁷⁹

Mela Xelîlê Sêrtî li vir nefsa xwe gazind dike û murîdên xwe hişyar dike. Ew nefs her tim rêya xelat bi merivan dimîne. Ew sebrê nade, mirovan her tim biqerar dike. Ji ber vê nefsê Mele, ji Xwedêyî xwe alîkarîyê dixwaze. Dibêje, Xwedêyê min,

¹⁷⁷Durre, h.b., r. 313.

¹⁷⁸Yavuz, h.b., r.1.

¹⁷⁹Adak, h.b., r.157-159.

me ji dest vê nefse xilas bike. Mele dizane ku ew xilas kirina jî, yê bi destê şêxekî be. Ew şêxekî murşid jî, daxwaza Mele ye. Murşid rêya Xwedê bi murîdan dimînin û rêya wan ronahî dikin.

Di helbestên **Mela Mihemedê Liceyî** de sembola murîd û murşid:

Gunehkar im birîndar im
Ji destê nefse bêzar im
Feqîrhal im niyazdar im
Meded Geylaniyê Sanî

Xwedê daye te ev rutbe
Ez im Qitmîrê ev 'utbe
Bi te çêbûne gumrah î
Meded Geylaniyê Sanî¹⁸⁰

Mela Mihemedê Liceyî, li rêya terîqeta Qadîrîyê ye û li rêya Şêx Evdilkadir Geylanî ye. Şêx Evdilkadir Geylanî mitesewîfekî navdar e. Nave wî di nav mitesewîfê yekemîn de tê gotin.

Mele, li vir peşî rewşa xwe pêşkêş dike. Ji dest nefse bêzar û gunehkar e, birîndar e. Ji dest bêzarê û feqîriyê, ji Şêx Geylanî alikariyê dixwaze. Ew rutbeya şêx, Xwedê daye şêx e. Ez jî Qitmir im. Bi bêjeya Qitmîr, çîroka Eshabê Kehf tîne bîra xwendevanan. Qitmîr, kûçikê Eshabê Kehf e. Mele, xwe li vir vekî Qitmîr dike û ango dibêje, şêxê min ez kûçikê ber derî te me. Ez ji Şêx Geylanî meded dixwazim. Şêx murşidê terîqatan in, biwêja murşid li vir xuya dike. Lê belê biwêjên terîqet û şêx jî bandora tesewîfê eşkere dikin.

Îmam Xezalî ew rutbe 'alî
Xweş soft lualî got wî bi delalî
Dê ji dest emîran hem jî debîran
Kasid be ev dîn ew weqte ev hîn¹⁸¹

Îmam Xezalî, mitesewîfekî mezin e. Mele qala wî sofî dike û dibêje ku rutbeya wî alî bû, bilind bû. Mirovên dema wî hemû di bin bandora wî de bûn.

¹⁸⁰Doskî, *Dîwana Hadî, Mela Mihemedê Liceyî*, b.n., r.41.

¹⁸¹Doskî, h.b., r.147.

Seydayê Lîceyî, peşî Îmam Xezalî nîşan dide. Ew mirov, murşîd e, şêx e, wê sedemê bandora tesewûfê xuya dike. Mitesewif bi piranî, di bin bandora mitesewifên navdar de dimînin. Li vir jî bandora Îmam Xezalî eşkere dibe.

Di helbestên **Şêx Mihemed Hadîyê Qewmanî** de sembola murîd û murşîd:

Hey wax li min hey wax li min
Dîn rabûye çûye jibin
Em şîn bikin tev mêr û jin
Hey wax li min dînê mubîn

Ey yar û ehbab û biran
Wer hûn birêjin hêstiran
Dîn dan bi zêran û peran
Hey wax li min dînê mubîn¹⁸²

Hemû mijarên Şêx Hadî, tesewûfî ne. Li ser şêxan û rêya Xwedê û misilmantîyê ne. Di van çarînan de jî Şêx Hadî, sedema ku mirov ji destûrên dîn dût ketine ax û wax dike. Dibêje, em mêr û jin tev şîn bikin, dîn ji bin ve rabûye, çûye. Hey wax li min. Çarîna duyemîn de dîsa, gazî li yar û ehbab û biran dike. Dinê hemû bûye aborî ye û pere û zêr e. Şêx Hadî, bi vî awayî murîdan û gel hişyar dike.

Seyda di subh û şaman
Mey da bi tas û caman
Her kes gehand meqaman
Îmdad û gazî seyda

Gerçî hezarê Loqman
Derdê me nakî derman
Ez xeyrê Şahê Qewman
Îmdad û gazî seyda¹⁸³

Di terîqetê de seyda, sedema ku ders û perwerdehîyê dide, ew wekî saqî ye. Saqî, digere ava jîyanê belav dike. Li pir cihîyan jî peyva saqî derbas dibe. Li vir bi

¹⁸²Seydaoğlu, h.b., r.38.

¹⁸³Seydaoğlu, h.b., r.61.

rastî gotiye Seyda, pişt re sembolên tesewûfê mecazî, mey û cam bi kar anîye. Seyda bi van mey û caman pir kesan digihîjine meqaman û wekî Loqman derdên wan derman dike. Ji ber vê jî Şêx Hadî berdewam dibêje, îmdad û gazî seyda. Peyva seyda jî wateya peyva murşîd digre naveroka xwe, ew jî biwêja tesewûfê ye.

Di helbestên **Seyîd Elîyê Findikî** de sembola murîd û murşîd:

Heqîqet em nebûn dostê heqîqî
Ji lew sarî dixweyhê ji herdu alî

...

Ne ez dost im ne yek min dî ji dostan
Çawa ku gotî Îmamê Xezalî ¹⁸⁴

Seyîd Elî pêşî heqîqeteka muhîm diyar dike. Heqîqeta muhîm ew e. 'Li vê dinê mirov, ji her du alî ve bi hev re nabin dostê heqîqî. Ehbabiyê dinê heta merzel e.' Pişt re gotina Îmam Xezalî eşkere dike. Îmam Xezalî gotîye, dostên heqîqî min li vê dine nedît. Ango dostê heqîqî Xwedê ye. Seyda li rêya Îmamê Xezalî ye û Îmam Xezalî murşîd e. Li dostên heqîqî digere û murîdên xwe û gel jî hişyar dike. Bi murşîdê mezin Îmam Xezalî û şîretên wî ve, li vir bandora tesewûfê eşkere dibe.

‘Eli rabe waha na bê,
Bi hîl u pîla çênabê,
‘umir borî mirin ha bê,
Çira tevbîrekî nakî?

Ev e ‘umrê te çil sal e,
Te ne milk e, ne pertal e,
Xweli li ser te qebir mal e,
De ka ti kengê peyda kî?¹⁸⁵

Dinê fanî ye. Merivên ku li vê dinê dijîn, yên demek şûn de bimirin. Seyda li vir, deng li xwe dike û li ser vê dinyaya derewîn şîretan li xwe dike. Dibêje, bi hîl û pîlan jiyana derbas nabe, jiyana kurt e, hebe çil sal e, mala meriv qebir e, çawa

¹⁸⁴Dîlovan, *Dîwan, Seyîd Elîyê Findikî*, b.n., r.57-59.

¹⁸⁵Dîlovan, h.b., r.25.

tedbîrekî nakî. Seyîd Elî, tedbîra vê mirine dibêje û li murîd û xwendevanan şîretan dike. Ew tedbîra jî li rêya Xwedê bûn û li pey eşqa Xwedê çûne.

Murada me j'xewê ey can
Çewa gotî Feqhê Teyran
Ew e her xefleta qelban
Ne ku zahir tu me'na kî

Ew e tedbîr bikî tewbê
Bi nefsê ra bikî herbê
Ji destê te heta hew bê
De ka tu xwe xilas nakî¹⁸⁶

Seyîd Elfyê Findikî, helbestvanê navdar Feqiyê Teyran di mijara xwe de bi cih dike. Çawa ku Feqiyê Teyran gotîye, razebûn xefleta qelban e. Seyda jî li ser vê xefletê qelban wiha dibêje: Razebûn meneya mecazîye û ew jî xefleta qelban e, lê razebûn bi meneya heqîqî Xwedê Teala nas nekirin e.

Seyda çarîna duyemîn de tedbîra xefleta qelban dibêje. Tedbîr jî, dîsa heta ku ji dest meriv tê, bi nefsê xwe re herb kirin û ji Xwedê re tewbe kirine. Seyîd Elî dîsa li vir murîdan û gel şîretan dike. Ew şêx e, murşîd e.

2.1.j. Terîqet / Şêx

Terîqet, rêbazeke dînî ye. Merivan bi wîrd û agahiyan digihîjin Xwedê û nêzikî Xwedê dikin. Di nav xwe de rê û rêbazên terîqetan hene. Gor mitesewifan ewqas ku nefesên xaliq digrin hene, ewqas jî rêyên terîqeta ku merivan digihîjine Xwedê hene.

Terîqet di sedsala diwazdeh de derketine, paşe jî bi damezrak bûne. Neqşebendî, Qadîrî, Rifaî, Yesewî, Mewlewî, Halwetî, Şazelî û Bektaşî di nav van terîqetan de yên navdar in.¹⁸⁷

Şêx pîrên terîqeta ne. Şêx di nefsa xwe de fanî ne, lê ji heq re baqî ne. Şêx jî murîdên xwe re rêberîyê dikin. Ew kamil in, mirovan jî digihîjine kamiliyê. Şêx insanê kamil in. Şêxên terîqeta li ser beden û ruhên murîdên xwe bi her awayî

¹⁸⁶Dîlovan, h.b., r.27.

¹⁸⁷Uludağ, h.b., r.510-511.

destûrmend in. Şêx hem Xwedê bi qûlan hez kirin didin, hem ji qûlan bi Xwedê hezkirin didin.

Şêx, alimên Qur'an û hedîsên pêxember in. Lê her alim nadibe şêx. Merivên ku bi şêx bin, yê bi sifetên kamil hatibine xemilandin û ji dinê û zewq û sefayê dinê dûr ketibin. Hindik bixwin, hindik vexwin, hindik biaxifin û bi riyazet û îbadetan nefisê xwe paqij bikin. Dîsa yê bi exlaqê Xwedê û Pêxember exlaq bin.¹⁸⁸

Di helbesta **Melayê Cizîrîde** sembolên terîqet û şêx:

Di 'işqê şeyxê sanî me bi dil behrê me'anî me
Li zî hicrin we zî qelbin şifaun fî îşaratî¹⁸⁹

Di vê risteyê de Mele xwe dipesîne. Gor wî ew şêxekî mezin e. Dibêje, ez di eşqê de şêxê duyemîn im. Ez behra meneya me. Ji merivên xwedîyê hiş û dil re nîşanên ku ez didim de şîfa hene. Divê şêxê yekemîn jî şêxê wî be. Nîşanê ku ew dide, helbestên wî ne. Merivên ku meneya helbestên wî û veşarên di helbestên wî de fêm bikin yê ji wesweseyên şeytên û nexweşiyên manewî xilas bibin.

Feyza me şubhê Nîle em Dicle û Furat in
Ger şeyx û wer îmam e vê ra ye min keşakeş¹⁹⁰

Feyzên ku, bo min ji Xwedê, tên wek çemê Nîl in. Lê belê em wekî çemên Dicle û Fîrat in. Xwedê Dicle û Fîrat ji bereketa xwe danê. Feyza me jî, Xwedê ji vê bereketa xwe daye me. Şêxê ku bawer nebin verin cem min. Em bi hev re bipeyivin, gengeşî bikin. Ew şêx e, wekî çemên herî mezin e. Lê ew hebûnan hemû ji Xwedê ne. Feyz ji Xwedê ye.

Di helbestên **Ehmedê Xanî** de sembolên terîqet û şêx:

Ger şêxên û ger mela û mîrin
Derwêş û xenîne, yan feqîrin

Kes nîne, ne talibê cemalê
Kes nîne ne raxibê wîsalê¹⁹¹

¹⁸⁸Yılmaz, h.b., 194.

¹⁸⁹Turan, h.b., 308.

¹⁹⁰Turan, h.b., r.674.

Li ser dinê çî şêx û mela bin, çî mîr û paşa bin, çî dewlemend û feqîr bin, hemû kes talibê rindayî û sipehîtyê ne. Hemû cûreyên insanen rindayî yê hez dîkin, hemû jî, dixwazin ku bigihîjin yar û daxwaz û mirazên xwe. Hinek kes ji wan, rindayiyê ebedî, hinek jî rindayîyê demborî û betal dixwazin. Lê di ew xwastinan de ya bi qîmet û rûmet ya ebedî ye. Ew jî destûrên Xwedê ne. Ew jî, li rêya şêx û murşîda ne.

Me dî neqşek ji neqşê neqşebendan
Vebû qeydê di min yek yek ji zendan¹⁹²

Me ji neqaşên Neqşebendîyan neqş û nîşanek dît, bi wê nîşanê ve bend û qeydên milên me yek bi yek xilas bûn.

*“Neqşebendan, neqqaşan, nîgarendeyan, Nexşebendîyan, kesên ku li ser rê û terîqa Behaeddîn Mihemedê Neqşebendî (.../1389 M.) yê Buxarayê ne.”*¹⁹³

Xanî li vir dibêje ku, ji qeyd û bendan vebûna dilê min û rêya ku min digihîjine yare, ji min re, bi rêberiya neqşekî ji neqşa neqşebendan, yan jî bi suhbeta şêxekî ji şêxên neqşebendîyan hêsa bû.

Di helbesta **Mela Xelîlê Sêrtî** de simbolên terîqet û şêx:

Sirra wî nûranî ye
‘İlmê wî ledunnî ye
Lutfa wî serkehnî ye
Şêx Ehmed şêxê kamil
...
Şêxê min şêxekî pak e
Nûranî ye ne xak e
Kes nêzîkî lê nake
Şêx Ehmed şêxê kamil¹⁹⁴

Di tesewûfê de cihê terîqetan girîng e. Di dergahan de şêx hemû tiştên murîda nin. Bi îlm û rêbazîya xwe murîdan digihîjinin Xwedê Teala. Mela Xelîl jî, di van çarînan de şêxê xwe dipesîne. Şêxê wî Şêx Ehmed, şêxekî kamil e. Ew bi îlmê

¹⁹¹Turan, h.b., r.46.

¹⁹²Turan, h.b., r.50.

¹⁹³Durre, h.b., r.276.

¹⁹⁴Adak, h.b.,r.162.

ledunnî, ango îlmê Xwedê Teala zane, sirrên wî yên nûranî hene. Ew î pak e, payeya wî li cem Xwedê ewqas bilind e, lê kes nagihîje wê paye ye. Mela Xelîl, li vir pesna şêxê xwe dide.

Di helbesta **Mela Mihemedê Liceyî** de sembolên terîqet û şêx:

Ne't û wesfê te çi mumkin ez bikim şerh û beyan
Medhê te da ebkem im girte ji min sed mustetab

Şeyx Ebdulqadirê Sanî û himmet 'alî yî
Hadiye şermende seyra bike ji feyza bê hesab¹⁹⁵

Mela Mihemedê Liceyî xelîfeyê Şêx Ebdulqadirê Hezanî ye. Li vir, wesf û medhên şêxî xwe dide. Feyzên ku ji wî girtî eşkere dike. Şêx ewqasî, mezîn e, wesf û pesandinê wî Mele nikare şerh û beyan bike. Bi mexlasa xwe Hadî, sifetên xwe şermende eşkere dike û ji şêxê xwe himmet dixwaze. Feyza Şêx Ebdulqadirê Sanî bê hesab temaşa dike. Ew gotinên li ser şêx, bandora tesewûfê ne.

Di helbestên **Şêx Mihemed Hadîyê Qewmanî** de sembolên terîqet û şêx:

Qulzema îlmê wefat kir sêsed û der şêst û çar
Ew çi agir bû gelo girtî hemû koh û diyar
...
Hîcreta ehbab û yaran roj û şev dil min disot
Tu bizan ev Hadî ye rengaşiq e xweş beyt digot¹⁹⁶

Şêx Hadî jî, di van risteyan de li ser mirina şêxê xwe xemgînîyê xwe eşkere dike. Şêxî wî murşîdê îlmê ye, di sala sêsed û şêst û çara de çuye ser dilovaniya Xwedê. Mirina wî agir kiriye dilê Hadî û hemû gel. Ew ê layîqa şîn û girîna ye. Di zivistanê de cuda bûye. Şêx di risteya duyemîn de jî dîsa rewşa dilê xwe diyar dike. Hîcreta(mirina) wî ehbabî, wî dostî, dilê Şêx Hadî, şev û roj dişewitîne.

Dilo min dî di xew da nazenînek
Dema min dî dilêm berda girînek
Girîn têtin ji van serg û hinavan

¹⁹⁵Doskî, *Dîwana Hadî, Mela Mihemedê Liceyî*, h.b., r.58.

¹⁹⁶Seydaoğlu, h.b., r.53.

Ji remza awirên van herdu çavan

Mucedded kir ewî şer'a resûl e

Muneqqeş kir ewî qelbê melûl e

Mi dî neqşek ji neqşê Neqşebendan

Vekir qeydê ji min yek yek ji bendan¹⁹⁷

Dilbera nazenîn di xew de, xwe bi şêx dimîne. Wê demê giranîyek dikeve dilê wî, ango aşiq dibe. Paşê, Şêx Qewmanî, çav û remzê wê dîlberê teswîr dike. Çarîna duyemîn de armanca xwe esîl diyar dike. Ew dîlbera nazenîn şêxî Neqşebendan e. Şerîata resûl muceded dike û qelbê melûlan jî, neqş dike.

Şêx Qewmanî li ser rêya terîqeta Neqşebendan e. Di van rêzan de jî eşkere dike û cara pêşî di sifetên nazenîneke de bi eşqa mecazî eşqa îlahî diyar dike. Dû re ew şêxên Neqşebendan ku rêya Resûl tecdîd kirinî behs dike. Ew terîqeta Neqşebendî, rêya Behaeddîn Mihemmedê Neqşebendî ye. Ew jî mitesewifekî gelek mezin û pêş ve ye.

Di helbesta **Seyîd Elîyê Findikî** de sembolên terîqet û şêx:

Me hewar e li deryê Xewsê Geylan

Hewar û sed hewar e Xewsê Geylan

Rezîl bû me di nêv pê û destê xelqê

Mecala min tu yî ey Xewsê Geylan¹⁹⁸

Li ser mitesewifan bandora terîqetan gelek mezin e. Mitesewif bi piranî şêxê terîqetan in, hin murîd in. Seyid Elîyê Findikî jî, li vir, Geylan bilêv dike û vê bandorê eşkere dike. Dibêje, sed hewar deryayê Xewsê Geylan, ez di nav gel de rezîl bûme. Alîkarê min di vê rewşa giran de tu yî. Şêx Evdilkadir Geylanî şêxê terîqeta Qadîrî ye. Bi van navê şêxan jî biwêjên tesewûfê eşkere dibin.

¹⁹⁷Seydaoğlu, h.b., r.65.

¹⁹⁸Dîlovan, *Dîwan, Seyîd Elîyê Findikî*, h.b., r.179.

2.1.k. Xaliq / Xwedê / Mehbûb

Xwedê, navê herî mezin e, ezam e. Bê Xwedê ji kesê din re bendeganî û îbadet nabe. Di nav Esmayê Husna de yê herî mezin Xwedê ye. Ew, esmayên din hemû digre nav xwe. Xwedê Teala Xaliq e. Li erş û ezman çî heye Wî xelq kiriye. Ew Mehbûb e, di nav hebûnan de yên herî xweşik û meriv ji hez bike Ew e. Ji hez kirine re yê herî layiq dîsa Ew e.

Mitesewif van peyvên bimbarek di helbestên xwe de kar tînin. Bi piranî biwêjê Xwedê û wekî din peyvên Îlah, Reb, Xaliq, Mehbûb jî di helbestên wêjeya tesewûfê de bi cih dibin.

Di helbestên **Melayê Cizîrî** de sembolên Xaliq, Xwedê û Mehbûb:

Allah li min hubba te çî şekker û nebat e

Ji nû ve dê ciwan bim ger bihn bikim gula geş¹⁹⁹

Xwedê jiyana min e. Ew bi min şekir e, şeranî ye. Wê gulê rewnaq û bedew eger ku ez bêhn bikim, ez ê nû ve ciwan bibim. Ango Xwedê bersiva eşqa min bide ez ê her tim xort bibim. Jiyana min Ew tamam dike.

Mele di vê risteyê de biwêjên tesewûfê, Xwedê û Mehbûb kar anîne. Lê van biwêjan li vir bi peyvên Allah û hubb pêk tînin. Allah Xwedê ye, hubb jî Mehbûb e. Ew jî Xwedê nîşan dide. Gor Mele, li dinê yên ku tek mehbûb, mirov ji hez bike Xwedê ye. Wekî her tim Mele bi gulê bedew bêhn kirinê ciwan dibe, bi vê hez kirinê Xwedê jî ew ê ciwan bibe.

Di helbestên **Mela Huseynê Bateyî** de sembolên Xaliq, Xwedê û Mehbûb:

Hemdê bêhed bo xudayê alemîn

Wî Xudayî daye me dînê mibîn

Ew Xwedayê bê nezîr û Zul-celal

Bê heval û bê misal û bê zewal²⁰⁰

Melayê Bateyê, di van risteyan de nîmetên ku Xwedê Teala dayî me dihêjmire. Xwedê, xweşiyên bêdawî ji mirovan re afirandiye. Wî dînê mûbîn,

¹⁹⁹Turan, h.b., r.53.

²⁰⁰Sadinî, *Mela Huseynê Bateyî*, b.n., r.175.

Qur'ana Hekîm û milkê ezîm daye me. Em ji Hezretî Pêxember re kirine umet. Ew jî nimetên baş in. Ew nîmetan li merivên rêya tesewûfê baş xuya dikin. Rêberê wan Qur'an'a Hekîm û Ehmed û Darusselam e.

Ey Rahimê rehma qedîm
Hem Da'îm û Heqq û 'Elîm
Cumleyê derdan tu yî hekîm
Ez dê ji kê gazinde kem²⁰¹

Mela Bateyî, di vê çarînê de bi munacata Xwedê dest pê dike. Bandora tesewûfê li vir heman xuya dike. Bi dia navê Xwedê dihêjmire. Ew hekîmê derdan e. Hem jî rehîm e, xwedîyî rehmetê ye. Hem jî heqq ew e. Mele, li cem wî hekîmî ji derdan re dermanên bêmanend û bêmsal digere. Rehm û rehmet li cem wî hekîmî ne. Gazind ji Wî re qet nabin.

Di helbesta **Feqiyê Teyran** de simbolên Xaliq, Xwedê û Mehbûb:

Ellah çi zatek ehzen e
Zêde letîf û qadir î
Mexlûq hemû neqşê te ne
Vêk ra li hemyan fikirî
Hemd sena laiqa we ne
Yê 'erşê 'ezim çêkirî²⁰²

Feqiyê Teyran, li vir, sifetên Xwedê dihêjmire. Xwedê û sifetên Wî biwêjên tesewûfê ne. Xwedê xweşikî û delaliya herî baş e. Letîf e, qadir e, mexlûq hemû neqşên Wî ne. Ji kesî re hemd nabe, hemd bi tenê ji Wî re dibe. Erşa azîm Wî çêkirîye. Ew mitesewif e, hemû gotinên wî digihîjin Xwedê Teala.

Di helbestên **Ehmedê Xanî** de simbolên Xaliq, Xwedê û Mehbûb:

Xwedê Ellah e qasîd Resûl e ey xwedêzan
Xelîfe çar in dîwanzedeh îmam in ey misilman²⁰³

²⁰¹Sadinî, h.b., r.77.

²⁰²Sadinî, *Feqiyê Teyran*, b.n.,r.103.

²⁰³Şemrexî, h.b., r. 78.

Ehmedê Xanî, di vê risteyê de eqîdeyên îmanê diyar kiriye. Biwêjên tesewûfê li vir jî (Ellah, Xwedê) bandora tesewûfê nîşan didin.

Merivekî ku xwedêzan be, ew ê rind zanibe ku Xwedê Ellah e, Hezretî Mihemed jî pêxemberê Xwedê ye. Xelîfe jî çar in û dîwanzedeh îmam hene. Mitesewîf, di helbestên xwe de bi piranî, murîdên xwe û ji gel re şîretan dikin û aqîdeyên îmanê eşkere dikin. Xanî jî, li vir, li murîdan û li gel şîret kiriye.

Sernameyê name namê Ellah

Bê namê wî natemam e wellah

Ey metle'ê husnê 'eşqibazî

Mehbûbê heqîqî yû mecazî²⁰⁴

Xanî, di van risteyên xwe de jî dibêje ku hebûn hemû, li ser Xwedê ne. Navê li ser hemû navan navê Xwedê ye. Bê navê wî, name jî netemam e. Hebûn sedema Wî hene. Eşq jî, ji Xwedê Teala re ye. Mehbûbê heqîqî ew e. Wekî mitesewîfên din, ew jî hemû name û hebûnan bi yekbûna Xwedê ve girêdide. Felsefa wehdetîl wicûd jî li vir xuya dike.

Di helbesta **Mela Xelîlê Sêrtî** de simbolên Xaliq, Xwedê û Mehbûb:

Li fê'la Xwedê î'tirazê meke

Bi qencî, xerabî jê behsê meke²⁰⁵

Biwêjên Xwedê, Reb, Îlahî bandora tesewûfê li ser helbestvanan eşkere dikin. Mele jî li vir hukma Xwedê dibêje. Li ser dinê ku her çi hereket heye ji Xwedê ye. Gerek ku qûl fe'lê Xwedê re îtiraz neke. Ku Xwedê çi kiriye ew bedew e. Yê ku Xwedê kirî bi xerabî behs meke. Ew ku çi bike, rast e, baş e. Mele, li vir, li ser gerdûnê hukm kirina Xwedê Teala behs dike.

Di helbesta **Mela Nezîrê Bedewî** de simbolên Xaliq, Xwedê û Mehbûb:

Te'alallah çi dilber bû

Me dîbû ew şeva îne

Didu fincan ji dest derbû

²⁰⁴Şemrexî, h.b., r.15.

²⁰⁵Kaya, *Nehcul Enam, Mele Xelîlê Sêrtî*, b.n., r.26.

Ji lew ez her dibêm eynê

Dixwazim ez ji wê carek

Bidê min ava mûbarek

Şifa kit ew birîndarek

Dibûm meqtûlê mabeynê²⁰⁶

Mele di çarîna peşî de Xwedê Teala wekî dilberê teşbîh dike û dibêje ku min ew roja îne dîtîbû, du fîncan ji dest derbûn. Mele lewê wê dilberê jî teşbîha eynê dike. Çarîna duyemîn de dixwaze ku dilber ava bimbarek, carek bide wî û ew av ji birîna wî re şifa be. Lê ew ê bi vê ava bimbarek bibe maktûlê mabeynê. Ango dibêje, ez ê li rêya vê eşqê bimirim.

Di tesewûfê de helbestvan sifet û neqşê Xwedê Teala bi hin sembolan wêjeya klasîk muşexes dikin, li vir jî Mele, van wesfên Xwedê bi peyvên dilber û eynö muşexes dike.

2.1.1. Wehdet / Wehdetîl Wicûd

Wehdet, yekitîya Xwedê ye, yekbûn e. Hebûn giştî yekbûna Xwedê ne. Bi tenê mitesewif ne, hemû misilman vê yekbûna îradeyê Xwedê qebûl dikin. Ew qebûlkirin jî misilmantîya mukemel e.

Gor biwêja tesewûfê wehdetîl wicûd jî dîsa Xwedê tek e, bi tenê ye. Bê Xwedê hebûn tune ne. Mitesewif her tiştan de Xwedê dibînin. Lê ev dîtina demborî nîne, ya berdewamî ye.

Îradeya qûl û Xwedê bi hev re dibine yek. Îradeya heqîqî ya Xwedê ye. Ehlê wehdetîl wicûd vê agahiyên li ser wehdeta Xwedê di jiyane xwe de bi tecrûbeyên manewî dest xwe dixin. Sofî hemû hebûnan de Xwedê dibînin û ew dîtinan tecelîyên Xwedê ne. Bê Wî tişteki din nabînin. Sedema ku xwe jî nabînin wekî Hallacê Mensûr dibêjin "Ez Xwedê me!" Wekî Cuneydê Bexdadî jî dibêjin, "Ew î di bin cubbeyî min de bê Xwedê ne tişteki din e."²⁰⁷

Yunus Emre ji wekî Hallacê Mensûr wiha dibêje,

Bana bende demen bende değilem

²⁰⁶Doskî, *Dîwana Dahî, Mela Nezîrê Bedewî*, b.n., r.109.

²⁰⁷Uludağ, h.b., r.552-553.

Bir ben vardır bende benden içeru²⁰⁸

Di navber ew risteya Yunus Emre û gotine Hallacê Mensûr "Enelheq" de qet cudatî tune ye. Yunus Emre jî dibêje, ji min re nebêjên tu yî, ez ne ez im. Di nav min de yekî din heye. Ew gotinan felsefa wehdetîl wicûd e.²⁰⁹

Di Qur'ana Hekîm de jî wehdetîl wicûd wiha derbas dibe. "Ew, destpêk û dawî ye, eşkere û veşartîye. Ew bi her tiştî pir baş dizane û zanîye"²¹⁰ "Bêguman, Wî her tişt îhate kirîye, dor li her tiştî girtîye, her tişt di Wî de ye"²¹¹.

Di helbestên **Melayê Cizîrî** de sembolên wehdet û wehdetîl wicûd:

Yek bû elîf yek nuqte kir çend şiklê dî lê zêde kir

Her dem peyapey sifre kir bala bi bala rutbe da"²¹²

Berê elîf yek bû û nuqte bû, paşê şeklên din ser ve bûn. Li pey hev sifir hatin û merhele zêde bûn. Mele, di vê ristê de, behsa wehdet û yekbûna Xwedê dike. Pêşî Xwedê Teala hebû û tek nûra xwe afirand. Paşê ji nûra xwe insan afirand. Vê afirandiyê de kesek bi xwe re hevpar nekir. Ew wekî wehdeta elîfê ye. Bi tenê ye. Hebûnên ku di vê gerdûnê de hene hemû sedem û li rêya Xwedê hene. Van gotinên Mele felsefa wehdetîl wicûd e.

Senema sur ji Semed şewqê ji Heq daye wucûdê

Ger 'Ezazîlî bidîta nedibir xeyrê sucûdê"²¹³

Eger şeytan, ew yarê ku nûr û bedewiyê xwe gerdûn ronahî kirî bidîta wî yê heman ji Hezretî Adem re secde kiribûya. Gor min, ji Hezretî Adem re secde kirin, ji Xwedê re secde kirine. Hezretî Adem eyneya, ango şewqa Xwedê ye. Hebûn tek e, ew jî Xwedê ye. Şeytan ew wehdetîl wicûd nizanî bû. Ji ber vê yekê şeytan ji Xwedê re asî bû û helak bû.

Wehdetê mutleq Mela nûr e di qelban cela

Zorê di vê mes'elê ehlê dilan şubhe ma"²¹⁴

²⁰⁸Eraydın, h.b., 211.

²⁰⁹Eraydın, h.b., 210.

²¹⁰Hedîd, 3.

²¹¹Fûsîlet, 54.

²¹²Turan, h.b., r.712.

²¹³Turan, h.b., r.731.

²¹⁴Turan, h.b., r.733.

Ey Mele, wehdeta Xwedê, yekitîya Xwedê di dilan de nûr e. Di vê meselê de bi piranî ehlê dilan rêya xwe winda kirine. Mele, di vê risteyê de deng li xwe dike û bi navê xwe ji xwendevan û murîdên xwe re ders dide. Nûr, wehdet e. Merivên ku wehdetê nizanibin li rêya Xwedê dûr dikevin, nûra Xwedê nabînin. Merivên ku bê zat û sifetê Xwedê di hemû gerdûnê de tiştêkî din nebînin, yê felsefa wehdetîl wicûd fêm bikin.

Herfê ji yek bûne fesl ger bibirî wan bi esl

Herfi dibit yek xetek xet ku nema nuqte ma²¹⁵

Mele li vir jî, bi nimûneyên herf û nuqteyê, wehdeta Xwedê diyar dike. Herf hemû ku bi tenê ji xwe vediqetin û dibine xêzeke. Xêz jî ku li dor xwe dizivire dibe nuqteyek. Di demê ewil de jî hemû herf nuqteyek bûn. Gerdûn jî bi tenê ewil tek hebûnek bû. Ew jî Xwedê bû. Xwedê hemû hebûn afirandin. Hemû hebûnê dawî de yê bizivirin û bi Xwedê re yek bin. Di dawî de jî, Ew ê bi tenê bimîne. Ew jî bêguman temsîla yekbûna, wehdeta Xwedê ye. Felsefa wehdetîl wicûd e.

Sirre wehdet ji ezel girtiye hetta bi ebed

Wahid û ferd e bi zatê xwe wi ninin çu ‘eded’²¹⁶

Sirên wehdeta Xwedê ji ezel de heta ebed her tim hene û hemû tişt girtine naveroka xwe ye. Ew bi tenê yek e. Li cem Wî jimar û parmend tune ne. Xwedê ezel de heta ebed bi tenê ye, wehîd e. Wekî ku di deryayê de pêlên avê, dîsa ji deryayê ne. Hemû hebûn jî Xwedê afirandine û dîsa ji Xwedê ne. Ew hebûnan wehdetîl wicûd bi meriv nîşan didin.

Di helbesta **Mela Huseynê Bateyî** de sembolên wehdet û wehdetîl wicûd:

Ey Rahimê rehma qedîm

Hem Da’îm û Heqq û ‘Elîm

Cumleyê derdan tu yî hekîm

Ez dê ji kê gazinde kem²¹⁷

²¹⁵Turan, h.b., r.733.

²¹⁶Turan, h.b., r.774.

²¹⁷Sadinî, *Mela Huseynê Bateyî*, h.b., r.77.

Mela Bateyî, di vê çarîne de wehdeta Xwedê eşkere dike. Ew hekîmê derdan e. Hem jî rehîm e, xwedîyî rehmetê ye. Hem jî heq ew e. Hem jî yê da'îm Ew e. Di ezêl de heta ebed, Ew bê ewel û bê axir e.

Mele, li cem wî hekîmî ji derdan re dermanên bêmanend û bêemsal digere. Rehm û rehmet li cem Wî hekîmî ne.

Di helbestên **Feqiyê Teyran** de simbolên wehdet û wehdetîl wicûd:

Erşê 'ezîmê ekber e
Zînet û raza merkezî
Ew kursîya heq li ser e
Bêşems û gerdûn dibezî
Heq wahid e witr e fer e
Bê newm e baxvanê rezî²¹⁸

Heq Teala, li her derê hukum dike. Ew yekbûn istilaha Îslamê ye. Ji bo nasîna tewhîd û şîrkê, divê bi vê istilahê meriv baş zanibe. Ew istilah di nav kelîma tewhîdê de cih digre û ferqa bawerî û şîrkê derdixe holê. Ew bi tenê ye û wehîd e. Hebûn hemû ji wehdaniyeta Wî re birhan in. Heyîne li elemê vê wehdetê îspat dikin. Feqiyê Teyran li vir, bi van gotinan felsefa tesewûfê wehdetîl wicûd eşkere dike.

Min hewl nehîn quwet nehîn
Ruh ji Te ye dîn ji Te ye
Min zehr û ezman navebin
Deng ji Te ye sewt ji Te ye
Awaz ji kewna qudret in
Dest ji Te ye çeng ji Te ye²¹⁹

Xwedêyê mezin li her derê ye. Cihê ku Ew lê tune be, qet tune ye. Dîn ji Xwedê ye, ruh ji Xwedê ye. Deng ji Xwedê ye, sewt ji Xwedê ye. Li gor felsefa tesewûfê, hebûna tek jî, Xwedê ye. Xwedê mêtîn û bê dawî ye. Ew tek, hebûna wicûda mutleq e. Hemû tiştên me, ji Xwedê ne. Destên ku bi tiştan digrin jî, ji wî ne, çavên ku dibînin jî, guhên ku dibihîzin jî, ji Wî ne.

²¹⁸Sadinî, *Feqiyê Teyran*, h.b., r.103.

²¹⁹Sadinî, h.b., r.31.

Feqiyê Teyran di helbesta xwe ya ‘Feqî û Mela’ de jî bi Melayê Cizîrî re wiha diaxive û felsefa wehdetîl wicûd diyar dike:

Feqî :
Heyat li bal min wesl e
Du lat ger bibin latek
Murad bi xwe her esl e
Têk da bibin sifatek
Ji hev nebîn bê fesl e
Wahid bimînit zatek²²⁰

Jiyana mirov bi xwe wesla Xwedê ye. Mirada mirovan jî sifatek Xwedê ne. Hebûn hemû, ji hev dûr nabin û ew zatek wehid bi meriv dimînin. Ew wehidê tek, Xwedê ye. Xwedê bê dawî ye. Hemû hebûn heta demeke şûn de ji holê radibin, lê her demê Xwedê heye û yê hebe. Wateya van rêzan bi felsefa wehdetîl wicûd pêk tê.

Di helbesta **Ehmedê Xanî** de simbolên wehdet û wehdetîl wicûd:

Mehbûbê qulûbê men lehu’l-qelb
Qelban tu dikî bi bal xwe ve celb

Mutleq tu mufîd û mustefad î
Bê şubhe murîd û hem murad î²²¹

Ew xwediyê qelban e û qelb her dem Wî dibînin. Li vê dinê û li exretê bi tenê hevalêyî wî heye. Bêguman ew daxwaziya hemû kesa ne. Bi peyva mutleq jî, li vir biwêja wehdet xuya dike. Ew, di wateya mutleq de îlahekî bi tenê ye. Xanî mitesewif e, daxwaziya wî jî Ew e. Helbestên xwe bi vê daxwaze pêk tên. Hemû ramanên wî li ser Xwedê ne.

Ey wehidê bê şerîk û yekta
Wey wacidê bê nezîr û hemta
Ey baqîyê bê zewalê daîm
Wey hadîyê bêfenayê qaîm
Mulk û melek û felek bi carek

²²⁰Sadinî, h.b., r.193.

²²¹Şemrexî, h.b., r.16.

Bil cumle Te çêkirin tebarek

Fil cumle: çi ewwel û çi axir

El qisse: çi mû'mîn çi kafir²²²

Ehmedê Xanî li vir bi munacatê dest pê dike. Bi sifet û hemû tiştên ku Xwedê çekirî hejmartine ve jî, felsefa wehdetil wicûd eşkere dike. Ew xaliqê, wehîdê bi şerîk e, parmendên Wî tune ne. Ew her dem û her daîm baqîyê, bê fena ye. Ku di ezel û axir de mulk, melek û felek her çi heye bi carek de Wî çekirine.

Di helbestên **Pertew Begê Hekarî** de simbolên wehdet û wehdetîl wicûd:

Zatê wî 'eynî rehmet wucûdê heme wucûd

Nê rehmetek ku 'ariziya resm û 'adete

Nûra wî şubhî şems ne şerqî ne mexribî

Ziyaya wî qet ne heddî zikr û fikret e²²³

Pertew Begê Hekarî li vir hemû hebûnan bi hebûna Wî ve giredide, felsefa wehdetîl wicûd eşkere dike. Wicûdên ku hene hemû ji wicûda, hebûna Wî ne. Ew ewqasî mezin e ku nûra wî wekî rojê ye, lê ne li şerqê û ne jî li xerbê ye. Mirov qet nikarin li nûra wî bifikirin. Ew ewel e, axir e, rehmet e, batin e. Helbestvan bi sifetên Xwedê wehdeta Wî diyar dike.

Ya reb tu bi heqqê ismê zatê te îlah

Gava dikitin nez'e li min halê tebah

Tewfiqê bide dev û dil û 'eql û zeban

Nutqa mi bibîte "La îlahe îllellah"²²⁴

Pertew Begê Hekarî, li vir dîsa li ser wehdeta Xwedê rawestiyaye. Ji Xwedê dev, eql û dilan re tewfiqê dixwaze. Xwedê îlahê bi tenê ye. La îlahe îllellah, lafza wehdetê ya herî mezin e.

Di erebî de peyva "la" tunebûnê îfade dike. Pêşî wateya "La îlahe" jî, me'neya tu îlah tune ne eşkere dike. Di peyva tewhîdê de, meriv bi van peyvan pêşî dibêje tu îlah tune ne, paşê ku lafzê tamam dibe, me'neya xwe vê carê dibe "ji bê Te, tu îlah

²²²Durre, h.b., r.77.

²²³Doskî, *Dîwan, Perto Begê Hekarî*, b.n., r.45.

²²⁴Doskî, h.b., r.194.

tune ne." Ew peyv wehdeta Xwedê diyar dike. Helbestvan jî di van rêzan de dixwaze ku hemû hebûn vê tewhîdê bibêjên.

Di helbestên **Mela Xelîlê Sêrtî** de sembolên wehdet û wehdetîl wicûd:

Îlahî j'te dikim hêvî îlahî
Bi heqqê zat û wesfê padîşahî

Bi heqqê wehdeta bê çûn û çendan
Bi fedl û minneta te'l cumle 'erdan²²⁵

Mela Xelîl, li ber Xwedêyê xwe digere. Hêvîya wî ji Xwedê ye. Ew van hêvîyên xwe bi heqê wehdeta Xwedê dixwaze. Di munacatan de mitesewif bi sifetên Xwedê dia dikan. Wehdeta Xwedê der û dor hemû girtine. Ew girtina wehdetîl wicûd îspat dike. Meriv li rûyê erdê ku her çi dibîne ew ji hebûn û wehdeta Xwedê re birhan in. Ewqas ku bi tenê hebûn Xwedê ye, fedl û minnet jî, ji Xwedê re ne.

Wucûda wî 'eyne ji bo zatê wî,
Ne ewwel ne axir ne zidde ewî
...
Ne ewlad û zewcet, ne bab û ne da,
Ne hemkûf û mewt û zewala Xwedê²²⁶

Wicûda heyînan hemû ji bo zatê Wî ne. Wicûd û hebûn hemû ji Wî ne. Ew gotinê Mele Xelîl wehdetîl wicûd e. Xwedê, ne ewwel û ne axîr e. Ji Wî re heyam û wext tune ye. Ne jî hevpar û ziddên xwe hene. Ne bav û ne dayik, ne ewlad û ne jî zewcetê Wî hene. Ne jî wî Xwedêyê bi tenê re mirin û hîçî heye.

Di helbesta **Mela Mihemedê Liceyî** de sembolên wehdet û wehdetîl wicûd:

Rast bû elîf bû ser e
Her çi ku xware xere
Dil tijî şûr û şere
Karê wî her tim kelaş

²²⁵Adak, h.b., r.160.

²²⁶Kaya, *Nehcul Enam, Mele Xelîlê Sêrtî*, h.b., r.8.

Her tu yî mewcûd û bes
Hem tu yî me'bûd û bes
Hem tu yî meqsûd û bes
Rebbî nekî min tu şaş²²⁷

Elîf sembola yekitîya Xwedê ye. Ew temsîla wehdetê ye. Mela Mihemedê Liceyî distûra tesewûfê ya wehdet li vir dibêje. Dema ewil Xwedê Teala hebû. Xwedê îlm afirand û kesek bi xwe re nekir parmend. Wehdet, ango elîf, bi gihîştandinê hemû hebûnan bi hev re pêk tê.

Mele çarîna duyemîn de bi sifetên Xwedê hêjmartinê, wehdeta Wî nîşan dide. Dibêje, her mewcûd û me'bud û meqsûd Tu yî. Felsefa tesewûfê wehdetîl wicûd li vir baş xuya dike. Xwedê heyînê bi tenê ye. Gor Mele mewcûd, meqsûd û me'bud tek e, ew jî Xwedê ye.

Di helbestên **Mela Nezîrê Bedewî** de simbolên wehdet û wehdetîl wicûd:

Elîf di qiyamê ew e
Dale qû'ûdê de ew e
Mîme sûcûdê de ew e
Bê sewt me ser perwane kir²²⁸

Mela Bedewî jî, di vê helbestê xwe de bi sembola elîfê, yekîtîyê Xwedê kar tîne û dibêje: Elîf Ew e, ango elîf wehîd temsîl dike, Xwedê Teala ye. Bi vê simbolê felsefa wehdetîl wicûd diyar dike.

Mele, li vîr du herfan bi tîpî erebî din jî gelek bi cih kar tîne. Herfa dal, merivên rûkuyê de, herfa mîm, merivên secdê de temsîl dike. Lê wekî din jî ew herfan wehdeta Xwedê jî eşkere dikin. Helbestvan heyrana wateya van herfan e. Merivên mitesewif wekî elîfê di kiyamê de û wekî dal di rûkuyê de û wekî mîm di secdê de ne. Hemû li ser rêya Xwedê de perwane ne.

Neqşê cemal da vê dinê
Rengê zer e xal ketinê
Hatin li ber çav min tenê
Ez mûştêhî husna te me

²²⁷Doskî, *Dîwana Hadî, Mela Mihemedê Liceyî*, h.b., r.117.

²²⁸Doskî, *Dîwana Dahî, Mela Nezîrê Bedewî*, h.b., r.56.

...

Sukranê wan neqşan dibûm

Bo Leylayê Mecnûn dibûm

Roj û şebê aşiq dibûm

Muşteriyê husna te me²²⁹

Neqşa cemalê Xwedê li her derê dinê xuya dikin. Ew neqş û rengên baş her tim li ber çavê Mele ne. Mele, bi van xwaşikîyan aşîqa husna Wî bûye. Dibêje muşteriyê husna te me. Bi van neqşên ku Mele dihêjmire, meriv dikare bêje ku, ew felsefa wehdetîl wicûd jî, li vir derdikeve holê. Lewra gor wehdetîl wicûd, hemû hebûn şewqa Xwedê ne û ji yekbûnê wî re delîl in.

Ew wicûda mutleq e. Ji ezel de heta ebed heye û neqşên xwe li her derê ne. Mele şukrana wan neqşan e. Wekî ku Mecnûn ji bo Leylayê aşiq bû, Mele jî şev û roj ji bo van neqşan aşiq e. Aşîqa neqşên wehdetê ye.

²²⁹Doskî, h.b., r.105-106.

ENCAM

Ehlê Suffe, sehabeyên ku di çavîyên Mescîda Nebewî de dijiyan û bi tenê li rêya Xwedê diçin re tê gotin. Tesewûf, di dema Hezretî Pêxember (s.xl.), bi Ehlê Suffe ve dest pê dibe û paşe dibe rêbazeke girîng.

Hicrî sedsala duyem de di nav ereban de bi taybetî li Bexdadê, Hadraveyh (854), Ebû Turab Nahşebî (859), Bayezidê Bestamî (875) hwd. mitesewifên mezin hene. Misilmani ku di nav kurdan de belav dibe, tesewûf jî bi simbol û biwêjan, di nav helbestvanên kurd de cih digire. Gelek mitesewifên kurd yê mezin jî di vê demê de hene. Şêx Xelîl Kurdî, Ehmed Sûnbûlî, Şêx Ebu Tahiri Kurd, Şêx Ebul Hasan Kurdeveyh hwd.

Bi vê bandora misilmaniyê, kevneşopîya dîwan nivîsandinê, di nav helbestvanên kurd de bi cih dibe. Helbestvanên kurd jî, bi helbestên xwe berhemên dîwana pêk tînin.

Helbestvan di demê xwe de di bandora çand û baweriyê gel de dimînin. Tesewûf, rêbazeke li ser baweriyê û bi piranî biwêjên baweriyê pêk tê. Ji ber vê yekê biwêjên tesewûfê jî, bi wateya baweriyê ye û yekîtî û eşqa îlahî pêk tên. Ew biwêjên tesewûfê di vê xebatê de wekî ku derketî hole, bi cih û cih xuya dikin.

Di nav van biwêjan de ya herî belavbûyî ya yekemîn eşq e. Eşq jî bi piranî biwêja mecazî ye, di heman helbestvanan de bi cih dibe. Di nav helbestvanan de belavbûna biwêjan de ya duyemîn felsefa wehdetil wicûd e. Paşe jî dia, munacat û sifetên Xwedê jî di helbestan de gelek cih digrin.

Ew sembolan di hin helbestvanan de baş xuya dikin. Melayê Cizirî, bi sembola tesewûfê 'wehdet' e wiha dibêje : "*Sirre wehdet ji ezel girtiye hetta bi ebed*" Wehdet yekîtîya Xwedê ye. Mela jî, li vir vê yekîtîyê ezel de heta ebed eşkere dibe.

Mela Bateyî jî, bi biwêja tesewûfê "dia"yê li ber Xwedêyê xwe digere. "*Ya Reb tu yî dermanê min*". Ew Xwedê, dermanê Bateyî ye.

Ferqîyê Teyran, bi rêza "*Erdek heye Ew lê nebi*" sembola tesewûfê 'wehdetil wicûd' terîf dibe. Her hebûn ji Xwedê ye û Xwedê bi meriv dimîne.

Qelbê Ehmedê Xanî li cem Xwedê Teala ye. Her tiştên Xanî Ew dizane. "*Qelbê wî di dest Te da ye Elheqq*" Bi biwêjê tesewûfê 'heq' û bi peyva 'Te' Xwedê qesd dibe. Li vir, bi van sembolan bandora tesewûfê li ser Xanî eşkere dibe.

Di vê xebatê de xuya dike ku wekî van nimuneyan, biwêjên tesewûfê yên dîwanên kurdî de bi peyvên “eşq, mecnûn, terîqet, şêx, wehdet, wehdetîl wicûd, bezma elest, beka, fena hwd.” pêk tên. Ew sembolan, di dîwanên helbestvanên kurd de bandora tesewûfê eşkere dikin.

Di nav helbestvanên wêjeya klasîk ya kurdî de jî hin helbestvan, di hin alîyan ew biwêjên tesewûfê kar anînê de pêşve çune. Wehdetîl wicûd, di tesewûfê de nezariyeke belavbûyî ye. Helbestvan li ser vê simbolê tesewûfê bi piranî rawestiyane. Lê di helbestên Melayê Cizirî de wehdetîl wicûd, ji helbestvanên din baştir cih dibe.

Mewlûda Mela Bateyî, di nav helbestên kurdî de bêhempa ye. Ew na't e. Na't jî biwêjê tesewûfê ye û mijara na'tan jiyan û pesna Pêxember e. Wekî Mewlûda Sileman Çelebî ku di nav gelê tirkan de binavûdeng bûyî, ew jî di nav kurdan de binavûdeng e û belav bûye. Heta roja me di mewlûda kurdî de kesên ku wekî wî serkeftî tune ne.

Ehmedê Xanî, bi berhema 'Mem û Zîn' ê, eşqa mecazî dike behane û eşqa îlahî baş dibêje. "*Şerha xemi dil bikim fesane / Zîne û Memî bikim behane*". Mem û Zîn di nav helbestvanên kurd de, di nav çîrokên li ser eşqê de bi awayekî baş û bêhempa cih digre. Wekî Leyla û Mecnûna ku di nav farisî, erebî û tirkan de bi navûdeng.

Dîwanên kurdî ji aliyê tesewûfê de giranbiha ne. Belê, di encamê de meriv dikare bêje ku, di dîwanên kurdî de wekî nimuneyên ku me li vir dîtî, bandora tesewûfê heye.

ÇAVKANÎ

Pirtûk

Adak, Abdurrahman, *Mela Xelîlê Sêrtî, Mukaddîme*, Weşanên Zanîngeha Artukluyê, j.1., Mêrdîn 2010.

Bali, A.(Amadekar), *Antolojiya Helbestvanên Kurd*, Weşanên Pelê Sor, Stenbol 1992.

Banarlı, Nihad Sami, *Resimli Türk Edebiyatı Tarihi*, Milli Eğitim Basımevi, İstanbul 1971.

Biçici, Mela Abdurrahman (Amadekar), *Dîwan, Mela Zahirê Tendûrekî*, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2007.

Burkay, Kemal, *Kürtler ve Kürdistan*, Weşanên Deng, Stenbol 1993.

Çalışkan, Adem, *Fuzûli'nin Su Kasidesi ve Şerhi*, Diyanet İşleri Başkanlığı Yayınları, Ankara 1992.

Dilçin, Cem, *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara 1997.

Dîlovan, Selman (Amadekar), *Dîwan, Seyîd Elîyê Findikî*, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2011.

Dîlovan, Selman (Amadekar), *Dîwan, Melayê Cizîrî*, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2010.

Doğrul, Ömer Rıza, *İslamiyetin Geliştirdiği Tasavvuf*, Ahmet Halit Kitabevi, İstanbul 1948.

Doskî, Tehsîn İbrahîm (Amadekar), *Dîwana Bêxew*, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2013.

Doskî, Tehsîn İbrahîm (Amadekar), *Dîwana Hadî, Mela Mihemedê Liceyî*, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2012.

Doskî, Tehsîn İbrahîm (Amadekar), *Dîwana Dahî, Mela Nezîrê Bedewî*, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2012.

Doskî, Tehsîn İbrahîm (Amadekar), *Dîwan, Perto Begê Hekkarî*, (vgz. M.Xalid Sadîni-İhsan Guzereşî), Weşanên Nûbihar, Stenbol 2011.

Durre, Abdurrahman, *Evîna Welat*, Weşanên Melsa, Stenbol 1992.

Durre, Abdurrahman, *Şerha Dîwana Ehmedê Xanî Felsefe û Jiyana Wî*, Weşanên Avesta, Stenbol 2002.

Eraydın Selçuk, *Tasavvuf ve Tarikatlar*, Marmara Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Yayınları, İstanbul 1994.

Ergün, Zülküf, *Di Peydabuna Edebiyata Kurdî ya Li Cizîra Botan De Karîgeriya Bajarvaniyê*, t.ç. , Mêrdîn 2012.

Gündoğdu, Cengiz, *Abdûlmecid-i Sivasi, Hayatı, Eserleri ve Tasavvufî Görüşleri*, t.ç., Erzurum 1997.

Kabaklı, Ahmet, *Türk Edebiyatı, c.II*, Türk Edebiyatı Vakfı Yayınları, İstanbul 1994.

Kaplan, Mehmet, *Şiir Tahlilleri*, Dergah Yayınları, İstanbul 1992.

Kara, Sabah (Werger), *Dubeytî, Baba Tahirê Uryan*, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2012.

Kaya, Zeynelabidîn (Werger), *Dîwan, Melayê Cizîrî*, Weşanên Roja Nû, Stockholm 1987.

Kaya, Zeynelabidîn (Werger), *Nehcul Enam, Mele Xelîlê Sêrtî*, Weşanxana Kurdistan, Stockholm 1988.

Komisyon, *Ortaöğretim Kürt Dili ve Edebiyatı Ders Kitabı*, Tarih Vakfı Yayınları, İstanbul 2010.

Köprülü, Fuad, *Türk Edebiyatında İlk Mutasavvıflar*, Milli Eğitim Bakanlığı Yayınları, Ankara 1984.

Köprülü, Fuad, *Edebiyat Araştırmaları*, Milli Eğitim Bakanlığı Yayınları, Ankara 1986.

Kurdo, Qanatê, *Tarîxa Edebîyata Kurdî*, Weşanên Öz-Ge, Ankara 1992.

Kuşeyrî, Abdulkerim, *Kuşeyrî Risalesi*, (Hazırlayan Süleyman Uludağ), Dergah Yayınları, İstanbul 1991.

İpekten, Halûk, *Fuzûli, Hayatı, Sanatı, Eserleri*, Akçağ Yayınları, Ankara 1997.

İslam Ansiklopedisi, c.V, Diyanet Yayınları.

Onay, Ahmet Talat, *Eski Türk Edebiyatında Mazmunlar*, Milli Eğitim Bakanlığı Yayınları, Ankara 1996.

Qur'ana Hekîm, Diyanet İşleri Başkanlığı Yayınları, Ankara 2009.

- Sadinî, M. Xalid, *Mela Huseynê Bateyî*, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2010.
- Sadinî, M. Xalid, *Feqiyê Teyran*, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2011.
- Sadinî, M. Xalid, *Dîwan, Melayê Cizirî*, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2003.
- Sağrıç, Feqi Huseyn, *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2002.
- Seydaoğlu, Muhammed (Amadekar), *Dîwan, Şêx Muhemmed Hadiyê Qewmanî*, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2011.
- Sühreverdi, *Tasavvufun Esasları-Aviirifii'l-Mearif Tercemesi*, (Çeviren H. Kamil Yılmaz), İstanbul 1989.
- Şemrexî, Huseyn (Amadekar), *Mem û Zîn, Ehmedê Xanî*, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2010.
- Tavvakoli, Muhammed Rauf, *Kürdistan Tasavvuf Tarihi*, (Çeviren Mehmet Polat), Hivda Yayınları, İstanbul 2010.
- Turan, Abdalbaki, *Melayê Cizirî Divanı ve Şerhi*, Nûbihar Yayınları, İstanbul 2010.
- Türer, Osman, *Ana Hatlarıyla Tasavvuf Tarihi*, Ataç Yayınları, İstanbul 2011.
- Uludağ, Süleyman, *Tasavvuf Terimleri Sözlüğü*, Marifet Yayınları, İstanbul 1990.
- Uzun, Mehmed, *Destpêka Edebiyata Kurdî*, Weşanên Beybûn, Ankara 1992.
- Yılmaz, H. Kamil, *Anahatlarıyla Tasavvuf ve Tarikatlar*, Ensar Neşriyat, İstanbul 1994.
- Zekî, M. Emîn, *Kürtler ve Kürdistan*, Weşanên Deng, Stenbol 1991.
- Zinar, Zeynel Abidîn, *Di Çanda Kurdî de 37 Şaxên Zanistiyê*, Weşanxaneya Çanda Kurdî, Stockholm 2009.

Ferheng

- Develioğlu, Ferit: *Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Lûgat*, Aydın Kitabevi, Ankara 2003.
- Îzolî, D., *Ferheng*, Weşanên Deng, Diyarbekir 2007.
- Sami, Şemseddin, *Kamûs-ı Türkî*, Çağrı Yayınları, İstanbul 2006.
- <http://ferheng.org/tr/>, (Ferhenga Dîjîtal)

Çavkaniyên Dîjîtal

- Bateyî, Qahir, *Pertew Begê Hekarî*,
yuksekovahaber.com/author_article_detail.php?id=713&uniq_id=1193684575, 21
Cotmeh 2007
- Demir, M. Emin, *Li ser klasîkên Kurdî*, <http://www.nucevan.com/cand/li-ser-klaskn-kurd.htm>, 13 Îlon 2012
- Kahraman, Îskender, *Elî Herîrî û Per'ek ji Dîroka Edebiyata Kurdî*,
<http://www.yuksekovahaber.com/yazi/eli-heriri-u-perek-ji-diroka-edebiyata-kurdi-3184.htm>, 11 Adar 2013
- Yalsızuçanlar, Sadık, *Kürt Dilinde Tasavvuf*,
<http://www.sadikyalsizucanlar.net/soylesiler/kurt-dilinde-tasavvuf-2.html>, 24
Hezîran 2010
- Yavuz, Kemal, *Mele Xelilê Sêrtî*, <http://siirttenote.com/yedek/arsiv/siirtte-dair/siirtli-uenlueler/2397-mela-xelile-serti-1753-1841.html>, 13 Sibata 2011
- Yüksel, Müfit, *Tarihimizde Kürt Mutasavvıflar*,
<http://yenisafak.com.tr/yazarlar/?t=18.02.2012&y=MufitYuksel>, 18 Sibata 2012